

ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ
TEZA LÎSANS A BILIND



WEKÎ KIRDEYEKÊ HEBÛN Û TEMSÎLÎYETA JINAN
(AWIRTÊDANEKE REXNEYÎ A FEMÎNÎST BO BERHEMÊN
DILAWER ZERAQ)

ŞÊWIRMEND

Alk. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

AMADEKAR

Leyla POLAT

VAN-2017

Teza Lîsansa Bilind

Leyla POLAT

ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Hezîran, 2017

WEKÎ KIRDEYEKÊ HEBÛN Ê TEMSÎLÎYETA JINAN

(Awirtêdaneke Rexneyî A Femînîst Bo Berhemên Dilawer Zeraq)

KURTE

Ev xebat li xwe dike armanc ku li ser berhemên Dilawer Zeraq hûr bisekine û bide nîşan ku di van berheman de hebûn û temsîliyeta jinan, bi zanava kirdebûnê hatiye pêkanîn. Ev xebat ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de; bi kurtasî dê zayend, rolên zayendî, bavkanî, demajoyên tiştêkirina jinan û pê re jî demajoyên geşedanên dîrokî a femînîzmê û cureyên wê bîn aşkerakirin. Wekî dî jî, dê ji xebatên ramanwerên femînîst mînak bê dayîn ku di geşedana lîteratura femînîst de bi roleke girîng rabûne û dê behsa destkeftiyên di vî warî de bê kirin û tevkarîyên ku ramanweran û tevgerên femînîst kirine, bê nirxandin ku bûne sedem ku hin dîtînen şaş ên dîrokî biguherin û ji holê rabin. Di beşa duyem de, dê rexneya femînîst, rexneya wêjeya femînîst; demajoyên geşedanên dîrokî ên deconstructionê û palderên wê ên gotarî û ramanî bîn nirxandin. Di beşa sêyem de, dê pirtûka çîrokan a Dilawer Zeraq a bi navê *Bîşirîna Şermînî* û sêyîneya wî a bi navê *Sêyîneya Winda* ku ji sê romanên bi navê *Şevên Winda Wêneyên Meçhul*, *Mirina Bê Sî*, *Nexşin Li Gîyan*, pêk tê, bi berçavkirina kodên jiyanî, ramanî, zimanî, dîrokî û civakî ên lehengên jin ku di van pirtûkan de cî girtine, bîn nirxandin û digel vê yekê jî, di hîm û ronîya zanînen ku teorîya rexneya wêjeya femînîst û teorîya deconstructionê danîne de, dê li ser hûr bê sekinandin ka jinên di berhemên Dilawer Zeraq de cî dane xwe, wekî kirde û kesîdeyekê çawan hatine temsîlkirin.

Peyvên Sereke: Jin, Zayend, Zayenda Civakî, Kirde û Tişte, Femînîzm.

Yüksek Lisans Tezi

Leyla POLAT

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Mayıs, 2017

KADININ BİR ÖZNE OLARAK VARLIĞI VE TEMSİLİ

(Dilawer Zeraq'ın Eserlerine Feminist Eleştirel Bir Bakış)

ÖZET

Bu çalışmada, Dilawer Zeraq'ın eserlerinde kadın temsiliyeti ve varlığının özne kimliğiyle gerçekleştirilmiş olmasının incelenmesi amaçlanmaktadır. Bu çalışma üç bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümde; kısaca cinsiyet, cinsiyet rolleri, ataerki, kadının nesneleştirilmesinin tarihsel süreçleri ve beraberinde feminizmin tarihsel gelişim süreçleri ve türleri açıklanacaktır. Ayrıca feminist literatürün gelişmesinde feminist düşünürlerin çalışmalarından örnekler verilecek, tarihsel bazı yanlış kanıların değiştirilmesinde hem düşünürlerin hem de feminist hareketlerin kazanımları ve katkıları değerlendirilecektir. İkinci bölümde, feminist eleştiri, feminist edebiyat eleştirisi; yapısökümün tarihsel gelişim süreçleri, söylemsel ve düşünsel dayanakları değerlendirilecektir. Üçüncü bölümde Dilawer Zeraq'ın *Bişirîna Şermînî* adlı öykü kitabı ve Sêyîneya Winda adlı üçlemesinin kitapları olan *Şevên Winda Wêneyên Meçhul*, *Mirina Bê Sî*, *Nexşîn Li Gîyan* adlı eserler, kadın kahramanlarının yaşamsal, düşünsel, dilsel, tarihsel ve toplumsal kodları göz önüne alınarak değerlendirilecektir ve Dilawer Zeraq'ın eserlerindeki kadınların birer özne ve birey olarak temsiliyetlerinin nasıl gerçekleştirildiği, feminist edebiyat eleştirisi kuramı ve yapısökümün kuramının ışığında değerlendirilecektir.

Anahtar Kelimeler: Kadın, Cinsiyet, Toplumsal Cinsiyet, Özne ve Nesne, Feminizm

M. Sc. Thesis
Leyla POLAT
YUZUNCU YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGE
DEPARTMENT of KURDISH LANGUAGE

May, 2017

**THE EXISTENCE AND THE REPRESENTATION OF WOMAN AS A
SUBJECT**

(A Feminist and Critical Outlook to The Works of Dilawer Zeraq)

ABSTRACT

In this study it has been aimed to analyze the woman representation and existence has been realized through the subject identity in Dilawer Zeraq's works. This study consists of three parts. In the first part, gender, gender roles, patriarchy, the historical processes of being objectified of woman and additionally the historical growing processes of feminism and it's varieties will be explained. Besides, illustrations from the works of feminist philosophers in the growing of feminist literature will be presented and the achievements and contributions of both philosophers and feminist movements will be evaluated in the changing of a number of historical misapprehensions. In the second part, feminist criticism, feminist literary criticism; the historical growing process and discursive and intellectual bases of deconstruction will be assessed. In the third part, Dilawer Zeraq's story book named *Bişirîna Şermîni* and the works named *Şevên Winda Wêneyên Meçhul*, *Mirina Bê Sî*, *Nexşîn Li Gîyan* which are the books of his trilogy named Seyineya Winda will be assessed by taking into account his woman characters' vital, intellectual, linguistic, historical and social codes and the matter of how their representation as a subject and individual has been realized will be evaluated in the light of feminist literature criticism theory and deconstruction theory.

Kye Words : Woman, Gender, Social gender, Subject and Object, Feminism

SPASÎ

Di hemû qonaxên vê xebatê de şêwirmendê teza min, Doçentê Alîkar Nesim Sönmez, piştgiriyên xwe ji min teksîr nekirine; ji ber vê yekê ez spasiya xwe lê dikim.

Ez spasdari Alk. Doç. Dr. Mahmut Dündar û Alk. Doç. Dr. İbrahim Sürücü me ku wekî endamekî juriyê, der barê tezê de dîtînen xwe bi min re parve kirine.

Spasiya xwe li Nuray Polat dikim ku di demajoya amadekirina vê tezê de, piştgiriyên xwe ji min teksîr nekir û her wiha malavayî bo Dilawer Zeraq dikim ku di warê zimannasî; zanîn û agahiyên xwe ên derbarê gencîneya kûr û dûr a Kurdî de tevkariyên hêja li min kirine.

LEYLA POLAT

Hezîran – 2017

NAVEROK

KURTE.....	I
ÖZET	II
ABSTRACT	Hata! Yer işareti tanımlanmamış.
SPASÎ.....	IV
NAVEROK	V
RÊZÎLEYA SEMBOL Û KURTENAVAN	VII
PÊŞEK.....	VIII
DESTPÊK	X
1. SAZKIRINA JINAN DI NÊZÎKTÊDAYÎNA CIVAKÎ Û RAMANÎ DE ..	1
1.1. Sazkirina Jinan Di Nêziktêdayîna Civakî De	1
1.1.1. Zayend û Zayenda Civakî.....	3
1.1.2. Bavkanî, Netewe, Dewlet û Îktîdar	5
1.1.3. Mêranî û Gotara Nêrane	7
1.1.4. Kirde û Tişte	7
1.1.5. Qadên Giştî û Qadên Taybet.....	9
1.1.6. Malbat, Zewac, Kevanî, Keda Li Navamalê	11
1.1.7. Şîdet, Şîdeta Di Nava Malê De, Fuhûş, Koletî, Pornografî, Tişteya Zayendî	14
1.1.8. Mafê Kurtajê, Eugenic, Kontrola Zarokanînê	16
1.1.9. Mafê Reyavêtinê, Demokrasi, Temsilîyet.....	17
1.2. Serpêç, Dîn, Gotara Fitratê, Oryantalîzm	21
1.3. Modernîzm, Pozîtîvîzm, Psîkanalîzm	24
1.4. Dîroka Femînîzmê Û Cureyên Wê.....	27

1.4.1 Femînîzma Lîberal	30
1.4.2. Femînîzma Sosyalîst	30
1.4.3. Femînîzma Radîkal	31
1.4.4. Femînîzma Çandî	32
2. REXNE Û FEMÎNÎZM.....	33
2.1. Rexneya Femînîst A Wêjeyî	34
2.2. Deconstruction	41
2.2.1. Rexneya Deconstructîf	44
3. WEKÎ KIRDEYEKÊ HEBÛN Û TEMSÎLÎYETA JINAN.....	46
3.1. Temsîliyeta Jinan Di Berhemên Dilawer Zeraq De	46
3.1.1. Zayend û Zayenda Civakî.....	50
3.1.2. Qadên Giştî û Qadên Taybet.....	66
3.1.3. Tecawiz.....	69
3.1.4. Fuhûş û Qehpikî.....	71
3.1.5. Cezakirin	73
3.1.6. Zewac.....	76
3.1.7. Hevşabûn û Hezkirin	78
3.1.8. Jin û Jin	83
3.1.9. Mêr û Mêranî.....	87
3.1.10. Dayikî	92
3.1.11. Şer û Koç	93
3.1.12. Tişte û Kirde	96
3.2. Vebêjî Di Berhemên DilawerZeraq De.....	98
3.3. Zanava Kolektîf Di Berhemên Dilawer Zeraq De.....	100
ENCAM.....	103
ÇAVKANÎ.....	109

RÊZÎLEYA SEMBOL Û KURTENAVAN

Sembol û kurtenavên ku di vê xebatê de hatine bikaranîn, li jêr bi tevî dirêjenavên xwe ve hatine aşkerakirin.

Kurtenav

Dirêjenav

h.b.

Heman berhem

hwd.

Her wekî dî

Çev.

Çevirmen

YDA

Yekîtîya Dewletên Yekbûyî ên Amerîkayê

PÊŞGOTIN

Femînîzm, bi mebesta diyarkirin û bidestxistina mafê hebûn û kirdetîya jinan, bi teorîyeke xweserî xwe bi pêş de hatîye. Bi domana dîrokê re, her ku çûye şax ji xwe berdaye û gelek dîtin û teorî di vî warî de saz bûne. Em dikarin bêjin tevgerên femînîst, bi derketina cîyê xwe ve nemaye û li hemû derên dinyayê belav bûne. Loma jî, li gelek cîyan û gelek kesan ramanên xwe tev li ramana destpêkê kirine û ev teorî û ramanwerîya di vî warî de geş bûye.

Pircûreyîya van ramanan kiriye ku tevger û ramana femînîst berê xwe bide çalakgerîyê û bi taybetî jî lêkolîna dîrokî, ramanî, epîstemolojîk pêk bîne û her wiha, wêje jî bûye yek qada sereke a vê lêkolînê. Di vî warî de, teorîsyen û ramanwerên wekî S.D. Bouver, Kate Millett, Anne Dakley, Julia Kirîsteva, I.M. Jung, Jacques Lacan, Betty Friedan, Luce Irigaray, Monique Wittig, Hélène Cixous, Mary Daly, Jacques Derrida û bi dehan ramanwerên din, awir û dîtinên dîtir saz kirine ku ziman û gotarê li xwe kiriye çavkanîya sereke. Û bi taybetî Derrida di warê deconstructivîzmê û Krîsteva jî di warê structuralîzmê de bûne xala werçerxê. Loma jî me di vê xebatê de, lêkolîn û hûrgerîya li ser wêjeyê li xwe esas girt û li ser berhemên Dilawer Zeraq xebateke vekolînî û lêkolînî pêk anî. Berhemên Dilawer Zeraq ên ku me hewl da ku em di vê xebatê de bi awayekî bi kitekit li ser bisekinin, pirtûka çîrokan a bi navê *Bişirîna Şermînî* û sêyîneya wî ên bi navê *Sêyîneya Winda* ku ji sê romanên bi navê *Şevên Winda Wêneyên Meçhul*, *Mirina Bê Sî*, *Nexşîn Li Gîyan*, in.

Geşedanên femînîstî ên der barê aşkerakirina sazkirina jinan a di nêzîktêdayîna civakî û ramanî de, pêşî li rexneya femînîst a wêjeyî vekiriye ku rê daye rexnegiran ku karibin bi awirekî femînîstî, berhemên wêjeyî bîn nirxandin. Me di vê xebatê de berhemên Zeraq, bi awirekî rexneya femînîst a wêjeyî nirxand. Digel vê yeke jî, ji ber ku Zeraq nêzîktêdayînen xwe ên di warê temsîlfîyet û azadîya jînê de bi awayekî deconstructif danîye û li ser vê ramanê helwest girê daye; me jî pêwîstî pê dît ku; di xebata xwe de, ramana Derrida û zimanê semiyotîk de ku Kirîsteva bi

taybetî nêziktêdayînê lê dike û li ser wê xebateke esasî pêk tîne, li xwe bikin bingeha ramanê û li ser van berheman hûr bisekinin.

Hemû rave û pênaseyên der barê jinan de, ên ji alfyê feraseta mêrane a serdest hatine avakirin, bi tevger û ramanên femînîst hatine rûxandin. Ev rasteqînî bi xwe re hewcetîyekê diyar dike ku; divê temsîlyeta jinê a di berhêmên wêjeyî de a ku di asta tiştêbûnê de pêk hatiye, were aşkarekirin.

Dilawer Zeraq, di berhêmên xwe de li ser avakirina heyîn û temsîlyeta jinan, li hember kodên nêranê ên bi sedan salan helwest gire daye û pê re jî bi awayekî hişyarî û zanebûn jin di navenda çîrokên xwe de bi cî kirine. Jin, ên ku her ku diçe ber bi birewerbûnê û bihêzbûnê geş dibin; jin, ên ku digel zimanekî bi kodên jinane; û digel bi hizirîn û hestpêkirineke jinane li hember gerdîşê û mêranîya desthilatdar radibin; di van berheman de wek kirde heyî dibin.

Leyla Polat

DESTPÊK

Di vê xebatê de, pêşî ji bo danîna bingeha tezê, hewl hatiye dayîn ku; bi kurtasî têkiliya têgihên zayendî, zayenda civakî, bavkanî, temsîliyeta jinan, femînîzm û tiştêbûn û kirdebûn bê diyarkirin. Di ser vê bingehe re, pêşî lêkolîn li ser sedema gelemşeya mafên jinan a dîrokî hatiye kirin da ku sedem û qonaxên tiştêkirin, dîkekirin û bindestkirina jinan bê aşkerakirin.

Her wiha, ji bo çêtir têgihîştina mijarê, di warê dîroka femînîzmê de û gotarên ku jin ji mafan û jiyanê bêpar hîştîye hûr hatîye sekinandin û li ser mijarê lêkolîn hatîye kirin. Û digel van yekan jî, ji bo baş danîna bingeha tezê, bal li ser, têgehên bi maf û temsîliyeta jinê ve bi têkildarin, gotara femînîstî û cureyên femînîzmê hatiye kişandin; dû re jî di ronahîya geşedanên femînîst de, bal li ser, rexneya femînîst a wêjeyî û li ser teoriya “deconstructif” hatîye kişandin.

Ji berevajîya ku temsîlkirina jinan bi kodên nêrane ên hatî hîn kirin û di asta tiştêkirinê de hatiye kirin jî; wekî peytek, ku mimkun e ku di asteke kirdebûn û kesîdeyî de temsîlîyetek were kirin, xebateke bi hûrgilî û bi kitekit li ser berhemên Zeraq hat kirin. Wekî encama vê xebatê, ku di çarçoveya awayê nêziktêdana perspektîfên lîteratura femînîst û rexneya wêjeya femînîst hat kirin, hat dîtin û çespanandin ku di berhemên Zeraq de, nêziktêdaneke cihê heye ku kodên nêrane dirûxîne û jinan wek kirde heyî dike.

1. SAZKIRINA JINAN DI NÊZÎKTÊDAYÎNA CIVAKÎ Û RAMANÎ DE

1.1. Sazkirina Jinan Di Nêzîktêdayîna Civakî De

Serpêhatîya mêrane, duparkirina mirovahîyê û parastina komekê ye ku bi mafên zirkmakî ji koma din çêtir tê dîtin; û serdestîya mirovane avakirina pergaleke civakî a li gorî rêgezên xwe ye ku têkilîyên mirovahîyê û pê re jî sîstemên hizirînê jî li gorî wê sîstemê ava dike. Ev jihevparvebûna ku; têkilîyên ekonomîk, cîbicîbûnên dîrokî, zanist û agahîyê, qadên giştî û taybet, zewacê, zarokanînê, temsîliyetê, qada polîtîk, têkilîyên ked û hilberînê, argumanên olî, zayendîyê, kirdetî an jî tiştetîya berhema hunerî; û pê re jî hê gelek tiştên dîtir diyar dike, di nav hezeran salan de, çî bi ramanî çî jî bi zimanî hemû mekanîzmayên xwe saz kiriye û tiştetek wisa afirandiye ku ne navê wê, ne zanava wê, û ne jî hebûna wê heye. Jina ku wek tune hatiye hesibandin... Ew heyîna ku wek çîna duyem hatiye qebûlkirin û dîkekirin û ne ji alî zagonên xwezayî ve lê ji alî zagonên nêrane ve hatiye diyarkirin, bi hemû pênaseyên xwe ve kême, netekûz e û wek mêrekî nestewîyayî ye. Mêrê serdest, ziman û sîstemeke fikrînê a serdest ava kiriye û jin tê de fetisandiye. Wekî ku Süha Oğuzertem dupat dike, “jinek”ê her tim vediguherîne “hemû jinan”(Parla, Irzık, 2014: 232). Tu jin, ji derveyî darazên klîşeyên derbarê jinan de, nayê pênasekirin. Jin bi hestan, mêr bi aqil ve hatiye hevsankirin. Jina ku bi hestan ve hatiye hevsankirin, bi mekanîzmayên kontrolkirinê, ku mêr li ser deng, zanav û laşê wê saz kiriye, bijî. Yekmêrî, gotara olî, malbat, zewac, hin ji van mekanîzmayên kontrolkirinê ne.

Heyama ku wek hovîtî tê penasekirin yan jî wek nêçirvanî û berhevkarî yan jî heyama civakên talanker; heyama ku wek barbarî tê penasekirin. Qadên kiştîkalî yên ku piştî şewitandina daristanan hatine bidestxistin û her wiha baxçevanî, erdajotin, avîkirin û heyama kiştûkalîya pêşketî; heyama ku wek şarezayî tê pênasekirin ku civakên bajarî derketine holê, û bi şoreşa sanayîyê ve gihîştîye roja îroyîn. Gava mirov dîroka mirovahîyê bi vê dabeşkirinê qebûl bike, pê re sîstemeke ramînê derdikeve.

Kana rolên zayendî ên civakî ên heyî, gelo xwezayîbûna mirovan bi xwe ye yan jî encama sazkarîya honakakê ye ku hatiye hilberandin, pêşxistin û cîbicîkirin; gelo jin jî, bi maweya dîrokê tim û tim wekî zayenda kême û ne hêja bû? An jî gelo di heyameke dîrokê de piştî werçerxekê ku hat jiyandin, di vê qadê de hat bicîkirin?

L. Henry Morgan bi salan di nava *Irokuayan* de jiyaye û piştire ezmûne û çavnêrîyên xwe, di sala 1877an de wek pirtûkekê belav kiriye û xebata P. Draper ku li ser gelê *Kungkiriye*, bûne sedem ku ev pirs bi awayekî dî werin bersivandin û feraseta hişmendîya mêrê desthilat di ronahîya van xebatên zanistî de hatiye rexnekirin. “Jina ku di rêzkeyên serdest ên çandî û temsîlî de, wek dîke hatiye cîbicîkirin û serdestîya guherbar a mêr dixe bin ewlehîyê, ji tevdehîya taybetîyên mêr ên kêr û neyînî pêvtir ne tu tişt e.” (Parla, Irzık, 2014: 263).

Ev qebûla giştî ku cihêti û dîtirbûneke wê a li ser navê xwe tune ye, ev zanava jinê, balkêş e ku bi simbolên devkî, di nav normên sincî, di wêjeyê, di olê, di hunerê, di sîyasetê, di felsefeyê û di psîkolojîyê de bi vê mantiqê hatiye qebûlkin. Em dikarin bêjin ku di hemû heyamên dîroka zanist û ramanê de yan hêjayî pênasekirinê nehatiye dîtîn yan jî bi pênaseyêndîkeker û kêmxist hatiye pênasekirin.

Deh fermanên Tewratê tenê ji bo mêran in. Tenê di fermana dehemîn de behsa jinê digel xizmetkaran û ajalên kedîkirî tê kirin. (Besalel, 2001-2002: 12)

Di sîstema feodal de, heqê axa û derebegan heye ku têkilîyên zayendî bi serfên (xulamên) xwe ên jin re deynin. Ev maf ku wek “Jus Primae Noctis” yanê mafê şeva pêşîn yan jî şeva zîfafê hatiye binavkirin, piştî derebegtîyê wek bergindê bacê hatiye çareserkirin. Ev yek li hin deveran heta sedsala 18emîn domiyaye. (Bedel, 1996: 303)

Platon, spasî li xwedayan dike ji ber ku ew wek jin neafirandiye. (h.b. 125)

Mêrên cihûyan di duaya serê sibê de, wiha deng li Xweda dikin: “Xwedayê ku ez wek jin neafirandime û efendîyê hemû dinyayê, Xwedayo mala te ava!” (Topcan,2010:5)

Li gorî zimanên Îngîlîzî û Fransî peyva mêr û mirov heman peyv e. ‘Man’ û ‘homme’ hem bo mêr hem bo mirov tê bikaranin. (Îngilizce Sesli Sözlük, tr.dictionarist.com)

Ev hişmendîya ku di nav hezaran salan de hatiye avakirin, vî zimanî û vê sîstema ramînê, hem di jîyana heyî hem jî di dinyaya ramanî de, xwe heyî kiriye. Her wiha vê yekê di biwara wêje, huner û zanistê de jî yekzimanî ava kiriye. Vê yekzimanîyê, di qada sîyasî de jî, jin bi heman awayî cî bi cî kiriye.

Gava ku Freud jinê pênase dike, bi tespîta “hewespêkirina bo penîsê”, jinê wekî heyîneke ku kêr hatiye dinê, tîne zimên. (Millet, 2011: 291)

Gotara ‘fitrat’ê a Îslamê (Rum:30/21) jî heyînan, ji ber ku wek xwezaya xwe wisan in û dê neguherin, pênase kiriye û bang li mêran kiriye ku jin bo mêran hatiye afirandin.

S.D. Bouver dibêje, “mirov wekî jin nayê dinyayî, lê belê piştî rengê jinbûnê digre.” K. Millet, têgiha “polîtîkaya zayendî” bi kar tîne û her wiha femînîstên nîşê duyem jî bi dirûşma “Tiştê kesîdeyî polîtîk e.” li hember zimanê mêrane sekinîne.

1.1.1. Zayend û Zayenda Civakî

Yekem car Anne Dakley di 1972yan de, di pirtûka xwe a bi navê *Sex, Gender and Society* de têgiha *gender* bi kar anîye. (Acar Savran, 2013: 233). Vê têgihê danî rastê ku zayend bîyolojîk e lê belê zayenda civakî hatiye diyarkirin. Têgiha *gender* ku di femînîzmê de bi wateya xwe ya resen hat bikaranîn, kir ku der barê vê mijarê de gelek gengeşî pêk bînin û li ser mantiqa ku ava bûye, bê fikirandin. Zayenda civakî digel coğrafya, nirxên çandî, awirê polîtîk û mekanîzmayên îqtîdarê watedar bûye. Em dikarin bêjin ku desthilatdaran bixwe pênaseyên xwe ên li ser zayendê afirandine û di qadên polîtîk de jî rolên zayendî li gorî van pênaseyan diyar kirine.

Gengeşekirina zayenda civakî di heman demê de ew tişt e ku “zayend, zayendî, laş, norm û qedexeyan, di çarçoveya taybetîyên wekî dema diyarkirî, coğrafya, etnîsîte, çîna civakî û temen de gengeşe bike.” (Mutluer, 2013:14). Wekî ku Nil Mutluer jî dupat lê dike digel xwe hin têgihên diyarker û norman jî tevî gengeşiyê dike. Ne tena serê xwe lê belê bi wan têgihan ve watedar dibe. Gengeşiyên zayenda civakî bi xwe re gengeşiya têgiha *Abjection/Abject* jî ava kiriye. Çimkî gava ku mekanîzmayên desthilatdarîyê zimanekî serdest ava dike, digel xwe jî, ew tiştê ku hatiye qedexekirin û dîkekirin jî pênase dike.

Julia Kirîsteva, têgiha *ABJECTION*ê wek “taybetîyên laşî ku mirov ji xwe dûr xistiye” pênase dike û pê re jî vê naverokê bi xwêdan, mîz, jiberkirina zarokan û hwd. dadigire. Têgiha, *abjection*ê wek bertekeke psîkolojîk rave dike; ji ber ku kom û kirde dixwaze tiştên ku sînorên wî tehdît dikin, ji xwe dûr bixîne.

I.M. Jung, ji şîroveya Krîsteva dide ser û dibêje; “nijad, zayend û zayenda serdest, pêşî yên ku ne serdest in ji nava xwe diavêje piştê jî wê wekî heyîneke pîs û pelas dide nasîn. (Mutluer, 2013:15). Bi wî awayî, ên ku ne serdest in: nijad, zayend, etnîsîte, meyla zayendî, jin, mirtib, reşik, û hwd. li gorî ên serdest bi awayekî tîn dîkekirin û di derveyî civakê tîn hiştin; loma jî, hem di sembolên zimên de hem jî di jêrhişa civakê de wek heyîneke “pîs û pelas” tîn hesabandin. Em dikarin bêjin; jin li hember mêr, reşik li hember çermespî, xulam li hember axa û efendî, homoseksuel li hember heteroseksuel, xizan li hember zengîn, gelê bindest li hember gelê serdest, welatên cîhana sêyemîn li hember welatên pêşketî dîke ye û bi tîgiha Abjectionê (pîs û pelas) hatiye pênasekirin.

Zayendê jî para xwe ji wan pênaseyan û awiran girtiye. Hemû pênaseyên wekî zayîn û pîrbûn, tîkilîya jin û mêran, malbat, zewac, di bin sîya rolên zayenda civakî hatine pênasekirin. Loma jî, desthilatdarîya mêrane polîtîk e û zanava zayendî li hîyerarşîya civakî hatiye lêkirin. Tacîza zayendî, pornografî, qehpiktî, zorgayîn, şîdet û arezûya mêr ya ku di zewacê de pêk tê, kirîn û firotina jinan, ew babet û gelemşe ne; ku divê wek polîtîk bîr xandin. Catharine A. Mackinnon tîgiha nêr wiha pênase dike: “Tîgiha ‘nêr’, tîgiheke civakî û polîtîk e. Ne taybetîyeke bîyolojîk e. Tîkilîya wê bi irsîti, bi pêşheyînî, bi xwezayê, bi pêdivîti, bi jênerê, yan jî bi laşî re tune ye. (Mackinnon, 2015: 136).

Her çî qas mîrbûn jî wek jinbûnê, roleke zayenda civakî ye ku hatiye afirandin, bi nihêrîna “mêr bi hêz e” “serdest e” hatiye normalkirin pê re jî hemû kirinên mêrane bi vê normalîyê hatiye qebûlkirin.

Ji ber vê normalîyê ye ku; qehpiktî bi destê dewletan wek karekî hatiye dîtin û bac jê hatiye wergirtin; pornografî wek azadîya derbiranê hatiye pênasekirin, zorgayîn bi tehrîkê ve hatiye nirxandin û bi ser de jî di qanûnan de bi tîgiha “bandora tehrîkkirinê”, wek sîcê jinan hatiye qebûlkirin û sivikkirin.

Ev nirxandin hemû; rolên zayenda civakî, epîstemolojîyên hatine hilberandin, rêgezên sincî, tîkilîyên îqtîdarî, rewşa polîtîk; jin wek dîke pênase kiriye bi dîkebûn û kêmbûna wê ve bi sînor kiriye.

Her wekî ku di gotara (discourse) “erotîk” de dide der, bi tevî mirovbûna wê, mêbûna jinê hatiye beloqkirin û “wek heywanan” hatiye dîtin; û her wekî di gotara

(discourse) dînfî de jî dide der, ji alî fîzîkî û sincî ve qels hatiye pênasekirin û ev yek di encamê de mirovbûna jinan çalexwarî dike û qels dike. Wekî ku Fetna Ayt Sabbah dupat dike, têklîfya di navbera jin û mêr de li gorî xwestekên efendî yanî mêr tê sazîkirin. (Sabbah, 1995: 109).

1.1.2. Bavkanî, Netewe, Dewlet û Îktîdar

Bavkanî yek ji pênaseyên zayenda civakî ye ku xwe dispêre ajara bav û jinê wekî heyîneke ku bes zarokê mêr tîne dinyayê, tê pênasekirin. Bi vê re jî, zanava mêr tê avakirin û xurtîkirin. Mêranîya serdestîparêz, bi vî awayî, li cî û demeke hatî hînkîrîn, bavkanîyeke li gorî şert û mercên xwe ava dike û ji bo kontrolkirina jinan stratejîyên diyarkirî, xwe xurtîr û bi cî dike. Bi van stratejîyan, hem hilberîna zanava nêrane hem jî tiştîkirina jinê tê pêkanîn.

Wekî ku me li jor jî dupat lê kiribû xebata Lewis Henry Morgan a piştî ezmûn û çavênîyên bi salan ku di nav *Irokuayan* de kiriye û di sala 1877a de belav kiriye; û xebata Patricia Draper a li ser gelê *Kungbûye* sedem ku derbarê bavkanîyê de pirsên nû bê kirin û ferasêta dîrokî a aqilê mêrê serdest, digel ronahîya van xebatên zanistî bê rexnekirin.

Li gorî Morgan, zewaca *punaluatewrekî* zewacê ye ku birayên dê ji derveyî zewacê hatiye hiştin û pergala vî tewrî zewacê bi vî awayî dest pê kiriye. Jin di vê pergala de hatiye mecbûrkirin ku ji tîkîlîyên pîrmêrî û enestê dûr bimîne. Ji ber ku di qonaxa ku jinek xwedî gelek mêran e de peyitandina bavtîyê ne mimkun e û pergala bavkanîyê li ser van xîman û bi sînorkirina jinan ava bûye.

Gava hê pergala bavkanîyê tune bû û zîncîra ajardê û pê ve jî hiqûqa dayîktîyê hebû, çînen civakî tunebûn. Piştî ku şikestina pergala ajardê, hem xîmên bavkanîyê hem jî xîmên çînen civakî tê danîn. Engels, ku xebatên xwe ên der barê, malbat, dewlet, çîna civakî û milkê taybet de dispêre xebatên Morgan û dibêjê; “Mafê bavtîyê ê li hember mafê dayîktîyê, tîkçûyîna dîrokî a zayenda jinê ye.” (Mackinnon, 2015: 41).

Li gorî ferasata ku wek nêzîktêdayîna Engelsparêz tê binavkirin; piştî destpêkirina bavkanîyê jinan mafên xwe wînda kirine, mêran li ser ked û zayokîya jinan mekanîzmayên kontrolkirinê ava kirine û li dewsa bîrûbawerîyên olî ên xwedawendî serdestîya olên yekxwedayî bavkanî ava bûye; bi van mekanîzmayan

her ku çûye hiqûqa dayiktîyê ji holê rabûye û ev jî bûye sedem ku hiqûqa bavtîyê li dar be.

Wekî ku Deniz Kandiyoti jî tîne zimên, “têkilîyên xizmî û malbatî, mantiqeke wan a navxeyî heye; lê belê ev yek bi tena serê xwe ne diyarker e. Divê mîna ku ev yek ji derveyî aborîyê be; û derdîrokî û neguherbar be neyê famkirin. (Kandiyoti, 2015: 71)

Piştî van geşedanên, digel pîrbûna hejmara mirovan *gens* derketin holê û pê re jî gensa makî ku ji gelek gengan pêk dihat; yani *fratriyaderket*. Ji gelek fratriyayan jî eşîr peyde bûn. Gens xwedî rengêkî daykanîyê bûn û bi prensîbên (rêgezên) milkdanîya hevpar dihatin birêvebirin.

Wekî ku Agust Bebel jî qal dike, karên wekî nêçîrvanî, ajalkarî û kiştûkalî, ku ji bo kirina wan zanînên taybet divê; û çêkirina alav û amrazên ku dê ji bo van karan bînan bikaranîn bû para mêran û pê re jî desthilatdarîya mêran zexmtir kir. Mêr bû xwedî û efendîyê van karên zengînîyê. (Bebel, 1996: 61- 62). Ev xwedîtî û efendîtî digel hin qedexeyên ku li jinan hate ferzkirin her ku çû zexmtir bû. Qedexetî li ber jinan hat danîn ku bi mêrên dîtir re nekeve têkilîyê, pê re jî bingeha yekhevserî û heteretîyê hat danîn û “Bi serdestîya milkê taybet, hat mohrkirin ku jin ketiye bin nîrê mêr. (h.b. 65).

Derketina holê a milkdarîya taybet, jihevcihêti û nakokîyên çînî, divêtiya parastina desthilatdarîya kesên milkdar a li dijî kesên xizan, divêtiya mekanîzmayekê bi xwe re çêkir. Ev mekanîzma, dewlet e. Ji ber vê ye ku dewlet nêrane ye, hiqûqa dewletê nêrane ye. Catherine A. MacKinnon diyar dike ku: “Têkilîya di navbera civak û zagonan de heye jî, perspektîva serdestîya nêrane dipejirîne.” (Mackinnon, 2015: 189). Ji ber vê yekê ye ku kurtaj, fahişetî û porno ji parçeyên pêkanînan dewlet û zagonên nêrane ne.

Dewlet bi xwe, derbirana rasterast a berjewendîyên mêran e û bi hemû mekanîzmayên xwe ve di destê mêran de ye û mêr serdest e. Wekî ku Josephine Donovan jî tîne zimên: “Bîrûbawerî, kodên civakî, kitêbên pîroz û hemû peyker, li ser ramana bavkanîyê hatiye danîn. Ev raman dibêje; jin piştî mêrî û ji bo mêrî, kêmnirx e û girêdayî mêr hatiye afirandin.” (Donovan, 2015: 84).

1.1.3. Mêranî û Gotara Nêrane

Di hilberîna qalibên zayenda civakî de, mêr diyarker e; avayên serdestî û desthilatdarîyê ên di navbera mîran de, dike ku bavkanî ji nû ve bê hilnerandin. Ev yek jî dibe sedem ku digel hin kod û zanavên nêrane mekanîzmayên şidet û çewisandinê ava bibin. Çavan ku pênaseya jinê, di nav rolên zayenda civakî de hatiye avakirin, bi vî awayî mêr jî di nav van mekanîzmayan de hatiye pênasekirin. Em dikarin bêjin ku mêran hem mêr hem jî jin pênase kiriye, ji ber vê ye ku jin bi hestan, mêr jî bi aqil re hatiye yekkirin. Fonksiyona jinê a esasî zayokî dayikî; fonksiyona mêran jî wek organîzekirin; birêvebirin tê pênasekirin. Jin wek mekan di nava malê de; mêr jî li derve û di qadên giştî de tê cîbicîkirin. Jin, ji bo berdewamîya ajara mêr wek alav; mêr xwedîyê zarokan, jinan û mal û milkan tê qebûlkirin. Ji ber van yekan e ku bi sedan salan di tu qadên civakî de jin nebûye xwedî mafên wek temsîliyeta, reydayîn, xebat, cihêbûn û kurtajê. Digel vê yekê, jinê di nav van sedan salan de têkoşîneke giran û dijwar daye da ku mafên xwe bi dest bixe. Loma jî, em dikarin bêjin ku mafên ku di roja îroyîn de hatine bidestxistin û temsîliyeta kêmrêjeyî ku heye, encamên vê tekoşînê ne.

Têgiha mafên jinan, bi xwe re şaşîtyek jî ava kiriye, dîsan xeletîyeke zimanî çêbûye û feraseteke nêrane xwe lê ferz kiriye. Tiştê ku wek maf tê binavkirin bûye ew tişt ku ji mekanîzmayekê tê parskirin an jî ji alî wê mekanîzmayê ve tê bexişandin. Herçî jin e, nîvê mirovahîyê pêk tîne; tiştên ku mêr bi dek û dolaban jê dizîye, mecbûr maye ku car din wan tiştan ji mêr pars bike. Mêrê ku mekanîzmayên desthilatdarîyê hûr hûr rêstîye, helbet li hember van daxwazan pêşî li ber xwe daye, piştî jî bi tawîzên biçûk hin maf dane.

1.1.4. Kirde û Tişte

Wekî ku Irzîk û Parla jî tînin zimên, yek ji peyîtandinên femînîzmê a esasî ew e ku jin mecbûr maye di nav zimanekî ku mêran ava kiriye de bijî. (Irzîk, Parla, 2014: 8).

Wekî ku me berê jî diyar kiribû, bavkanîyê mekanîzmayên desthilatdarîya xwe û pê re jî simbolên xwe yê zimanî afirandîye. Zimanê civaka bavkanîyê, bi

awayekî kiraskirî an jî aşkera jin kiriye tişte û bi vê rêbazê jin dexm (dax) û nîşan kiriye. Mêr bûye kirdeya jiyana û zimên, jin jî bûye tiştê jiyana, mêr û zimên.

Em di vê xebatê de bi awirekî berevajî dixwazin bidin nîşandan ku temsîliyeta jinê ya di wêjeyê de, vegotin û kodên nêrane a heyî, çawan tê teşîkandin û feraseta ku ji hezaran salan de hatiye, bi çî awayî tê pûçkirin û rûxandin.

Pirî caran, jin jî bi van kodan jinan pênase dikin, loma jî jineke Ewrûpî an jî Amerîkî a xwende, rewşenbîr an jî hunermend, jineke Afganî a ku bûrka li xwe dike an jî jineke Îranî a ku hîzar li xwe dike wekî kêmxistî û kêmnirx dibîne. Heman jina xwende û rewşenbîr, jina Ewrûpayî a ku wek alava reklaman tê bikaranîn, ji jina bûrka û hîzar li xwe kirî, pêşveçûyî qebûl dike û pirî caran, ev yek bi awirekî oryantalist pêk tê û ji mijara esasî dûr dikeve. Geleşeya esasî ne geleşeya rojhilatîbûn an jî rojavayîbûn, Îslamîyet an jî Xirîstîyanê, feodalîzm an jî modernîzm e. Geleşeya esasî ew e ku jin di van sîstem û mekanîzmayên hemûyan de wek tişte û dîkekîrî hatiye dîtin û qebûl kirin.

Teorîsyenên femînîzmê yên wekî Luce Irigaray, Hêlêne Cixous, Julia Kristeva, bi taybetî di metnên felsefê û psîkanalîtîk de, li ser dijberîya jin û mêran sekinîne û xebatên xwe li ser fikra ku mêr wekî alîyê pozîtîv, jin jî wek alîyê negatîv bin, ifade kirine. Judith Butler balê dibe serê û dibêje, “Faucault, balê dikişîne ser sîstemên desthilatdarîyê ên hiqûqî kirdeyan diafirînin û piştre jî wan temsîl dikin.” (Butler, 2014: 44).

Nexwe pîrsek wek arîşeyek derdikeve pêşîya me ku em dikarin bipîrsin, kategorîya jinan ji çî pêk tê yan jî divê ji çî pêk bê? Geleşeya esasî di vê pîrsê de ye, ji ber vê jî nanakirinên me yên li hember zayenda civakî de çî be û em ê çî têxin şûna wê? Ma gelo, pênase û agahî jî, hilberînen vê zayenda civakî nîn in? S.d. Beauvoire diparêze ku “jin wek dîkekîrî hatiye diyarkirin”, Luce Irigaray diparêze ku “jin ew heyî e ku nikare were temsîl kirin”, Monique Wittig jî dîtina “jiholêrakirina zayendê û kirdebûna jinê di statûya gerdûnî de” diparêze.

Em dikarin bêjin ku femînîzm û tevgerên jinan mecbûr in ku kirdeyên xwe ava bikin û digel vê jî pêwîst e ku hemû têgihanên ji hezaran salan ve ye li dar in birûxînin. Epîstemolojîyên ku bi kodên zimanê nêrane hatiye saz kirin; zanistên pozîtîv, feraseta dîrokî, berhemên wêjeyî, felsefê û tew zanista arkeolojîyê jî qebûl

kirine ku nivîn û sazkirina dîrokê aîdî kirdeyekî ye; û ew jî mêr e û jin jî di dîtîn û qebûla van epistemolojîyan de yan tune yan jî tiştetek e.

Gelo avakirina zimanekî nû mimkûn e; zimanekî ku ji derveyî kodên ku ji hezaran salan bi virde ava bûne, pûç bike û pê re jî jineke ku kirde ye ava bike. An jî gelo em ê bi helwesteke Derridayî, dijberan birûxînin? Tiştên ku me ew navoyî kirine û em hîn bûne ku bi wan bihizîrin, gelo em ê dijberîyên wekî madde û ruh, kirde û tişte, şaş û rast, ruh û laş, tekst û wate, naveyî û derveyî, kakil û xuyakirin û hwd. birûxînin?

Ji ber ku têgihek bi têgiheke dijberî xwe heyî dibe û rêya rûxandina dijberê xwe, rûxandina wê têgihê ye, loma jî, dibê ku rêya herî baş a rûxandina tiştêbûna jinê, bi rûxandina mêrê be. Têgiha arîşeya jinê ku ji alî tevgerên femînîstî, teorîsyenên femînîstî û a rast ji aliyê aktorên mêr ve hatiye sazkirin, balê dibe ser vê pirsê.; arîşeya jinê yan (jî) arîşeya mêrî? Hemin ku sazkar û rêvebir vê dîrokê û van mekanîzmayên desthilatdarîyê mêr e û li gorî prensîba Marks ku dibêje, “A ku îdeolojîyê diyar dike çîna serdest e.” Mirov dikare bêje; tiştê ku cîyê jinê diyar dike îdeolojîya mêrane a serdest e. Loma jî, dibe ku tiştê ku divê ji şûna xwe were leqandin kirdebûna mêrî ye. Hê jî yek ji gelemşeya herî girîng a tevgerên femînîst ev e; van tevgeran hê jî kifşe nekirine ka ew ê çî di şûna jina dîkekirî de cîbicî bikin. Hewce ye ku bersiva pirsê, “Gelo jina ku bêyî ku mêr ji derveyî tiştan bihêle xwe ava kiriye, çawan tê afirandin?” bê dîtîn.

1.1.5. Qadên Giştî û Qadên Taybet

Ji derveyî malê her der qada giştî ye. Mal, qada taybet e û divê jin di malê de bimîne. Ev dîtîn ji hezaran salan bi vir de ye hatiye û hê jî didome. Ji ber çî? Ji ber ku hatiye qebûlkirin ku taybetîya jinê a herî mezin dayiktî ye, loma jî bi awayekî xwezayî, cîyê ku divê lê be û xizmetê bike, mal e. Her dera ji derveyî malê, bi sedan salan bo jinê hatiye qedexekirin. Jina ku bi rîtûelên diyar, yên wekî xwezgînîşandin, cihêzdayîn, şahî û dîlan, ji alî mêrekî ve bo mêrekî dîtir tê dayîn, hem ji alî zayendê ve û hem jî ji alî vehilberanê ve dikeve ber xîzmeta mêrekî. Di fodalîte û di jiyana çolterê de wekî bûk daxilê eşîrê û malbata mezin dibe. Mekanîzmayên kontrolê ji van kesan pêk tê; mezinê malê xwezûr, mêrê jinê û xwesû. Li gund , li bajarok û li bajaran, jin her tim di nava malê de ye. Bi kapîtalîzmê re têkilîyên aborî ji nû ve

dirûv girt, gund tev li bazara neteweyî hat kirin, koçberîya ji gundan bo bajaran pêk hat, kargehên hilberînê ên biçûk ava bûn û dûre ji cîyê xwe hîşt ji fabrîkayan re û digel van demajoyan jin mecbûr ma ku li cîyên derveyî malê jî bixebite. Jin, ji qadên teybet daket qadên giştî, ev jî bû sedem ku jin ji du alîyan ve were mêtin.

Teza “tiştê taybet polîtîk e”, diparêze ku divê cudatî û têkilîyên van her du qadan hem di teorî hem jî di gotinê de bê avakirin. Ji ber ku tiştê ku di qada giştî de tê jiyandin; şidet, tecawiza di zewacê de, nebûna berginda (heqdesta) keda di nava malê de hatî dayîn û hwd., jinê dixwe rewşa zirheyînekê. Ev rewş jî di bingeha xwe de wek pêkanîn polîtîk in. Ji ber ku qada taybet jî wek qada giştî bi kodên bavkanîyê hatiye bipergalkirin. “Ji ber ku tiştên di qada giştî de dikevin ber bêjînga rexneyê, ji mercên habûna ên polîtîk ên qada giştî ve tînişandin. (Acar-Savran, 2013: 147).

Jin ji hemû qad û çalakîyên ku qîmet bo wan tê dayîn, bi jihevcihêtîya qadên giştî û qadên taybet hatine dervekirin. Ji polîtîkayê, ji perwerdehîyê, ji sporê, ji qadên xebata zanistî, ji lobaratuwaran, tew ew çend balkêş e ku ji mekanên derveyî ên berhemên wêjeyî jî hatine dervekirin. Qadên wekî qehwexane, pavyon, aşxane, bar, mizgeft, kuçe û meydan -herî zede jî bi şevan- bo jinan qedexe ne. Mêr li ku bixwaze dikare li wê derê araqê vexwe, bimeşe, rûnê. Mêr ji ber ku zikê xwe tîr bike, bêhna xwe vede, bi jinê re tîkeve nav cîyan û razê tê malê. Cî û mekana wî a esasî derve ye; yanê hemû dinya ye.

Hemû geşedanên ku der barê mafên jinan de pêk hatine bi daketina jinan a qadên giştî li dar ketiye, jina kedkar û xebatkar, jina siyasetvan, jina hunermend, jina şervan, jina ku bûye dayika şemîyê, jina nivîskar, jina aktîvîst, mînakên sereke yê daketina jinê bo qada giştî ne. Di vî warî de xebata Handan Çağlayan a ku li ser jina Kurd kiriye, girîng e ku Çağlayan dibêje, “Daketina jinê a bo qada giştî, kodên bavkanîyê ji hev verêsand.” Ji ber ku di demajoya kesîdebûnê de tevkarîyên girîng kirine.

Çalakiya kolektîv regekî xwe yî wisan heye ku; jin tê de, xwe wekî kirdeyên xwedîmaf ava dikin û di vî demajoyê de, bi vî awayî zanava jinê pênase dikin. Di civaka Kurdan a adetî de, jinên ku wek kesîde nayên qebûl kirin, bi rê û rêbaz çalakîyên kolektîv xwe wek kesîde ava dikin. (Çağlayan, 2014: 237–238).

Çalakîya kolektiv û kesîdebûnê, hebûna jinê a di qadên giştî de xurttir kiriye û bûye sedem ku hin guherînên dîrokî pêk bîn. Di destpêka sedsala bîstemîn de, li Îngîlîstanê û li YDAYê (Yekîtîya Dewletên Yekbûyî ên Amerîkayê) bi rêyên wekî berxwedana pasîv, felişandina civînên fermî, li derxistina greva birçîbûnê, li kolanan kişandina cixareyan - ji ber ku qedexe bûye ku jin li kolanan cixareyê bikişînin- parêzvanên mafên jinan ku kêr zêde rêxistî bûne, parastina mafê hîlbijartin û hatina hîlbijartinê dikin, wek “sufrajê” hatine binavkirin. Û piştî van têkoşînan “di 18ê Tebaxa sala 1920î de, ji alî eyaleta Tennessee ve guherînên bi navê Anthony an jî sufrajê hatine erêkirin û bûne parçeyên mekanîzmayê.” (Donovan, 2015: 123).

1.1.6. Malbat, Zewac, Kevanî, Keda Li Navamalê

Malbat, sazîya herî xurt a bavkanîyê ye û dikare li gorî serdem û heyamê dirûvên nû bigire, dikare berfireh û berteng be. Mirov dikare wek malbata binetar an jî malabata mezin a eşîrî bi nav bike; lê belê her tim bûne sazîya ku serdestîya nêrane lê cardin û ji nû ve tê hilberandin. Birêvebirina sazîya malbatbûnê a ku îqtîdara mêrî tê de tê zexmkirin, her wekî dewletbûnê ye ku mekanîzmaya herî mezin a desthilatdarîya mêran e. Malbat jî bi endamên pêgirêdayî û ji mêrê desthilat; dewlet jî civaka pêgirêdayî û ji mêrê desthilat pêk tê. Engels balê dibe ser ku peyva *familyayê*, di dema Romayîyan û di destpêkê de ji bo jin û mêrên bi zewac û zarokên wan nedihat bikaranîn, lê tenê ji bo koleyan dihat bikaranîn. *Famulus*, dihat wateya koleyê kedîkirî, famîla jî dihat wateya hemû koleyên ku mêrek xwedîyê wan e. Lê belê gava heyama Gauise dest pê dike, famîla bî rêya mîratê ve ji bav derbasî kur dibe. Têgiha famîla, yanê malbat, ji alî Romayîyan ve, ji bo pênasekirina jin û zarokên serok û ji bo pênasekirina organîzmayeke civakî ku serok tê de gelek koleyan bi rê ve dibe, hate afirandin. Di bin serdestîya bav û Romayî de hat birayekirin ku mafê wî bavî hebû li ser jiyana wan hemûyan biryarê bide. (Engels, 2008: 121-122)

Berî civaka bi çîn, dayikan karîye û ji wan hatiye ku dayiktî û keda hilberîner digel hev bimeşînin û bi rûxandina hiqûqa dayiktî a ku bi destê mêran pêk hatiye bûye sedem ku jin ji qada giştî were dûrxistin û di qada taybet de -mal- were hepskirin. Yekhevserî û saziya malbatê ku li jinê hatiye ferzkirin ka bê ji ber çi ye di

ser jinê re heyî bû. Jina ku saziya malbatê de hat hepskirin, bi rola dayikîyê hat xapandin û di ser wê re jî, qadeke dîtir li ser kêmxistina jinan hat avakirin ku nav lê hat kirin; qehpîktî. Smith jî di vî warî de, dupat lê dike ku “Bi geşbûna yekhevserîyê, zayendî cara yekem wekî fahişetî mîna meta -mal û milk- hat saz kirin. Her du jî, berhemên civakên bi çîn in.” (Smith, 2012: 51)

Saziya malbatê ku bi hemû qodên xwe ve serdestîya jinê tê de hatiye şikandin û jin tê de hatiye kolekirin, di hemû qadan de pîroz hatiye qebûl kirin û ji bo domdarbûna wê a di hemû sisteman de têkoşîneke xurt hatiye dayîn. Em ji gotara ‘cînet di piyên dayikan de ye’ bigirin heta bi banga ku Vatîkanê di 1947an û di Kongreya Jinan a Navnateweyî de kir, dikarin wekî mînak nîşan bidin. Di van kongreyan de ku wekî Konseya Navneteweyî a Jinên Ciwan ên Katolîk û Yekîtiya Komeleyên Jinan a Katolîk a Navneteweyî tên binavkirin, balakirina dayikîyê, mayîna jinan a di malê de û tevlênebûna wan a karên polîtîk û dewletî wek fikra esasî a van kongreyan e.

Têkilîya beranberî a di nava mêran de heyî; bi rê û awayên wekî bazirganî, şer, têkilîyên desthilatî, mîratemayîn, sermîyanêya malê, xwedîtiya mal û milkan hebûna xwe domandiye. Di nava vê têkilîya beranberî de, belkî jî zewac bûye rêya herî xurt a bipêşxistina têkilîyên xizimîyê. Û di vê bazarê de, tiştêya herî girîng jin e. Lévi-Strauss, dupat lê dike û dibêje, “Alegoreke (taqaseke) navneteweyî heye ku hemû pergalên xizimîyê bi nav û temsîl dike... Tiştêya ku têkilîyên xizimîyê ji aliyekî ve zexmtir dike û ji aliyekî din ve cihêreng dike, jin in, bi rêya zewacê ji klaneke bavkanîyê bo klaneke dîtir wek dîyarî tê pêşkêşkirin.” (Butler, 2014: 96).

“Bûk” figura herî balkêş e di vê danûstendinê de. Her çî qas li gorî çandan guherbarîya xwe hebe jî bi rêya hin rîtûelan tê dayîn û stendin. Jin bi rîtûelên wekî dayîna drahomayê, bûkanî, rihêl (cihêz), qelend, xwazgînî, di dema mehrbirînê de teslîmkirina jinê a ji alî mêrekî ve bo mêrekî dî û ya herî girîng; teslîmkirina keçanîyê (bekaretê) a bo mêrekî, tê dayîn û stendin.

Simon de Beauvoire gava dibêje, “kevanî li derveyî demê ye; ew tu tiştî nake, bes dema niha domdar dike” dupat lê dike û dixwaze bêje; jina ku di wê mekanê de hatiye cîbicîkirin, neçar e û temamkera hêlînê ye. Çêkirina xwarinan yek ji rîtûelên herî girîng a zewacê ye; stûna herî girîng a têgiha hêlînê ye. Kodên ku di zarokîyê de

li jinan hatiye barkirin, di jinê bi xwe de jî endîşeyeke jinane bi jinan re çêkiriye ku jin bi xwe jî hay jê nîn in. Ev endîşeya jinane, bûye sedem ku karên xizmet û xwedîtîlêkirinê bibin para jinan. Em dikarin bêjin ku karên wek kevanîtiya baş, kêfxweşkirina mêrî, zarokanîna bo wî, paqijîya malê, parastina namûsa mêrî, têkirina daxwaza zayendî a mêrî, mînakên karên xizmet û xwedîtîlêkirinê ne. Gava jin di nava malê de van kar û xizmetan pêk tînin, tu car behsa ked û heqdesta jinan nayê kirin. Ev mêtin ew çend piralî û pirrehend e ku hem mêtineke laşî hem jî mêtineke giyanê ye. Ka bê ji ber çî ye, ev awa mêtina mêrî tu caran nabe sedema neyînîyên ku di nava malê de diqewimin. Simon de Beauvoire dibêje, “Helbet tu kes nayîne bîra xwe ku trajedî û durûtîyên di nav malbatê de diqewimin, înkâr bike; lê belê kesên ku alîgirê zewacê ne, diparêzin ku nelihevîyên di navbera jin û mêran de çêdibin ne ji ber sazîya malbatê ye lê ji nîyetxirabîya kesîdeyan e.” (Beauvoire, 2010: 89).

Ji ber sedema îdeolojîk e ku keda jinan a ku di nava malê de tê dayîn, wek ked û tevkarîya bo hilberînê nayê hesibandin. Hem zanistên civakî hem jî zanistên aborîyê bi zanetî çavên xwe ji vê yekê re girtine. Mixabin, Marksîzma ku kedê bi her awayî pênase dike di vê mijarê de bêdeng û kêma maye. Marksîzm wisan nirxandiye ku; ji ber ku keda jinan a di malê de nayê bedêlkirin û nabe zêdebarî, hêja nehatiye dîtîna ku were analîzkirin. Navê mekanîzmaya ku keda jinan bi vî awayî dixê bin kontrola xwe jî wek *‘pevbestîya hezkirinê’* hatiye binavkirin.

Bi peymanî zewacê mêran xwe kirine xwediyê keda jinan. Ji ber vê ye ku gava jin û mêr ji hev cihê dibin mêr nefeqe didin jinan. Dayîna nefeqeyê delîla desthilata mêran û muhtacbûna jinan e. Tevgerên femînîst girîngî dane meseleya ‘dayîna heqdesta keda di nava malê de tê dayîn.’ Ji ber ku ew wisan fikirîne ku ev yek dê keda jinan dayne ber çavan û dê nîşan bide ku gelemşe tenê ne gelemşeya têkilîyên hilberînê ên kapîtalîst e. Ji ber ku kapîtalîzm û pergala bavkanîyê bi hev xwedî dibin, hev xurt û zexm dikin û du mekanîzmayên mêtîngerîyê ne ku pal û piştî xwe dane hev û ji keda bêbergind a jinan sûd û kelk girtine.

“Dîtina ku dibêje, gava heqdesta karê di malê de tê kirin, bê dayîn, wê hingê rizgarîya jinan dibe qonaxeke girîng a têkoşîna çînî. Têkoşîna jinan di heman demê de, ji wêdetirê karkerên ku bi heqdest dixebitin, digihîje hemû kedkarên ku bêheqdest dixebitin, ku wekî çîneke nû tê kifşkirin.” (MacKinnon, 2015: 87).

Ev peyta MacKinnon jî diyar dike ku gelemşeya heqdesta keda jinan a di nava malê de tê dayîn, bi *pevbestîya hezkirinê* ve hatiye girêdan û tiştêkî bi navê qada taybet tune ye. Rolên ku di nava malê de li jinan tê barkirin û mala ku wekî qada taybet tê pênasekirin, hema wisan jiberxweve û bi awayekî xwezayî ava nebûye.

1.1.7. Şîdet, Şîdeta Di Nava Malê De, Fuhûş, Koletî, Pornografî, Tiştêya Zayendî

Îdîaya ku dibêje mal qada taybet e, di heman demê de diparêze ku gava deriyê malê tê girtin, tu kesî eleqedar nake ka di hundir de çi diqewime. Ramana ku malê wekî qada taybet dibîne û dibêje gelemşeyên di nava malê de çêdibin çandî ye, serdestîya mêran û şîdeta ku di nava malê de ji aliyê mêran ve tê pêkanîn meşrû dike. Pênaseyên wekî ‘çand, kevneşopî, mîrateya ku ji bav û kalan de maye’ hewldana biperdekirina bo vê şîdetê ye. Hincetên wekî; jin şeytan e, devbelaş e, xweya xwarinê an zêde ye an jî kêr hatiye, jin di ber televîzyonê re derbas bûye û hwd., di rastîya xwe de ne girîng in û şîdeta ku bi her awayî li ser jinan tê pêkanîn, berhema û feraseta pergala bavkanîyê ye. Şîdeta tê behskirin, ew şîdet e ku pêşî mêr li ser jinan pêk tîne piştê jî mêr li hember mêran pêk tîne û dibe sedema xweheyîkirina mêran. Di nav gerîneka van têkilîyan de jin wekî xezala kulman tînin bikaranîn. Şîdeta ku pêk tê; hiqûq, dewlet, hemû mekanîzmayên îqtîdarê, yan bi awayekî aşkera yan jî bi awayekî veşartî, şîrîkên wê ne. Ev şîdet û mekanîzma dibe sedem ku jin serî hîlnebin. Mala ku qada îqtîdar û kontrolkirinê ye, bi raye û selahîyetênsazîya zewacê dide destê mêran, ji her aliyê veji bo jinan dibe cihenem. Çanda ku kiryanan yek bi yek dide ber xwe û dîsan yek bi yek li ser wan diaxive, li xwe dike armanc ku rehenda civakî a şîdeta ku li ser jinan pêk tê, bi perde bike û hewl dide veşêre ku ev şîdet ne tevgerê hevpar a mêrane. Wekî ku Janice Haaken jî dibêje, “Gava em mîrên ku di nava malê de şîdetê pêk tînin wekî kiryarên xweser nîşan bidin, em ê îqtîdar û dînamîkên kontrolê ku nivîskarên esasî ên vê dramê ne, paşçav bikin.” (Holmstrom, 2012: 218).

Em dikarin bêjin ku şîdeta di nava malê de, gelemşeyeke polîtîk û qada giştî ye ku faktorên çandî û civakî bandorê lê dike. Loma jî, zewac malê dike qadeke

berbiçav û meşrû dike û tevkarî li domdarbûna şidetê dike. Her wekî polîtîkayên zayendî, polîtîkayên şidetê jî, ji alî îqtîdara nêrane ve bi awayekî pûtepêdanî û bi hişmendî hatiye avakirin. Yek ji peyta herî girîng a vê yekê ew e ku; heta van salên nêz jî, tecawiza di nav zewacê de ji alî sîstemên hiqûqê ve wek sûc nehatiye qebûlkin. Heke em bala xwe bidin gotina Alison Stone ku dibêje “Divê em bi bîr bînin ku tecawiza di nav zewacê de, di dîrokeke nêz de, li Îngilistanê di sala 1991ê de û li YDAyê jî di sala 1993yan de wek sûc hatiye pênasekirin.” (Stone, 2015: 21).

Tecawiz ne ew şaşfamkirin e ku di navbera du mirovan de diqewime. Sedema tecawizê ne dirûvê biyolojîk ê laşê jinan e; sedema tecawizê cîyê jinan a di civakê de ye. Tecawiz, ne herifina qaydeyên sincî ye û ne jî ew dejenerasyon e ku kapîtalîzmê pêk anîye. Loma jî, çendî ku sîstemên hiqûqê ên nêrane tecawizê wekî razîbûn û sedema pîjkinê şîrove bikin jî ev yek nikare kirasê şidet û îşkenceyê ji tecawizê bike. Sûcê tecawizê ku di tu demê de nehatiye qedexekirin û çareserîyên mayînde bo wê nehatiye peydekirin û tenê dem bi dem bi awayekî ku karibe mexdûrîyeta mêran kêr bike, hatiye biserûberkirin.

Koletî; destdanîna li ser hemû mafên jiyane ye, kirîn û firota mirovan e, dewrkirina mafê xwedîbûnê bo kesekî din e û tecrîd û goşegirîkirina ji civakê ye. Koletî; ne tenê mehrûmmana ji mafên hemwelatîyê ye pê re jî bêparmayîna ji mafên jiyane a mirovane ye. Jinên ku di endustrîya seksê de dixebitin, bi temamî di statuya koleyan de ne; ji lew re ji parastinên neteweyî, navnateweyî û çandî bêpar in. Li hember şidetê, li hember nexweşîyên têger bêsî û star in. Dîmenên egzotîk ên dinyaya sêyemîn, taybetîyên cihê ên laşî ku kana wan nîjad û etnîsîte ye, senifandinên wekî jinên reşîk û qemer, asta gerdûnî a koletîya seksê datîne ber çavan. Tayland, bûye ew welat ku ji hemû welatan mirov ji bo turîzma seksê diçin wê derê. Û mixabin tu qanûn û mekanîzmayên edaletê tune ye ku wan jinên ku mecbûr in ku rojê bîst û pênc mişterîyan qebûl bikin, biparêze. Mişterî mêr e. Di her serdemê de û li her derê dinyayê, desthilatên mêrane kerxaneyan didin şixulandin û ji wan kerxaneyan bacê digirin. Dîsan heman desthilatên mêrane pornografîyê wekî *azadîya xweîfadekirinê* qebûl dikin.

Pornografî di civaka hemdem a endustrîyel de, ew şaxa endustrîyê ye ku bi awayekî tevdehî tê hilberandin; û tê de li hember jinê êrîşa zayendî pêk tê, jin ji alî

mêran ve tèn bidestxistin, mêr dibin xwedîyên wan jinan û jin ji bo pereqazanckirina mêran ji bo seksê tèn bikaranîn. Pornografi, ji bo pereqazanckirinê; newekhevîya aborî û zayendî a jinan dimije. (MacKinnon, 2015: 342-343).

1.1.8. Mafê Kurtajê, Eugenic, Kontrola Zarokanînê

Bidestxistinên herî mezin ên tevgerên femînîst, mafê kurtajê ye. Di 20ê Çileya 1973yan de, dadgeha bilind a Amerîkayê di doza ku bi navê Roe v. Wade tê zanîn, biryar da ku kurtaj mafek e û mijareke mehrem e ku di navbera dayik û doxtor de ye. Digel ku jin dikeve nav travmaya dilnî û laşî a ducanîya nebidil, dêr, dewlet, mêr, malbat, partner, otorîteyên dînî bûne xwedî rayeya kontrolkirina vê yekê. Anegorî femînîstan, mafê kurtajê yek ji pêşmercên azadîya jinan e. Feraseta ku diparêze ku jina ku mafê kontrolkirina laşê xwe ji destê wê hatiye girtin dê nikaribe di tu qadekê de azad be û ev feraset bûye sedem ku li hemû dinyayê ji bo mafê kurtajê çalakîyên berfireh bên lidarxistin û li gelek der û deveran jî gelek destkeftî bên bidestxistin.

Qedexebûna kurtajê, bûye sedem ku jinên ku dixwazin ji ducanîyê xelas bibin, li çareya serê xwe bigerin û bi awayekî ne qanûnî û paşperdeyî kurtajê pêk bînin. Operasyonên ku tê de anestezî nayê kirin û bi rêbaza hilcoyê kincan tê pêkanîn, bikaranîna dermanên kîmyewî, xwespartina li kesên ne pispor û rêbazên ne tîbbî, dibe sedem ku bi hezaran jin bimirin yan jî seqet bimînin. Sharon Smith dide zanîn ku “Anegorî daneyên Rêxistina Tenduristîyê a Dinyayê, her sal li hemû dinyayê, heftê û heşt hezar jin ji ber kurtaja ne ewle dimirin.” (Smith, 2012: 65).

Rasteqînîya ku kurtaj mafek e û jin tenê dikare diyar bike ku rola vehilberandinê a wê ye, ji alî hemû îqtîdarên nêrane ve bi tundî tune hatiye hesibandin. Ji ber vê yekê ye ku li her derê dinyayê hemû qanûnên ku kirasê modernîyê li xwe kirine, hê jî car caran kurtajê qedexe dikin yan jî dixê bin destûrdayîna mêran. Phillips, di vî warî de wiha dibêje:

Malzarok, ne wekî xanûmanê ye ku were kirêkirin, ne jî ew cî ye ku ji alî dadgerek ve di bin kontrola qanûnî de bê hiştin da ku biryara mayîn an jî çûyîna pizekî (cenînekî) bê dayîn. Laş parçeyekî xwebûnê ye, ancax sêwiranên nêrane ên derasayî ên derbar kesîdeyê, dikarin laş û xwebûnê ev qas hev cihê û ji derveyî hev bifikirin. (Phillips, 2012: 134).

Eugenic, jî yek ji wan mijarên îqtîdara mêrane ye ku bi qasî mafê kurtajê li ser laşê jinan tê pêkanîn. Anegorî eugenicê ku wekî ‘zanista pêşxistina rakendê’ tê binavkirin; jinên ku têrî zarokanîne nakin, jinên ku ji hêla mêjî û laş ve nivîşkan in, mehkûmên hepsê, xizanên ku rengê çermê wan ne spî ne, etnîsîteyên ku dûçarî nijadperestîyê mane, bi gelek rê û rêbazan hatine astengkirin ku zarokan neyînin. Sharon Smith dide zanîn ku “Di sala 1974an de, li Alabamayê, danişîna dozekê hatiye kirin û hatiye aşkerakirin ku li Alabamayê, her sal di navbera sed hezar û sed û pêncî hezar keçên çermreş hatine stewrkirin.” (Smith, 2012: 69).

Yek ji sedema dîtir a girîngbûna mafê kurtajê û mafê vehilberandinê, ew polîtîkên çînî û nijadperest in ku di ser laşê jinan re hatine meşandin. Ev polîtîkayên çînî û nijadperest, xwedî rengûawayeke gerdûnî ne. Heke jinên li bankayan dixebitin, jinên karker, jinên ku di bûro û kargehên mezin de dixebitin ducan bimînin, ji karê xwe dibin. Li dijî vê yekê, polîtîkayên nijadperest, destek dike ku mirovên ku ji nijadekê ne, zarokan bînin da ku hejmara nijadê zêde bibe. Ev yek jî nîşan dide ku ‘zarokanîn, kurtaj û zayîn’ tenê ne gelemşeyeke jinane ye, gelemşeyeke polîtîk û aborî ye.

1.1.9. Mafê Reyavêtinê, Demokrasi, Temsîlyet

Bi hezaran salan, jin, di nava malê de ku wek qada taybet hatiye hesibandin, hatiye pênasekirin û cîbicîkirin. Helbet di qada polîtîk de jî astengî li pêş temsîlyeta wê hatiye danîn. Sedema ku jin jîyana xwe wekî ku pêgirtîyê mêr be domandiye, ne ji ber girêdayîbûna wê ya bo kevneşopê ye ne jî ji ber bawerîya wê ya pîrozwerîya vê rola jinan e; mêrê ku qada giştî û qada taybet bi qodên îqtîdara nêrane bi dirûv dike, jinê li wê derê asê dihêle. Jina ku li wê derê hatiye asêkirin, nezan tê hiştin û helbet haya wê ji bayê felekê nîn e û ji ber vê yekê jî nikare bi rola mekanîzmaya biryardayîne rabe. Kesekî ku nikare biryarê bide jî, her wekî zarokan, dê nikaribe rey biavêje.

Bindestîya civakî ya nijadekê, ya çinekê an jî ya zayendekê, di sazî û zagonên di wî welatî de digihîje bersiva xwe. Zagon, berjewendîya wî welatî formule dike, van berjewendîyan bi hin qaydeyên diyar ve zexm dike û pergala xwe ya hiqûqî ava dike. Bi awayekî xwezayî, mekanîzmaya îqtîdarê di destê kîjan nijad, zayend û çîna rêvebir de be, hiqûq jî li gorî wê dirûv digire. Hemû komikên civakî ku bindest in; li

YDAyê çermreş, li Fransayê jinên sergirtî, li Tirkîyeyê Kurd, gey, lezbîyen, transgender, hema bêje li hemû dinyayê cengene, li hember burjûwayan çîna karker û hwd., yan di zagonan de nehatine pênasekirin yan jî ku ji mecbûrî hatibin pênasekirin, bi awayekî kêr û bîndest hatine pênasekirin. Jin jî wek zayendeke pêgir û bîndest, di hiqûqên welatan de anegorî vê ferasetê hatine cîbicîkirin. Wekî encama vê ferasetê, heta van salên nêzik jî mafê reyavêtina jinan tune bûye.

Di destpêkê de, di nîveka yekem a sedsala hevdehemîn de, bi awayekî kesîdeyî têkoşîna bo mafê reyavêtinê dest pê kiriye. Paşê paşê bi têkoşînên rêxistinkirî, dereng be jî têkoşîna reyavêtinê pêş ve hatiye xistin û di dawîya sedsala nozdehemîn de encam jê hatiye girtin.

Wek çend mînak gorî salan û dewletan, bîdestxistina mafê hîlbijartin û hatina hîlbijartinê:

1788	United States of America (hatina hîlbijartinê)
1893	New Zealand (hîlbijartin)
1902	Australia
1906	Finland
1907	Norway (hatina hîlbijartinê)
1913	Norway
1917	Canada (hîlbijartin), Netherlands (hatina hîlbijartinê)
1918	Austria, Canada (hîlbijartin), Estonia, Georgia ¹ , Germany, Hungary, Ireland, Kyrgyzstan, Latvia, Lithuania, Poland, Russian Federation, United Kingdom
1919	Belarus, Belgium (hîlbijartin), Luxembourg, Netherlands (hîlbijartin), New Zealand (hatina hîlbijartinê), Sweden, Ukraine
1930	South Africa (Whites), Turkey (hîlbijartin)
1934	Cuba, Portugal, Turkey (hatina hîlbijartinê)
1944	Bulgaria, France, Jamaica
1947	Argentina, Japan, Malta, Mexico (hîlbijartin), Pakistan, Singapore

1948	Belgium, Israel, Niger, Republic of Korea, Seychelles, Suriname
1951	Antigua and Barbuda, Dominica, Grenada, Nepal, Saint Kitts and Nevis, Saint Vincent and the Grenadines
1955	Cambodia, Eritrea, Ethiopia, Honduras, Nicaragua, Peru
1960	Canada (hatina hilbijartinê), Cyprus, Gambia, Tonga
1971	Switzerland
1976	Portugal
1980	Iraq, Vanuatu
1984	Liechtenstein, South Africa (Coloureds + Indians)
1986	Central African Republic, Djibouti (hatina hilbijartinê)
1989	Namibia
1990	Samoa
1993	Kazakhstan, Republic of Moldova
1994	South Africa (Blacks)
2005	Kuwait ¹

Mêrê ku xwedîyê dîroka mirovahîyê, felsefe, teknolojî, zanist û kurt û kurmancî xwedîyê her tiştê heyî ye, gava mirov dîroka şarezabûna mirovahîyê dide ber çavan, mirov dikare bêje bi hezaran salan kariye û jê hatiye ku jinê wekî ‘heyîneke tune’ bihesibîne. Ev rewş ew çend dirêj û ew çend gerdûnî ye ku hema bêje li hemû dinyayê mafê reyavêtina jinê tenê di sedsala dawî de ketiye behsê.

Digel ku mirovahî di gelek waran de bi pêş ketiye û di sala 1961ê de kariye biçê hîvê jî, jina ku nivê mirovahîyê ye û ji destpêka mirovahî bi vir de ye heye, bi hezaran salan wekî ‘heyîneke tune’ hatiye hesibandin. Sedema vê yekê ne ew e ku ji jinê nayê ku rey biavêje, sedem ew e ku mêr wê bi mekanîzmayên îdeolojîk û pratîk li derveyî dîrokê hiştiye. Sarah Grimké, di berhema xwe ya bi navê Letters on Equality de vê rewşê bi vî rengî tîne zimên. “Zayenda aqil tune ye... zayenda hêza hiş tune ye û... dîtinên der heqê ramanên ku dibêjin peywirên mêran û peywirên jinan, qada mêran û qada jinan, bes ramanên kêfî ne. (Donovan, 2015: 46)

¹<http://www.ipu.org/wmn-e/suffrage.htm> (Dema ragihînê: 24/10/2016)

Di sala 1793yan de, gava KONVET bangewazîya Mafên Mirovan -les droits de l'homme- dike, di heman demê de Olympe de Gouges û çend jinên hevrêyên wê jî têdigihîjin ku ev mafên ku hatine dîyarkirin tenê ji bo mêran in. Olympe de Gouges, Rose Lacombe û çend kesên di li hember 'les droits de l'homme' daxuyanameyeke bi navê "Mafên Jinan" a ji 17 xalan pêkhatî amade dikin û vê daxuyanameyê radestî Komûna Parîsê dikin. Di daxuyanameyê de hevokeke dîrokî hebûye ku cîbicîkirina jinan a ku heta wê rojê hatiye paşguhkirin eşkere kiriye: "Heke mafê jinê hebe ku were daleqandin, divê mafê wê hebe ku li jora diwanê jî cî bide xwe." (Bebel, 1996: 302-303).

Alîyekî din ê gengeşeyên li ser mafê reyavêtin û temsîliyeteke jî li ser pirsên, ka temsîlyeteke çawan, ji alîyê kê ve û temsîlyeta kê, disekine. Ji ber ku demokrasî her tim di navbera çîn, netewe û nijadan de wekî tercîh tê derpêşkirin ev yek dike ku demokrasî bi xwe jî bibe têgiheke bi pirs û gelemşe. Tew gava pênasekirin û bisînorkirina demokrasîyê ku ji alîyê zimanê nêrane ve tê kirin, tev li vê gelemşeyê dibe, pirsê kîjan demokrasî tê hişê mirov.

Kîjan demokrasî? Gelo; demokrasîya temsîlî an demokrasîya beşdarîlêker; demokrasîya burjûwayî an jî demokrasîya radîkal; demokrasîya hewîner an jî demokrasîya geşexwaz; demokrasîya unîter an jî demokrasîya dijber; demokrasîya qels an jî demokrasîya bihêz?

Ji pirsê kîjan demokrasî girîngtir tişt ew e ku; divê jin wekî jin ji alîyê jinan ve were temsîl kirin. Demokrasîya temsîlî, ew temsîlyet e ku kesîdeyên razber -kesên ku bes wek hejmar û îstatîstîk hene- di çarçoveya herêmî û deverî de tên temsîl kirin. Halbûkî awayên çewisandin û bindestbûnê, li ser zayendê, li ser cihêtiya çînî, li ser etnîsîte û nijadê hatiye danîn; û ev awayên çewisandinê ne ew gelemşe ne ku di nav kategorîya hemwelatîyê de were nirxandin. Gava di asta temsîlyetê de were dîtin, daxwazên apolîtîk û bînaverok derdikevin holê. Temsîlyeta jinê jî ji bilî rewşeke sembolîk û ji bilî ku jin bibe kelûpela vîtrînê nabe tu tişt. Her wekî ku Anne Phillips jî tîne zimên, "Versiyonên demokrasîya lîberal, bi wan avanîyên îqtîdarê ku jîyana me dixin bin hikmê xwe re mijûl nabe." (Phillips, 2012: 55)

Temsîl kirinê siyasî ên jinan, heta ku rolên zayenda civakî hebe, tu carî dê nikaribe bigihîje rasteqînî û hebûnîya xwe. Mafên wekî reyavêtinê, hatina

hilibijartinê, sîstemên kotayan ku ji alî îqtîdarên nêrane ve wek lêbexişandin tê dayîn, ji çareserîyê zêdetir pirî caran vediguhere çekên ku xizmetî vî aqilê nêr dike. Ji ber ku gava em di vîtrînê de jinek bibînin wate jê ne ew e ku ên ku tînsînkirin jin in. Margaret Thatcher, Tansu Çiller, Sabiha Gökçen, Halide Edip Adıvar û jinên ku wek wan di jîyanê de cî girtine, gelo jina ku wek zayenda duyem e temsîl dikin yan jî serdestîya nêrane a milîtarîst temsîl dikirin. Donovan di vê derbarê de wiha dibêje:

...temsîlyeta jinana li ser zayenda civakî tê danîn, divê wek demajoyeke berdemî û veguherîner were fikirandin. Temsîla jinan a li ser zayenda civakî tê danîn, çendî ku bi vî rengî were fikirandin ew çend dikare dûrahîya ku di navbera temsîlyeta jinan a siyasî û rizgarîya wan de heye, kêmtir bike. Wate ji vê çi ye? Ev tê wateya tîkoşînê ku; dê ji bo pûçkirina serdestîya nêrane, dê ji bo polîtîka û programên femînîst ku dixwaze zayenda civakî ji navê rake, bigihîje parlamentoyan. (Donovan, 2015: 333)

1.2. Serpêç, Dîn, Gotara Fitratê, Oryantalîzm

Leyla Ahmed ku mêtîngerên sed sal berê û tevgera Îslamî dinirxîne, wiha dibêje, “Ji bo tu alîyekî serdestîya mêran wekî gelemşexuya nedikir.” (Smith, 2012: 151)

Ji ber ku gelemşexuya esasî rolên zayenda civakî û mekanîzmayên îqtîdara nêrane ye, kodên ku bûne sedema ku jin wekî zayenda duyem were hesibandin, çi xuya çi jî ne xuya, di hemû îdeolojî û bîrûbawerîyên dînî de hebûna xwe didomîne. Cîyê jinan a di civakên misilman de hem ji alîyê femînîstan hem ji alîyê sosyologan hem jî ji alîyê alimên dînê Îslamê ve tim û tim hatiye gengeşekirin. Bingeha esasî a van gengeşeyan ev e; sergirtin û xwenixumandina jinan, asêhiştina jinan a li malê, pergala zewaca pirjinî, cihêbûna jin û mêran ku bi îradeya mêran û pir bi hêsanî pêk tê, meseleya mîrateyê. Heman gengeşe ji bo ramana Xiristîyan a Katolîk û Cihûtîyê jî tê kirin. Bi taybetî, di gengeşeyên ku li ser Îslamîyetê tînsînkirin de, du perspektîvên esasî hene. A yekem, tê parastin ku Îslamîyet di destpêkê de mesajên wekhevîparêz daye. A duyem jî, Îslam di bingeha xwe de bavkanîparêzîyê dihewîne û li dijî mafên jinan e. Di lîteratura Îslamî de wek Heyama Cahîlîye tê pênasekirin, gava mirov hem ji alî averêbûn û teredîbûna civakê û hem jî ji alî bîrûmetkirina jinan ve wê çaxê dide ber çavan, wek tezekê tê parastin ku Îslamîyet di destpêkê de wekhevîparêz e. Mustafa Öztürk dide zanîn ku, “Naveroka wateyî a peyva cahîlîyeyê a di jêrhişê

hevpar a misilmanan de, bi tamamî neyînî ye... Di ayeta Ahzâb 33/33 de, Hz. Pêxember, ji jinên xwe re bi vê wateyê tevcîh dike, ‘wek jinên heyama cahîliyeyê xwe lê bernedin’... ” (Öztürk, 2016: 11)

Tê parastin ku di heyamên pêşî ê Îslamê, di Mescîdê Nebevî de, jin û mêran di nav hev de nimêj kirine û di navbera wan de jî tu perdeyek tunebû, lê belê piştî mizgeft bûn mekanên bo serdestîya mêran. Kesên ku dibêjin, Îslam bavkanîparêz e û li dijî mafên jinan e, xwe dispêrin feraseta hiqûqa Îslamî ku destûrê dide mêr ku pir jinan bîne û bibe xwedî carîyeyan û pê re jî gotara fitratê û a dawî gotara ‘jin zevîyên we ne...’ Digel ku li Rojavayê li ser têkilîyên zayendî ên civakî xebat û lêkolînên dîrokî û sosyolojîk hatibin kirin jî, sedema ku di civakên misilman de ev mesele nayên gengeşekirin û der barê vê meseleyê de têra xwe xebat nayê kirin, gotinên li jor in. Binnaz Toprak di vî warî de wiha dibêje, “Di esas û rastîya xwe de, di Îslamîyetê de, bawerîya ku jin xwedî meylekê ne û dikarin aqilane bifikirin ew çend qels e ku Qur’an şahidîya du jinan beramberî şahidîya mêrekî qebûl dike.” (Kandiyoti, 2015: 72).

Yek ji rexneyên ku li ser feraseta Îslamîyetê a der barê jinan detê kirin jî, awayê şayeskirina cînetê ye. Mûmînên mêr ku wek Ashab-î Yemîn tên binavkirin, dê bi horîyên ku xwedî delalîyên bêqisûr in û heta hetayê keçxama ne, bî xelatkirin. Fetna Ayt Sabbah dibêje, “... cînet, bes ji bo ku mêran bextwar bike tê sazkirin. Wekî din jî, hebûna horîyê ku dê heta hetayê ciwan û delal bimîne, hebûna jinên li ser rûyê erdê deroder û heramoyî dike.” (Sabbah, 1995: 125)

Di civak û dînen berî Îslamîyetê jî pênaseya jinan anegorî rolên zayenda civakî hatiye kirin. Di şaristanîya Asûrî a li Mezopotamyayê de, mafê mêrekî hebû ku wekî cezadayîne porê jina xwe verû, guhên wê bikişîne an jî parçeyek ji guhên wê jê ke. Di serdema navîn de Dêra Katolîk, di çarçoveya hiqûqa dêrê de maf dida mêran ku li jinên xwe bide. Dihat dupatkirin ku mêr dikare bi şivekê bi qasî stûrîya ‘tilîya beranî’ li jinên xwe bide û vê yekê jî palder û bingeheq qanûnî a şîdeta mêran zexm dikir. Sharon Smith balê dibe serê û dibêje, “Îslamê, agahî û zanînen berîya xwe danî ser hîmeke nû.” (Smith, 2012: 135)

Dibe ku gengeşeyên ku li ser hîma olan û Îslamîyetê tên kirin, bibe sedema xeletîyên dualî û dibe ku hem bi xwe re xetereyek çêke ku gelemşeya maf û azadîya

jinan derkeve derveyî meseleya bavkanîya gerdûnî û hem jî dê rê jê re çêke ku gengeşe ji meseleya xwe a esasî dûr bikeve û bi awirtêdaneke oryantalîst bê nirxandin. Yek ji xeletiyên ku tevgerên femînîst ên li Rojavayê ketine jî ev e; ew Îslamîyetê wekî kana hatina çewisandin û bindestbûna jinan dibînin. Wate ji vê ew e ku; Îslamîyet ji derveyî bavkanîya gerdûnî tê fikirandin ku ev jî xeletîyeke dîrokî bi xwe re çêdike. Wekî din jî, gava mirov bes Îslamîyetê wekî sedema bindestbûna jinan a di civakên misilman deheyî bibîne, ew ê bibe sedem ku mijara esasî ji mesîla xwe averê bibe bike ku perspektîfên şaş bînin avakirin. Ji sala 1960î heta roja îro, misilman bûne hedefa sûcên nefretî ên li Fransayê. Qedexetîya serpêçê ku li Fransayê hatiye qebûl kirin, durûtîyeke nijadperest di xwe de dihevine. Ji ber ku kampanyayên ku di ser hîzar û serpêça jinên misilman re tên meşandin, hem bi tevahî jina ku aîdî çandekê ye kêma dixê û hem jî nihêrîneke nijadperest e. Serê xwe digire an jî nagire, misilman an jî xiristîyan, cengene an jî roman, xwende an jî nexwende, xebatkar an jî ne xebatkar, pêkanînen mêtin û bindestkirina jinan gerdûnî ye.

Awirekî feminîst ê oryantalîst ê bi ruhê Rojavayî ku diparêze û dibêje ku serpêça jinan sedema çewisandina jinan e; lê belê ev nêrîn û awir, qetlîam û tecawiza ku Artêşên Xaçperestan di gava êrîşkirina Rojhilata Navîn de pêk anîne, *seyda cezûyan* ku di serdema navîn de li Ewropayê pêk hatiye, bikaranîna qorseyê a di heyama Victoryayê de, kincên ku di dinyaya modern a îroyîn de azadîya jinan asteng dike -wek, cil û bergê taximî û ûtfikirî, solên panîbilind, dawên kin- paşguh dike ku ev yek ji awirekî durû ê oryantalîst pêvtir ne tu tişt e. Tiştê esasî ku divê were gengeşekirin ev e: jin, li ku derê dinyayê dibin bila bibin, divê ji derveyî îqtîdaranêrane û biryar û îradeya hikûmetan, bi çî awayî ji dil û mêjî û îradeya wan têbi wî awayî kincan li xwe kin. Mafê jinan a kinclixwekirinê a bi dil û daxwaza xwe, divê nekeve nav xefîka kirasmodernîst a sexte ku xwedî zimanekî nêrane ye. Ji ber ku mafê ku wekî *azadîya xwetazîkirinê* tê binavkirin, di civakeke zayendperest û xwedî serdestîya mêrane de ku tê de rolên zayenda civakî neguherîye, dîsan xizmetî mêran dike. Her wekî ku Sharon Smith dibêje, “Di hemû civakên li dinyayê de, *xwetazîkirin* bes dê rê lê veke kutîştekirina zayendî zêdetir bibe.” (h.b. 128)

Heta ku gelemşeya bavkanîya gerdûnî neyê çareserkirin dê gelemşeya jinan neyê çareserkirin û peyta herî girîng a vê yekê rasteqînîya Afxanistan e. Sharon Smith bi me dide zanîn ku, “Her wekî yek ji endama Yekîtîya Şoreşger ên Jinên

Afxan (RAWA) Mariam Rawi dibêje, YDAYê rejîmeke radîkal a dînî a dijmina jinan bi rejîmeke radîkal a ditir ku dijmina jinan e, guherandiye. (h.b. 118)

1.3. Modernîzm, Pozîtîvîzm, Psîkanalîzm

Bavkanîya ku bûye sedem ku jin mafên xwe winda bikin, kontrola mêran a li ser keda û zayokîya jinan û qanûnên ku ji bo vê mekanîzmaya kontrolkirinê çêkirine, dike ku ev gelemşeya hanê hin caran di demajoya feodal de asê bimîne. Her wekî ku me li jor jî dupat lê kir, zayenda civakî gelemşeyeke wisan e ku mohra xwe li hemû serdeman xistiye. Di demajoya derbasbûna ji qonaxa olên xwedawendî bo yekxwedayî de, mixabin ku mafwindakirina ku li jinan qewimîye di demajoya modernîzmê de jî domîyaye. Her wekî Deniz Kandiyoti jî balê dibe serê:

Di sala 1975an de, Neteweyên Yekbûyî, yekem Konferansa Jinan a Navneteweyî li Meksîkayê li dar xist; yek ji îdayên herî girîng a ku di vê konferansê de hat kirin ev bû: modernbûnê encamên ku dihat hêvîkirin nedan, berevajîya wê, dûrahî û mesafeya di navbera zayendan de heyî kûrtir kir û tew bi ser de jî, di demajoya modernbûnê de, jin ji hin kanên hêz û mêzgirîya mafên ku ji mêj ve xwedî wan bûn jî, bêpar man. (Kandiyoti, 2015: 9)

Hemû gelemşeyên civakî ên bi azadîya jinan ve têkildar, ên wekî; jihevçihêtiya qada giştî û qada taybet, keda di nava malê de tê dayîn, jihevçihêkirina tişte û kirdeyê, mafê reyavêtinê, temsîliyet, mafê kurtajê, zagonên der barê tecawizê de, şîdet û şîdeta di nava malê de, fuhûş, pornografî, gotara nêrane, di heyama modernîzmê de jî bi hemû gurahî û sofînerîya xwe ve li jinan qewimîye û tew mirov dikare bêje ku gihîştîye asteke kronîk. Wekî encama vê demajoyê, çewisandin û bindestkirina jinan hê xurttir û bi profesyonelî hatiye pêkanîn.

Dewletên neteweyî, gava qanûnên xwe bi hişekî nêrane û mîlîtarîst danîne; zimanê nêrane ê gerdûnî wek mîrate hildane û anegorî serdema ku tê de ne bi rêk û pêk kirine. Di welatên herî modern (!) de jî, sedema ku doz û dewayên tecawizê di bin sîya ‘sedema pîjîkirinê’ de tînin ew e ku hişmendîya bavkanîyê wek mîrate hatiye girtin. Jin ew kes e ku dikare ji bo dewletên neteweyî ên mîlîtarîst zarokan bîne, wan mezin bike da ku ji bo welêt û ji bo vê sîstemê bimirin. Jin ew kes e ku ji bo ku bibe dayikeke çêtir û ji bo ku bibe layiqî mêrê xwe tê perwerdekirin. Jin ew kes e ku ji ber ku ji mala xwe derketiye der, dûçarî şîdet û tacîza devkî û derbî dimîne. Jin ew tişte ye ku panoyên reklamê ên tîr şewq ên dinyaya modern

dixemilîne. Modernîzmê metayîbûna jinan zexmtir kiriye, bi taybetî bi rêya amrazên ragihandinê û televîzyonan, jin ji bo mêtin û çewisandinê qelstir û bêparastin hiştine. Ji ber ku modernîzm û pozîtîvîzm, awayê aqilşixulandina xwe li ser aqilê mêr danîye ku ev awa aqilşixulandin xwe dispêre bavkanîya gerdûnî. Heyama serdema navîn a Skolastîk, dîyarîyeke xurt pêşkêşî îqtîdarên nêrane ên modern kiriye. Ev dîyarî ew e ku; hema bêje, civak ji jinan hatiye şuştin û xalîkirin û afirînerî û bixwebawerîya jinan hatiye tune kirin. Bi *seyda cezûyan* jinên hekîm ên pakker, jinên afirîner ên xwedî huner, jinên ku di civakê de wek rêber tên dîtin, jinên ku xwedî mal û milk in, bi qetlîameke mezin hatine tune kirin. Di nîveka duyem a sedsala pazdehemîn de, ji alî du keşîşan ve pirtûkeke bi navê *Malleus Maleficarum* ku ji sê beşan pêk tê, hatiye nivîsîn; û bi belavbûna vê pirtûkê re jî *seyda cezûyan* dest pê kiriye û gihîştîye asteke hişnegir. Qurbanên ji sê paran du par ên van *seyda cezûyan* jin in. Pareke mezin ji qurbanên vê *seydê* jî ji mêrên nêz û xizmên wan jinan bûn. Dêran dest datanî ser mal û milkên jin û mêrên ku dihatin kuştin û her wiha feyde û berjewendîyeke dualî dihat bidestxistin. Heyama modernîzmê, li ser vê mîrateya serdestîya nêrane hatiye danîn û bi qanûnên xwe ên nû ên nêrane û estetîzekirî xwe heyî kiriye. Fatmagül Berktaş dupat lê dike û dibêje, “Bi ser de jî, teorîsyenên modernbûnê, piştgirîyeke xurt a îdeolojîk didin ramana têkildarkirina jinan a bi alîyê hestiyar ê jîyanê re, lê ev yek ne ji bo pêşxistina wekhevîya di navbera zayendan de heyî, lê ji bo berdewamîya cihêrengbûna qadên jinan û mêran dibe destek.” (Berktaş, 2015: 153).

Wekî felsefe, hiqûq, dîrok û hunera beralîkirî, psîkolojî û psîkanalîz jî bi gotara nêrane hatiye saz kirin û di rêgeha aqilê nêrane de hatiye avakirin. Teorîya psîkanalîzmê, ‘zayenda civakî’ wekî rasteqînîyeke ku dê tu car neguhere, cî bi cî kiriye û bi pênaseyeke wekî faktorên derdorî bi sînor kiriye. Hin dezavantajên arizî çandê û bandorên van dezavantajan ên li ser kesîdeyan bi awayekî zelal nehatiye pênasekirin û aşkerakirin. Li dewsa ku ji bo pirsê ka zanava mêr a serdest bi çi awayî ava bûye li bersivan bigere; kesekî wekî Freud jî ku di qada xwe de pispor e, pênaseya xwe di ser *kêmbûna jinê* re kiriye. Teorîsyenên femînîstên wekî Betty Friedan, Kate Millett, Juliet Mitchell, Nancy Chodorow, xeta psîkolojîk a civakî a tevgera jinan bi pêş xistine. Betty Friedan, dide zanîn ku ji ber ku jin hêvî ji psîkoterapîyê dike dibe qurbana amrazên çewisandinê ên civaka nêrane a serdest. Juliet Mitchel balê dikişîne ser û dibêje, ji bo ku zagonên jêrhişê bê famkirin divê

pêşî karkirina îdeolojîyan bê famkirin; û gotinên me bi zayendîya çandî tèn diyarkirin. Nancy Chodorow, dibêje, rola dayikîyê tê veguhastin, zarokên lawîn ji bo ku bervekirî bibedi temenekî zûtir de hînî civaka derve tê kirin, lê belê zarokên keçîn, li malê û di bin baskên dayikan de tèn hiştin û bi kodên rola dayikîyê tèn perwerdekirin. Nancy Chodorow pê de diçe û wekî çareserî jî pêşnîyaza *dêbavtîya hevpar* dike. Lacan jî, derbasbûna ji qonaxa pre-odîpal a bo qonaxa odîpal wekî qonaxa windabûnê dinirxîne û diyar dike ku zarok hem hestê tevdehîya xwe û hem jî hestê tevdehîya xwe a bi dayika xwe re heyî winda dike. Lacan ku vê derbasbûnê wekî hepsbûna di ziman de dinirxîne, pê de diçe û dibêje, zimanê ku di heyama odîpal de çêdibe zimanê bav e û her wiha kod û qanûnên bav (mêr) tèn hînkirin. Rolên zayendî a jinan, zanava jinan û jinanîya jinan di nava vê gotinê de çêdibe.

Kesa ku bi taybetî li hember Freud gotinên rexneyî ên herî hişk kiriye, Ketty Millet e. Millet, çewisandina jinan, zayenda civakî û serdestîya nêrane û hemû gelemşeyên bi vê ve girêdayî, bi têgiha *polîtîkaya zayendîfêfade* dike û diparêze ku ev mekanîzmayên çewisandinê helwesteke polîtîk e. Millet di berhema xwe a bi navê *Polîtîkaya Zayendî* de, bi taybetî rexneyên xurt li teorîya Psîkanalîzmê a Freud dike; û dibêje peyta Freud a *hewespêkirina bo penîsê* jinê wekî mêrekî kêmmayî pênase dike û aşkera aşkera dijminatîya jinan dike. Ketty Millet, li hember peyta Freud ku dibêje, jiyana jinan a ruhî li ser du hestên wekî dexesî û dilavêtinê diyar dibe, pir bi xurtî û hişkî disekine. Her wiha Millet dibêje:

Ji ber ku şîroveya Freudyen a kesayeta jinan xwe dispêre hewespêkirina bo penîsê, divêfîya raveyeke bi kitekî û bi piranî jî hewcetîya ku dubarekirinê mecbûr dike, bi xwe re çêdike. Pênaseya jinan ku bi teorîya hewespêkirina bo penîsê dest pê kiriye, neyînî ye; yanê tê gotin ku, ji ber ku jin ne mêr e û ji penîsê bêpar maye, gihîştîye rewşa xwe ya roja îroyîn. (Millet, 2011: 290-291)

Ev nirxandinên teorîsyenên femînîst, dupat lê dike ku armanca psîkoterapîyê a wek *hevahengî* hatiye pênasekirin, ne ku ji jinan fam dike, berevajîya vê, jinan di nav qalibên jîyana ku sînorên dîyarkirî de asê dihêle, difetisîne û dike wek tiştetekê. Ku em di ronahîya wan agahîyan de epîstemolojîyên ku hatine hilberandin binirxînin em ê bibînin ku di warê zanyarîyê de jî desthilatdarîyeke nêrane heye. Berktay dupat lê dike û dibêje.

Digel ku felsefeya kevneşopî ji alîyekî ve idîa dike ku gerdûnî û hewînkere jî, lê belê vê felsefeyê jin nehewandine, pax jî bi wan nekirine, nedaye ber pirsyaran ka pirsên wan ên cuda hene an na, an jî qet nedaye ber çavan ka gelo bi awayekî cuda li gelemşeyan dinêrin an na. Kirdeya felsefeya Rojavayê mêr e. Bi ser de jî, ev mêr; mêrê ewrûpayî, spî û burjûva ye. (Berktaş, 2012: 156-157)

1.4. Dîroka Femînîzmê û Cureyên Wê

Tevgerên femînîst, ji hêla dîrokî ve wek sê heyeman tên dabeşkirin. Beşa yekem Berîya Şerê cîhanê yê yekem dest pê kiriye û wek femînîstên “*pêla yekem*” tên pênasekirin. Bi gotineke gelemperî, jin têkoşiyane da ku di qada giştî de bi mêran re bibin xwedî heman mafan. Di warê pewerdehiyê de wekhevîya fersendan, azadiya jinê, mafê hîlbijartin û hatina hîlbijartinê, parastina mafên xwedaniyê, di vê heyamê de xwestekên ku derketine pêş in. Pêla yekem ji ber ku wek qadên giştî û qadên taybet, li ser meseleyên di sedemên bîndesxistina jinê de serê xwe zêde neêşandine, wek “lîberal” hatine pênasekirin û rexnekirin. Li gorî femînîstên pêla duyem, pîrsgirêka esasî “bavkanî/patrîarka” bi xwe ye. Lê belê, pêla yekem, ne li dijî vê îdeolojiyê sekinîye ne jî rexne lê kiriye û berevajîya wê; xwestina mafên jinan a ji mêran, meşrûkirina bavkanîyê ye. “Teorîya sîyasî a lîberal, li hember serdestîya qada giştî a li ser qada taybetî û serdestîya mêr a li ser jinê heyî, ew çend paşçav dike ku di encamê de dibe pesendkera vê rewşê.” (Donovan, 2015: 71)

Çendî ku bîdestxisina mafê hîlbijartin û hatina hîlbijartinê bi dehan salan domîyaye jî dîsa jî wek serkeftina pêla yekem tê qebûlkirin.

Beşa duyem wek “*pêla duyem*” tê pênasekirin û piştî sala 1968an dest pê kiriye. Digel ku di nav xwe de wek bizavên cuda kert bûne jî, gotara ‘bîndestbûna jinê ya hevpar’ çarçoveyeke giştî û tevdeyî ava kiriye. Pardeya hevpar ew e ku li ser dinê hemû jin ji alîyê mêran ve hatine çewisandin û divê li hemberî vê serdestîya mêrane bê sekinandin. Ji ber vê ye ku pêla duyem zêdetir li ser mafên zayendî serê xwe êşandine û pîrsgirêkên jinan wek gerdûnî şîrove kirine û têgiha “xwişkîtiya gerdûnî” li lîteretura femînîzmê zêde kirine. (Ramazanoğlu, 1998: 31-32). Tevgera femînîzmê a duyem, di nîveka duyem a sedsala 20î de dest pê kiriye û wek du şaxên hîmî pêş ve çûye. Femînîzma Çandî, cudatîyan wek zengînî dibîne û dupatîyê li wekhevîyê dike. Femînîzma Radîkal, hem li ser cudatîya mêr û jinê hem jî li ser

cudatîyên wek nijad, etnîsîte, çîn û çandê sekînîne. Femînîzma Çandî, ji guherînên sîyasî zêdetir li ser veguherînên çandî sekîniye. Ol, malbat û zewac wek sazî nirxandine û dupatî li “daykanî/ maderşahî” kirine. “Aştîperezî, tevkarî, digelhevîya cihêtiyan a bêtundî û bipergalkirina hevaheng a jîyana giştî jî di nava van de ye.” (Donovan, 2015: 74)

Nanakirinên femînîstên pêla duyem; li hember derpêşkirina wek tiştêbûna jinê, zagonên mêrane ku cezayên zorgayîne bi hêmanê azirandinê ve siviktir dikin, keda ku di malê de tê dayîn ku bêbergind e û wek ked nayê hesibandin, pêk hatiye. Di salên 60î û 70yî de, mafê kurtajê ji bo femînîstan gelemşeya herî girîng bû, ji ber ku qedexeyên li ber kurtajê heyî, dibû sedem ku jin bi awayekî îlegal xwe ji ducanîtiyê xelas bikin. Pê re jî bi hezaran jin yan dimirîyan yan jî xisarên giran didîtin. “Li gorî daneyên Rexistina Nojdarî a Dinyayê, bi gelemperî li dinê her sal 78 hezar jin, ji ber kurtajên ne ewle tên kirin, dimirin.” (Smith, 2011; 65)

Her berê jî ku me li jorê jî behs kiribû, di 22yê Rêbendana 1973yan de, li Emerîkayê, Dadgeha Emerîkayê a Bilind, doza ku wek Roy v. Wade tê zanîn, encameke dîrokî dide. Li gorî biryara dadgehê “kurtaj” mafek e û mijareke veşarî a di navbera bijîşk û dayikê de ye. Ev qewimîn ji bo jinên femînîst ku bo mafê kurtajê têkoşiyane wek serkeftineke mezin tê qebûl kirin.

Teorîsyenên pêla duyem a tevgera femînîstî, gotina Sîmone De Beauvoir, “Mirov wek jin nayê dinyayê, mirov piştê dibe jin.” û dirûşma “Tiştê kesîdeyî polîtîk e.” ji xwe re wek him dîyar kirine. (Holmstrom, 2012: 90,91) Ji ber ku wê xwe bi wan mottosan îfade kirine, herî zêde li ser ‘zayend’ û ‘zayenda civakî/gender’ sekîniye û sedema bêzanavkirina jinê jî bi rolên zayenda civakî ve girêdane. Jin bi normên mêrane, bi normên ku hatine sazîyî kirin û bi dînamîkên kontrolkirinê hatine berasteng kirin. Tiştêbûna jinê jî digel van kodan di nav hezaran salan de hatiye vehandin. Wekî ku Judith Butler dîyar dike, jin, ‘nekirdeyek’; û pê ve diçe û dibêje:

Zayenda mê di heman demê de 'nekirdeyek' e (kirdeyêke hem heye hem tune ye). Di nav ekonomîya şanîdanê de ku çembera dorgirtî a heyîna ku nîşan dide û a heyîna ku tê nîşandan, ji alî biwara (qada) nêr ve tê avakirin, ne mimkun e ku têkilîya di navbera nêr û mê de heyî were nimandin (temsîl kirin) (Butler, 2014: 57)

Li gorî wan, rolên zayendî ên civakî, bi destê mêran û bi hişmendîya nêrane hatiye saz kirin û divê di netiştêbûna jinê de ku bi van kodan hatiye afirandin, bê

guhertin. Wan, “berzkirina hişmendîyê” wek rê û rêbaz hilbijartîye. Ne fikrên kesîdeyî û kirdewar, hişmendîya jina ku heyîneke pevrayî û civakî ye, ji bo wan bingeh e. (MacKinnon, 2015: 106).

Femînîstên pêla duyem, pênasekirina qadên polîtîk; ji bo keda ku di malê de tê dayîn mafê heqdestê; keda hevpar a di mezinkirin û xwedîkirina zarokan de; wekhevîya heqdestê; maf û kontrolkirina zêdebûnê a bo laşên xwe û pêdivîyên jinan ên zayendî, wek gelemşeyên bingehîn nirxandine û wan; qebûlkirina mafên wekhevîyê, wek “polîtîkaya zayendî” pênase kiriye. Digel wan geşedanan; li ser pasîvîya jinê a zayendî, li ser frijîtîya jinê, li ser nevrozên jinan, li ser hin teorîyên psîkolojîyê ên ku dayikan tawanbar dikin, li ser hin cureyên laşên jinan ku wek gerdûnî tên hesibandin (ziravbûn, qelewbûn, bejna dirêj, porê dirêj û hwd.), li ser pêşkeşkirina laşan û li ser xemilandina laşan gengeşîyên xurt pêk anîne û dîyar kirine ku ev bi tevahî awir û riwangeyên mêrane û îdeolojîyên serdest ên nêrane ne. (Holmstrom, 2012: 90,91)

Beşa sêyem wek “*pêla sêyem*” tê pênasekirin û di dawîya salên 1980yî û di salên 1990î de dest pê kiriye û heta roja îroyîn dewam kiriye. Her çî qas di hin mijaran de li pey şopa pêla duyem çûne jî, rexneyên tûj jî li wan kirine. Yek ji sedema ku tevgera jinan a pêla sêyem rexne li tevgera Femînîst a pêla duyem dike, ev e; jinên çermespî ên femînîst ên pêla duyem ku ji çîna navîn in, bi piranî wisan dane der ku ew femînîzmê di navîna cihêtiya zayendan de bi cî dikin û wek esas qebûl dikin; û digel vê yekê jî, wan çavên li cihêtiya çînî û li cihekarîya nijadî girtine. (Walters, 2009: 162)

Di vê çarçoveyê de, tevgera pêla sêyem, giringî daye cihêkarîya nijadî, cihêtiya çînî û tercihên zayendî ên cuda. Ji ber ku zordestîya ku li ser jinê pêk hatiye, ne bi yekcureyî nirxandine. Li gorî wan, riwangeyên ku bi hişmendîya oryantalist ya Rojavayî li dar bûne, pirsgerêkên jinên ne çermespî, gey û lezbîyanan, jinên ku li cîyên lê şer hene dijîn, jinên ku bi têkiliyên navneteweyî tên firotin û hwd. paşguh kirine. Li dewsa hevdirûvîyan li ser cîyawazîyan û zanavan; li şûna tiştê gerdûnî li ser a deverî sekinîne. Wek mînak jinên misilman ên ku li Fransayê dijîn, bi qedexeyên sergirtinê ve hatine astengkirin. (Smith, 2011; 115,116). Ji ber ku li dijî femînîzma ku Ewrûpa li xwe dike navend sekinîne, wek Femînîzma Postkolonyal jî tên

pênasekirin. Femînîzma Postkolonyal ku di nava teorîyên dekonstruktîf de cî girtîye, di vê wateyê de, ravekirinên rûxînerji bopardeya “ezmûnerîya hevpar” a ku femînîstên Rojavayî ji mêj ve wê bi lêv dikin, kirine. (Waller û Marcos, 2006: 313)

Di nav tevgerên femînîst de, der barê pênaseya bindestxistina jinê de û stratejîyên ku dê bên bikaranîn, sê bizavên esasî hene: Femînîzma Lîberal, Sosyalîst û Radîkal. Ji xeynî van bizavên esasî, hin cureyên femînîzmê jî ev in: Femînîzma Marksîst, Femînîzma Çandî, Femînîzma Çandî a Nûjen, Femînîstên Fransî ên Nû, Femînîzma Daringparêz, Femînîzma Lezbîyenî, Femînîzma Heyînparêzî û Ekofemînîzm.

1.4.1 Femînîzma Lîberal

Femînîzma lîberal wek dîrokî, berî nêzîktêdanên femînîst ên dîtir tê. Ji ber vê jî ji alî tevgerên femînîstî, ên ku li dû wê hatine, hatiye şopandin. Ew, ji têkilîyên civakî, ji rolên jin û mêran, ji zayend û zayenda civakî wêdetir, li ser hin mafan sekinîne û bo berdestkirina hin derfetan tevgerîyane. Li gorî wan, sedema bindestbûna jinê ji nezantîya jinê pêk tê, ji ber vê jî girîngî didin mafê perwerdedîtîne. Ji ber ku jin in hatine dîkekirin û ji qadên giştî zirpar mane. Wan çareserkirina hin mafên civakî û bindestxistina jinê, bi perwerdehîyê ve girê dane. Pê re jî di çarçoveya mijarên wek; wekhevîya destheq, wekhevîya mafên mirovan, wekhevîya derfetan a di warê perwerdehî û tendurîstîyê de û di warê beşdarbûna wekhev a demajoya sîyasî a demokratîk de, li dor kampanyayên ku hatine meşandin, birêxistî bûne. (Ramazanoğlu, 1998: 29)

1.4.2. Femînîzma Sosyalîst

Femînîstên Sosyalîst, di dawîya salên 1960î de li hember Femînîzma Marksîst derketine holê. Rexneya ku Femînîstên radîkal li Femînîstên Marksîst kirine ji wan re bûye kan. Ji ber ku Femînîstên Marksîst gelemşeya bindestbûna jinê di bin banê gelemşeya çînî de nirxandine, Femînîstên Radîkal rexneyên tund li wan kirine. Li gorî femînîstên radîkal; divê bindestbûnkirina jinê di bin banê gelemşeya patriarkayê de bê nirxandin. “Femînîzma Sosyalîst, li ser wê ramanê ye ku; Femînîzma Marksîst têr nake raveya keda jinê a bêheqdest e û bavkanîya ku hem li

malê hem jî li kargehê çewisandin û zordestîyê li jinê dike, aşkera û zelal bike”. (Özsöz, 2008: 53). Hemîn ku jin jî di nav têkilîyên hilberînê de cî digire, divê mafên wê jî bê pênasekirin û di taldeyê mêr de neyê nirxandin. Ji ber vê divê keda ku di malê de tê dayîn wek kar bê qebûlîkirin û destheqê vê kedê jî bê hesibandin. Tevî ku Marksîstan bal birine ser têkilîyên çînî jî di nav van têkilîyan de girîngî nedane “bavkanîyê/patrîarkayê.” Angaştî Femînîstên Sosyalîst a herî girîng ew e ku, di navbera kapîtalîzm û bavkanîyê de têkilîyeke organîk heye û hev temam dîkin. Stone dibêje ku:

Hin femînîstên sosyalîst (wekî mînak, Hartman, 1979) piştî van analizên dîrokî, li ser wê fikrê man ku bavkanî (patrîarka) û kapîtalîzm du pergalên cihê ên civakî ne ku ketine nava hev. Herçî ên dî ne, (wekî mînak, Young, 1981) fikreke dîtir parast û got, kapîtalîzm pergaleke yekgirtî ye ku di nava wê de hêmanên bavkanîyê tên avakirin. (Stone, 2015: 29)

1.4.3. Femînîzma Radîkal

Femînîzma radîkal, dawîya salên 1960î û di destpêka salên 1970yî de li NewYork û li Bostonê, ji alî jinên ku di hin kampanyayên bo mafên şarevanî û li hember şeran cî girtine, hatiye destpêkirin. Hin gelemşeyên wek: tiştê kesîdeyî polîtîk e; bavkanî û serdestîya nêrane a ku bindestxistina jinê di binyata xwe de dihevine; li hember serdestîya mêran rêxistinbûna jinan a hevpar û jinavbirina malbatê, di nava femînîstên radîkal de hatiye gengeşekirin. Di nav daxuyanîyên femînîstên radîkal de berhemeke girîng jî Manîfestoya Redstocking e. Di manîfestoyê de serdestîya mêrane wek serdestîyeke gerdûnî hatiye nirxandin.

Jin ji çîneke bindest in. Zorkirina li me hemû totalîter e, bandora xwe li hemû alîyên jîyana me dike... Em mêran wekî kiryarên vê zorlêkirinê pênase dîkin. Serdestîya mêran, awayekî zordarîyê ê herî kevn e... hemû awayên dîtir ên zordestî û çewisandinê... dûvelankên serdestîya mêran in... mêr hemû sazîyên polîtîk, ekonomîk û çandî kirine bin kontrola xwe... hemû mêr, ji serdestîya mêran, havilên ekonomîk, zayendî û psîkolojîk bi dest dixin. Hemû mêr jinan dixin bin zor û çewisanên xwe. [(Redstockings in Morgan 1970: 533-4)] (Stone, 2015: 26)

Digel van angaştan, wan hewcetîya zimanekî nû jî parastine. “Peyvên nû, hêmayên sexte û berbiçavbûyî ên civaka bavkanîyê diheriffîn û pê re jî zimanekî ‘jinoformîk’ saz dîkin ku hewl dide hayjêbûn û hestekî nû ê ku dê rasteqînîya mê

biafirîne.” (Donovan, 2015: 288). Pornografî, firotina jinê, zorgayîn û şîdeta zayendî, mafên jinên çermreş, mafên lezbîyen û geyan jî, hin gelemşeyên dîtir in.

1.4.4. Femînîzma Çandî

Li dewsa guherîna siyasî, veguherîneke berfireh a çandî diparêzin. Rexneyên xwe li sazîyên wekî ol, malbat û zewacê dikin. Xeta wan a esasî, heyama hiqûqa dayiktîyê ye. Ji ber vê yekê jî, xwedî awirtêdaneke dayikanî ne. Endam û ramanwerên vê cure femînîzmê dixwazin bi nirx û bandorên mêyane, civakeke ji jinên hêzdar pêkhatî ava bikin. Teza wan a esasî li ser van xîman ava bûye; aştihezî, hevkarî, bihevrebûna cihêrengîyan a bêşîdet, birêkûpêkkirina jiyana giştî. Yek ji mijarên ku ew li ser disekinin jî bandora şeran a li ser jinan e. Ew bawer dikin ku îdeolojîya nêrane a rûxîner dikare bi hêza jinan were guherandin. Ji ber ku ew bawer dikin ku nirxên mirovane bi jinan re heye. Femînîstên çandî bawer dikin ku di xwezaya jinan de alîyekî aştihez û nûxwaz heye. Josephine Donovan dide zanîn ku:

Femînîstên çandî ên hemdem, xwedî ramanekê ne ku sistema siyasî a nirxan a jinan dikare ji çanda kevneşopî a jinan were dariştin û ji vê qonaxê jî dikare belavî qada giştî be. Di heman demê de, femînîstên çandî ên hemdem wisan bawer dikin ku mêt jî dikarin îdeolojîya vê sîstemê bipejirînin. (Donovan, 2015: 129)

2. REXNE Û FEMÎNÎZM

Çalakiyên gur û geş ên tevgerên femînîst ên ku bi dehan salan domandiyê, destkeftiyên ku di nav pergalên serdestîya mêrane de û digel hebûna van pergalan, hatine bidestxistin, roj bi roj kir ku jin û jinbûn xuyanê bin. Destkeftiyên wek mafê reyavêtinê, mafê kurtajê, mafê derketina bo qada giştî, mafê temsîlkirinê bi xwe re gotara jinbûnê jî anî. Hemû etîmolojiyên ku hatine afirandin, di ronahiya rolên zayenda civakî de car din li ser hat sekinandin û zayenda civakî wekî kategoriyeke nixandî bandora xwe li ser hemû qadan hişt. Dîrok, sosyolojî, psikolojî, antropolojî, felsefe û gelek qadên epîstemolojîk, ji bo ku bipeyitîne ka jin çawan hatiye dîkekirin, bi awirekî rexneyî, ji nû ve û bi metodên nîpûnû, di warê analîzên gotinê de hatin nixandin. Wêje jî bû yek ji van qadan. Hin teorîsyenên tevgera femînîst û hin teorîsyenên ku bi awirekî rexneyî nêzikî li mijarê dikin, hin tekstên ku di asta kanonê de ne, ji şûna wan jor a qayîmkirî daxistin û bi perspektîfên wekî zayenda civakî, zimanê nêrane û dîkekirina jinan bi şêweyekî nû xwendin. Hunera femînîst jî di vê çarçoveyê de derketiye holê û pêşve çûye. Van pêvajoyên ku bi neyînkirina hêmayên jinan ên kevneşopî dest pê kiriye, di ser qebûla ku hêmayên afirandî jinê dike wekî tiştayeke ku tê mezaxtin, rexneyên xwe kirine û hilberînên xwe pêk anîne. Jiholêrakirina newekheviya jin û mêran û hêmayên neyînî û tiştaker ên ku li jinan hatiye barkirin û pêşxistina pêjnkariya jinan bûye xal û destpêka esasî a tevgerên femînîst. Bi vê perspektîfê berhemên ku di asta kanonê de ne bi awirekî rexneya femînîst hatine nixandin û di wêje û ciwankariyê de, hilberînên ku pêjnkariya jinan û gotara jinan dihevine, derxistina rastê û xuyanêkirina nivsîkarên jin ên ku di bin siya mêran de maneû geşkirina zimanekî ku aîdî jinan e bûye hîm û çarçoveya wan a esasî. Rexneya femînîst û rexneya femînîst a wêjeyî du qad in ku ji hev xwedî dibin. Tevî ku bi temamî ne wekî hev in jî, bi awayekî teqez jî ji hev naqetin. Maggie Humm, pêwendîya di navbera wan de heyî, bi vî rengî derdibire,

Bi awayekî giştî, gava ku rexneya femînîst berê xwe dide îdeolojî û pêkanînen civakî, rexneya femînîst a wêjeyî bala xwe dide ser û hûr li ser dixebite ka ev îdeolojî û pêkanînen tekstên wêjeyî bi çi awayî bi teşe dikin. Dîsan jî ev her du dîsîplîn wekî kategoriyeke esasî a analîzkirinê hûr li ser zayendê disekin. (Humm, 2002: 11)

Herçî Derrida ye, ku bi femînîstan re di nav hevkarîyeke ramanî de ye, gotinên structuralist (binyatgerî) ên tevdeker li deconstructionê xistiye û zimanekî ku pêşiya femînîstan ronî dike û bi wan re di nav hevkarîyê de kar dike, bi pêş xistiye. Bi vî zimanê rexnegir, hemû ferasetên felsefî ên serdestîya mêrane ên kevneşopî, prensîbên zimanî ên structuralist ên ku wekî logocentrism (navendpeyv) û dichotomy (dijberîyên duberî) tên binavkirin, li deconstructionê xistiye.

Di ser wê qebûlê re ku wêje jî, wekî epîstemolojiyên dîtir, xwedî zanaveke zayenda civakî ye, bi taybetî teorîyên rexneya femînîst a wêjeyî û deconstruction, di nirxandina berhemên ku em ê li ser wan bisekinin, dê bibe perspektîfa me a esasî û em ê pal û piştî xwe bidine wan teorîyan.

2.1. Rexneya Femînîst A Wêjeyî

Heta bi weşandina berhema Virginia Woolf a bi navê “A Room of One” ku wekî berhema yekem a modernîst a tevgera femînîst tê qebûlkirin, tevgera femînîst û teorîsyenên femînîst gelek destkeffî bi dest xistine. Bi van destkeffîyan re jî kuliyateke ‘rexneya femînîst’ a hêjayî gotinê jî pêk hatiye. Yek ji tekstên pêşeng ên femînîzma hemdem, Sexual Politics, ku Kate Millet nivîsiye, bi rexneyên ku li bavkanîyê kiriye, peyitandiye ku; şîdeta ku li hember jinan tê pêkanîn û jin wek çîna duyem û bindest tê qebûlkirin, ne gelemşeyên herêmki û giştî ne, lê belê pêkanînen “polîtîkaya zayendî” a îdeolojiya mêrê serdest e ku bi awayekî hişberî tê pêkanîn. Humm dibêje ku: “Di wêjeyê de, wate ji pirsyarîkirina şayesa jina ku tecawiz lê hatiye kirin, ev e; raza şayesên bavkanîyê tê veçirandin û her wiha, bi rola serdestbûnê ku mêr li ser jinan pêk tînin jî, tirsî tecawizê ji navê tê rakirin.” (Humm, 2002: 19)

Babetên wekî, dorpeçkirina jinan a bi rolên zayenda civakî, pênasekirina jinan a bi zimanê serdest ku kirdewariya jinan jî bi vî zimanî û bi vî awayî tê pûçkirin, şanîdana jinan a bi hin kod û şanîdêrên giştî re û pênasekirina wan a di nav qalibên diyarkirî de, bûne mijarên ku rexneya femînîst girîngî daye wan. Rexnegirên femînîst di raman û rexneyên xwe de parastine ku; zayend bi rêya zimanê sazîkirin û loma jî divê ev zimanê ku di tekstên wêjeyî de heye, bê aşkerakirin û xuyanêkirin; ferhenga zimanî a jin û mêran ji hev cuda ye; kevneşopiya rexneya wêjeyî wek

parçeyekî îdeolojiyên serdestîya nêrane derketiye û bi bikaranîna norm û qalibên nêrane jî bi pêş ketiye. Rexnegirên femînîst ji vê qonaxê û pê de xwedî çar armancên sereke ne.

1) Hûrlêgerîna dîroka wêjeya nêrane û tekstên ku bi zimanê nêrane hatine nivîsîn.

2) Xuyanêkirina nivîskarên jin.

3) Avakirina hişmendîya “xwînerên femînîst”.

4) Bi nivîsar û tevdehiyeye xwendinê re, avakirina zimanekî ku “aîdî jinan e û jinane ye.” Rexneya femînîst, di ser van armancan re, qalib û gotinên zayendparêz ku di tekstên wêjeyî de hene, aşkera kiriye û sedemên civakî ku vê gotinê ava dikin û berhemên wînda ên ku jinan nivîsîne jî derxistiye holê.

Sandra Gilbert û Susan Gubar, di sala 1979an de berhemeke bi navê “The Madwoman in the Attic” û bi dû wê re jî di sala 1988an de berhemeke bi sê cildan a bi navê “No Man’s Land” weşandine û ev berhem di nav kevneşopîya wêjeyê de, ji bo avakirina estetîka femînîst bûne berhemên rêveker.

Maggie Humm, gava van berheman dinirxîne, dibêje, ev berhem, li ser mijarên herî cidî ku rexneya kevneşopî ew dereve kirine, hûr dibe û tê de “...kontrolkirinên maddî û psîkolojîk ku li ser jinan pêk tê; jiyana veşartî a jinan û çanda wê; sînorê nêrîtî û mêyîtiyê, xuyanêbûn, kevanîtî û destbikêrî û fikarên ku bi rêya metaforên wêjeyî ên wekî lixwekirina kincên dijzayendê tînsîmîkirin” hene. (Humm, 2002: 35)

Teorîsyenên femînîst ên wekî Julia Kristeva, Luce Irigaray û Hêlêne Cixous, bi taybetî ji teorîya “deconstructif” a Jacques Derrida bandor girtine û; projeya avakirina zimanê ku mirov dê karibe pê cudatiya zayendan ji navê rake, ji bo rexneya femînîst zemîn û bingeheke teorîk peyde kiriye û her wiha pêşî li xebatên wekî “gotara jinan” û “zimanê jinane” ku armancên sereke ên femînîzmê ne, vekiriye. Kristeva, zimanê pêş-Oidipusê ên jin û zarokan wek “semîyotîk” pênase kiriye û bi angaştaya heyama “sembolîk” bi kodên nêrane hatine avakirin, bi pêş de hatiye.

Rexneya femînîst ku li ser tîkilîya di navbera îdeolojî û çandê de heyî, disekine, sedema ku jin di temsîlên wêjeyî de di rêza duyem de dimîne, wek giştî û

gerdûnî bi “bavkanî, zayenda civakî û gotara nêrane” ve girê daye. Ji vê qonaxê û pê de, ew derketine derveyî feraseta dîroka hînkirî û hînbûyî û bi awir û nêziktêdaneke nû hûr li ser mît û efsaneyan sekinîne. Herçî Virginia Woolf e, kiriye ku mît û efsane di berhemên wê de xuya bikin û Mary Daly jî li xwe kiriye armanc ku bi rexnekirina mît û efsaneyan, pêşdarazên mêran aşkera û deşîfre bike.

Geleşeya “ziman” ku yek ji pardeya hevpar a rexnegirên femînîst e, di ser rexnekirina teorîyên rexneyê ên kevneşopî re hatiye meşandin. Wan di rexneyên xwe de ramanekê dîtir ava kiriye û gotiye; rexneya marksîst jinan bi kirdewariya wan nedaye ber çavan, psîkanalîtîk jinan kêr û bi qisûr pênase dide nasîn, structuralîzm jinan bi hin sembolen xuya û sereke bi sînor dike û di ciyekî de cit û pêdandî dike .

... Ew li hev dikin û dibêjin, ziman mekanîzmayeke navendî ye ku mêr bi wî dinyayê dikin mal û milkê xwe. Û pê re jî dibêjin, navgîna zimanî ku mêr pê jinan dikin bindest û mêtîngeha xwe, qedr û hêjahiya pêjnkari û hestyariyê kêr dixê ku ev jî bi kêrî simbolîzmê tê. (Humm, 2002: 141)

Temsîliyeta jinan a di tekstên wêjeyî de, ku di nav qadên ku bavkanîyê ew dorpêş kiriye de asê bûye û bi kodên nêrane hatiye nîşankirin jî li ser van kodan hatiye danîn. Ji ber ku îradeya jinê a “kirdebûnê” ji destê wê hatiye girtin, wek ‘tune’ hatiye hesibandin û di rehenda ‘tune’ de hatiye temsîlkirin, ev bûye arîşeya girîngtir û sereke a rexneya femînîst a wêjeyî. Hem rêya femînîstbûnê hem jî rêya nirxandinên di ronîya rexneya femînîst a wêjeyî ew e ku; divê “jinaniya jixatirxistî”, a ku di tekstên wêjeyî de hatiye veşartin, were veçirandin û aşkerakirin. Di vê mijarê de Maggie Humm wiha dibêje:

Jin, digihîjin asta wê hişberiyê û hay jê dibin ku jin bi awayekî sembolîk şaş hatiye şayeskirin û bi rexnekirina vê yekê dibin femînîst. Famkirina ji rêbazên bidestxistina zayendekê a bi rêya zimên û pirsyarîkirina wê rola ku di avakirina taybetîyên zimên de dilîze, armancên sereke ên femînîzmê pêk tînin. (Humm, 2002: 19)

Di vê xalê û qonaxê de, rexneya femînîst a wêjeyî, car din li ser tekstên ku bi awirekî nêrane hatine nivîsîn, sekiniye, kodên bavkanîyê ên di van tekstan de çespandiye, norm û qalibên îdeolojîk, çandî û civakê ku li paşperdeya temsîliyeta jinan a di van tekstan de hene, xuyanê kiriye û daye ber dasa rexneyê.

Rexneya Femînîst, wekî rexneya wêjeyî, di heman demê de, di berhemên wêjeyî de li ser pêjnkari û bihîstiyariya jinan disekine; û gava vê yekê dike, herî zêde

çeşnê romanê li rexneya xwe dike mijar. Ji ber ku roman, belkî jî çeşnê herî girîng e ku şopên jiyana civakî di nava xwe de dihewîne û wan vedibeyîne. Ciyê jinan a di qad û dika wêjeyî de, çi wekî xwînerêkê, çi wekî nivîskarekê çi jî ji alî temsîliyeta wê a di tekstên wêjeyî de, bûye mijara rexneya femînîst a wêjeyî. Xebatên ku ji vî aliyî ve û li ser vê bingeşê hatine kirin tevkarîyên gelek girîng lê kirine ku jin xuyanê bibe. “Kategoriya zayendê” bûye paldera herî girîng a van xebatan.

Gonca Arık Kırtıl di vî warî de wiha dibêje, “...paradîgmaya esasî a xebateke bi vî rengî, ku dê bi bikaranîna teknîk û awirên rexneya femînîst a wêjeyî were pêkanîn, kategoriya zayendê ye.” (Kırtıl, 2002: 2)

Yek ji wan qad û mijaran ku rexneya femînîst jinan di navendê de bi cî kiriye, “kevneşopî” ye. Wateya ku kevneşopîyê li jinan bar kiriye, awayê wê a pênasekirina jinan, bicîkirina wê jinan a di civakê de, bûye yek ji wan gelemşê û arîşeyan ku rexneya femînîst. Çawan ku kevneşopî jinan wekheva mêran qebûl nekiriye, bi hezaran salan ew kiriye dîke û bi awayekî kêr û netekûz pênase kiriye, heman awir jî xwe di qada wêjeyî de daye der. Ji ber vê yekê ye ku rexneya femînîst a wêjeyî, li hember bavkanîyê disekine û li xwe dike armanc ku; jina ku vê pergale ew di tekstên wêjeyî de afirandiye, bide ber hûrgerînê û wê jinê veguherîne. Her wekî ku Humm jî diyar dike,

Rexneya femînîst a wêjeyî, nîşan dide ka jin çawan dikarin li ser berhemên ku bi awirên bavkanîyê hatine nivîsîn û çibûna çarçoveya wan a ramanî, hûr bisekine û wan ji hev veçirînin; û bi vê rêbazê, her wekî politikaya femînîst, ji bandorên politik ên stratejîyên analîtîk û prensîpan fam dike. (Humm, 2002: 12)

Jin û mêr, ku bi awayekî biyolojîk û sosyolojîk ji hev cuda ne, di demajoya afirandina berhemên wêjeyî de jî van jihev cudatîyan didin der. Rexneya femînîst a wêjeyî, di ser vê qebûla giştî re, bi agahdarîya ku jin û mêr di zemînên wekhev de cî nagirin jî, tekstên wêjeyî û gotara wê, dispêre ezmûneyên civakî ên xweser ên nivîskarên wan û li ser vê hîmê wan dinirxîne. Ji ber ku jin û mêr xwedî awirên cuda ne, ev yek dibe sedem ku tekst ji alî ziman, naverok û teşê û şêwazê ve jî ji hev cuda bin. Xwendineke femînîst ku dê di vê çarçoveyê de bê kirin, dê çanda mêrê serdest ku di tekstan de dide der û hest û ezmûneyên jinan ku bandorê li afirîneriya wan a hunerî dike, aşkera dike û datîne rastê.

Rexneya femînîst a wêjeyî, hewl dide ku di wêjeyê de, jinan ji hemû alîyan ve binirxîne. Bi awirekî jinane ve; analîzkirina berhemên ku bi kodên bavkanîyê hatine nivîsîn û veçirandina van kodan û nirxandina temsîliyeta jinan a di van tekstan de, yek ji van e. Digel vê yekê, ji bo afirandina dîroka wêjeyî a jinan; ronîdana ser nivîskarên jin, ên ku di dîrokê de navê wan nehatiye bihîstin û di bin siya mêran de mane; bi pêkanîna tevdehîya nivîskar û xwînerên femînîst, çalakkirina jinê a di hemû qadên wêjeyî de; avakirin û geşedeyîna hişmendîyeke ku derbar ziman û hişmendîya jinane ye; di çarçoveya ziman û wêjeyê de, analîzkirina tekstên ku jinan nivîsiye; çespendina ka jin bi çi tîp û karakteran hatine temsîlkirin, alfyên dîtir ên van nirxandinan pêk tîne.

Bandora îdeolojîyê a li ser qada wêjeyê, vebeyîna kodên îdeolojîk a li ser berhemên wêjeyî jî bûye yek ji qada xebatê a rexneya femînîst a wêjeyî. Peyitandina Kate Millet a polîtîkaya zayendî der barê van xebatan de bûye paldera esasî. Bi vî awayî, di warê wêjeyî de dijmintîya ku li hember jinan pêk hatiye, hatiye aşkerakirin. Hewldana Kate Millet û Virginia Woolf a afirandina kevneşopîyeke jinane a di wêjeyê de, di vî warî de yek ji mînakên herî girîng e. Rexneya femînîst a wêjeyî ku di xwe de helantêdanekê dihewîne, di ronîya kategorîya zayendê de, tevkarî li kevneşopîya rexneya wêjeyê kiriye, kiriye ku pîver û krîterên nêrane ên rexneya wêjeyê karibin bên pirsyarîkirin.

Rêbaza rexneya femînîst, di heman demê de, gelemşeya rêbazê jî dide ber rexneyeke girîng. Ji ber ku hemû rêbazên rexneyî ên ku hatine avakirin, awir û nêziktêdayîna rexneya xwe li ser lidervehiştina jin û awirê jinane danîne. Anegorî femînîstan, ne mimkun e ku mirov karibe bi rêbaz û epîstemolojîyên ku bi awirekî mêrê serdest hatine danîn, ji dîroka jinan fam bike û wê şîrove bike. Teorîya rexneya femînîst a wêjeyî, di ronahiya daneyên ku ji teorîya femînîst bi dest xistiye, nêziktêdayîneke navdîsîplînî nîşan dide. Berhema wêjeyî; di çarçoveya sosyolojîk, siyasî, antropolojîk, psîkolojîk, dîrokî û hwd. de tê nirxandin. Ülfet Taylı Taş di vî warî de wiha dibêje,

Rexneya femînîst ku li ser pêwendîya di navbera jiyana û wêjeyê de heyî disekine, bi têkilîya teorîya femînîst ku bi dîsîplînen wekî psîkolojî, antropolojî û dîrokê re heyî pêşve çû, di jinûveavabûn û geşedana teorîya wêjeyê de roleke girîng bi cî anî. (Taylı Taş, 1996: 7)

Rexneya femînîst a wêjeyî ku ji alî biyolojîk, zimanzanî, çandî û psîkanalîtîkê ve berheman dinirxîne, girîngî dide gotinê û çarçoveyên gotinê. Çi çawan hatiye gotin; çarçove û paşxaneya îdeolojîk a çanda ku tekst tê de hatiye afirandin; hevbandorkirina saziyan, qewaman û avaniya sosyal, hemû jî ew kartêk in ku gotarê (discoursê) diyar dikin.

Teorîya femînîst, hem ji bo famkirin û şîrovekirina dinyayê hem jî ji bo famkirin û şîrovekirina awayê bicîkirina jinan a di vê dinyayê de, bûye kana geşedanên mezin. Rexneya femînîst a wêjeyî jî bi heman awayî derfet çêkiriye û kiriye ku berhema hunerî karibin bi çarçoveyên cuda werin famkirin û şîrovekirin. Rexneya femînîst li xwe kiriye armanc ku; awirê zayendparêz ku tiştêkirin û teşhîrkirina laşê jinan, kêmxistina jinan û temsîliyeta jinan a di asta çîna duyemîn de wek tiştêkê normal dibîne, teşhîr bike. Gava ev yek pêk aniye, ne tenê berhemên hunerî ên heyî rexne kiriye, berhemên alternatîf jî ava kiriye. Xebata Judy Chicago a bi navê Dinner Party, di navbera salên 1973-1978an de piştî hevkarîyeke xurt derketiye holê û wekî berhemêke bi heybet a hunera femînîst hatiye qebûl kirin.

Pêşketina rexneya femînîst, bi pêşketina femînîzmê a dîrokî re heman demê parve kiriye. Car caran xwe spartîye rexneya marksîst, car caran xwe spartîye psîkanalîzmê, carinan xwe spartîye deconstruction an jî postmodernîzmê û bi van argumanan rexneyeke ku xwe di navenda arîşeya jinan de bi cî dike, bi pêş xistiye.

Xala destpêkê a vê rexneyê, di berhemên wêjeyî de jî xwe dispêre kêmxistin û bêxatîrkirina jinan.

Hin tiştên ji teorîya Jacques Lacan a psîkanalîzê, ji teorîya Jacques Derrida a deconstructionê; tiştên ku Hêlên Cixous, Luce Irigaray û Julia Kristeva pêşniyaz kirine; teorîyên “zimanê jinane” yek ji xalên palder ên vê teorîyê ne.

Berna Moran, rexneya femînîst di du xalên sereke de polîn dike. “1) Wekî xwîner arasteyî jinê 2) Wekî nivîskar arasteyî jinê” (Moran, 1994: 229)

1. Yekem mînakên rexneya beş û cureya yekem a ku bi awirê jinane bo berhemên nivîskarên mêr hatiye arastekirin ji alî Kate Millet û Simone de Beauvoir ve hatiye dayîn. Her duyan jî teorîyên xwe spartine “gotara (discoursa) nêrane” ku di berhemên wêjeyî de hene û li ser rexneya “normên bavkanîyê” sekinîne. Moran di der barê girîngîya Beauvoir de vê tespîtê dike û dibêje: “Simone de Beauvoir,

bindestbûna jinê a di qada polîtîk û ekonomîk de wekî jêrxane û huner û wêjeya ku jinê kêr dixê jî wekî jorxaneya ku vê rewşê vedibeyîne, bi nav kiriye.” (Moran, 1994: 230)

Sandra M. Gilbert û Suzan Gubar di xebata xwe a bi sê cildan a bi navê “The Mad Woman in the Attic” de, li ser tîpên jinan ku nivîskarên mêr ew afirandine, sekinîne. Ji tîpên “meleka li malê” û “cinawir”, tîpa “jina li malê”, bêhnpak e, bi namûs e û girêdayî mêrê xwe ye. Herçî tîpa “cinawir” e, mirîya azadiya xwe ye, li hember îradeya mêran li ber xwe dide û dikeve nav şer û pevçûnê. Di berhemên ku bi zimanê mêrê serdest hatine afirandin de, pênasîya jinan li gorî daxwaz û îqtîdarên mêran hatiye kirin. Ev yek jî helwesteke îdeolojîk e. Loma jî;

2. Vê teorîyê, hem ji bo ku nivîskarên jin ên ku di dîroka wêjeyê de veşartî mane, derxîne rastê hewl daye û hem jî li ser fikra ka gelo “gotara (discoursa) nû a jinane” mimkun e an na, sekiniye.

Ew li sekinîne û fikirîne ku ezmûneya hevpar a jinan ku di bin çewisandina mêrê serdest de dijîn, dê bi awayekî xwezayî dê bibe sedema çêbûna gotareke (discourseke) cuda. Sedema vê yekê li taybetîyên biyolojîk nespertine, lê wan ev yek spartîye awayê cîbicîkirina jinan a di civakê de. Jin ji çîna duyemîn e. Loma jî, nîrxandin û analîzkirina tîp, karakter, jiyandîna heyî û zimanê hevpar ên di berhemên jinan de heyî, bûye armanca hevpar. Xebata Gilbert û Gubar di vê çarçoveyê de pêk hatiye. Di wan deman de ku hatiye gotin, nivîsîn ne karê jinan e, ew karekî aîdî mêran e, têkoşîna hebûnê a nivîskarên jin û zimanê wan ê di wan şert û mercan de hatiye analîzkirin. Nivîskarên jin, ên ku navê mêran li xwe kirine, di berhemên xwe de, serîhildana xwe a li hember bavkanîyê li lehengek duyemîn -ne lehengê esasî- bar kirine.

Aliyekî dîtir ê beşa “wekî nivîskar arasteyî jinê” a rexneya femînîst a wêjeyî, ramana “gotara (discoursa) jinane” ye. Bi taybetî, femînîstên wekî Hêlêne Cixous, Luce Irigaray, Julia Kristeva, Monique Wittig, di vî warî de xebatên teorîk kirine û teorîyên xwe spartine gotarên (discoursên) qadên wekî psîkanalîzm, zimanzanî û biyolojiyê û teorîyên Lacan û Derrida. Ew li ser gotara (discoursa) mêrane ku jinan dike çîna duyem nesekinîne an jî bi ravekirina dîroka “jina nivîskar” mijûl nebûne. Ew li ser bandora taybetîyên biyolojîk a li ser “gotara (discoursa) jinane” sekinîne û

hewl dane ku bizanibin ka ev bandor dikare bibe gotareke (discourseke) xweserî jinan. Di vê qonaxê de, parastina wan a sereke ev e; bi taybetî, hemû epîstemolojiyên navendRojava li ser zimanê mêrê serdest hatiye danîn û hem di çarçoveya felsefeyê û hem jî di çarçoveya zimanî de serdestîya mêran hatiye avakirin. Loma jî, wekî rêya şikandina vê serdestîyê, li şûna ku “şer bikin”, xwe dane ser rêyeke dî û fikra, divê “écriture féminine”, yanê “zimanekî ku xwe dispêre jinbûnê” were afirandin, parastine.

Bi taybetî, li xwe kirine armanc ku di ronîya xebatên Derrida ên deconstructîvîst ku li ser dichotomy (dijberîya duberî) kirine, hîyerarşîya mêr/jin birûxînin. Ji ber ku wan dupat lê kiriye ku di van dichotomyan de, têgiha yekem aliyê erênî, têgiha duyem jî aliyê neyînî û kêr diyar û pênasê dike, loma jî; wan li xwe kiriye armanc ku “dîkekirina” jinan a li hember mêran bi “zimanekî nû” birûxînin. Di vê qonaxê de, têgiha “différance” a Derrida, xet û tewereya esasî ye.

2.2. Deconstruction

Teza sereke a deconstructionê, li ser vê yekê ye ku dibêje; felsefeya Rojavayê li ser dichotomyên (dijberîyên duberî) wekî aqil/xweza, mêr/jin ava bûye. Derrida vê dichotomyê (dijberîyên duberî) wiha şîrove kiriye û gotiye, a yekem a duyem dike dîke û xwe lê dike serdest. Di vê qonaxê de, Derrida, bi hin stratejîyên deconstructionê li xwe kiriye armanc ku; zimanekî wisan peyde bike ku avanîya mantiqî a dichotomyê (dijberîyên duberî) xera bike û destûrê nede ku yek ji wan dichotomyê (dijberîyên duberî) ya din neke dîke. Têkildarî “kirdebûna” jinê, deconstructiona Derridayê bandoreke girîng li ser femînîstan kiriye da ku karibin ji dubendîya wekhevî-jihveçihêtiyê biborin.

Erol Mutlu, deconstructonê wekî “rêbazeke analîzkirinê ku dixwaze hemû avanîyan ji hev veçirîne” pênasê kiriye. (Erol, 2004: 301) Rexneya Derrida a ji bo structuralizmê ne tenê di çarçoveya zimanî de ye. Derrida, ji feraseta tekst an jî ziman a structuralizmê daye ser rê û di ser têgihên ku li ser wan sekiniye re, bi awayekî tevdehî, rexne li paşxaneya felsefî an jî palderên dîrokî ên structuralizmê an jî dichotomyê (dijberîyên duberî) kiriye. Structuralizm avaniyeke wisan diparêze ku ji guherînê re girtî ye, dupat li nedomdariyê dike, girêdayî têgiha şanîdêriyê û

dichotomyê (dijberîyên duberî) ye. Aha ji vî aliyê ve, structuralizm avanîyeke wisan peyde dike ku hem dichotomyê (dijberîyên duberî) hem jî zimanê mêrê serdest meşrû dike. Loma jî, Derrida hewl dide ku hemû avanîyên ku li ser dichotomyê (dijberîyên duberî) hatine danîn, hilweşîne. Xala herî girîng ev e ku felsefeya Derrida a “deconstruction”ê û femînîst tê de hevkarî bi hev re dikin. Ew li hember prensîpên esasî ên structuralizmê disekinin. Hevkarîya wan a esasî ev e; ew hewl didin ku di ser dichotomyan (dijberîyên duberî) re ku di tekstê de hene, avanîya serdest xera bikin û hilweşînin. Anne Game, li dervemayîna jinan bi vî awayî pênase dike û dibêje: “Bi derbiraneke esasî, her tiştê ku bi awayekî hişberî di tekstê de hatiye derevekirin, veşartin û li derveyî tekstê hatiye hiştin, xwedî karaktereke “mê” ye.” (Game, 1998:36)

Cladue Lêvî Strauss, qaydeyên tevlihev ên têkilîyên “merivatîyê” û mîtên gelên “hoveber”, li ser dichotomyan (dijberîyên duberî) daniye û di binê yek ji van dichotomyan (dijberîyên duberî) polîn kiriye. Wî ji vê qonaxê daye ser rê û têgihên “xweza” û “çand”ê kategorîze kiriye. Ji ber ku ev rêbaza kategorîzekirinê zanaveke sabît û pêdandî dide têgihan ji alî Derrida ve hatiye rexnekirin. Ev prensîpa “dichotomyan (dijberîyên duberî)” ku ji bo femînîstan jî gelemşe û problem e, li ser dîtin û şîroveya; gotara (discoursa) mêrê serdest jinan dike dîke û tim û tim wekî heyîneke kêr û bi qisûr nîşan dide û sabît û pêdandî dike, hatiye rexnekirin.

Jinê temsîla xwezayê kiriye, herçî mêr e, wekî hêmana ku temsîla aqil dike di heman demê de jî “çandê” jî heyî dike. Bi vê dîtin û ramanê jin ji kategoriya aqil hatiye derevekirin.

Bidawîkirina vê cî û derawaya jina ku “tê nîşankirin” yek ji wan rexneyên herî girîng e ku ji alî femînîst û Derridayê deconstructivist ve, li avanîya hiyerarşik ku pala xwe dide serdestîya mêran, hatiye kirin.

...di gelek tekstên min de, jin teqez temsîliyeta “dîkeya” mutleq dike; lê ne ji ber ku ji ên din û ji dîkeyên dîtir dîketir e. Heke mirov rastiye bêje, ji ber ku di çanda me de jin ji hêmanên serdest hatiye derevekirin an jî bi wan re di nav têkilîyeke asîmetrîk de ye. (Derrida, 2003: 13)

Femînîstan ji bo ku van dichotomyan (dijberîyên duberî) li deconstructionê bixin du nêziktêdayîn nîşan dane. Femînîstîn ku hewl dane ku rol û dilqên mêran bidin xwe an jî serwerîya alîyê ku jinane ye derxînin pêş, ji alî Derrida ve hatine

rexnekirin. Têgiha “Diffêrance” ku Derrida ew afirandiye, hem bi wateya “Cudabûn”ê hem jî bi wateya “paşdeavêtin”ê tê. “Ew nîşan dike ku; ziman her tim nediyar e, biryara wateyê her tim nikare were dayîn û her wiha nîşan dide ku bi awayekî bêdawî paşde hatiye avêtin.” (Stuart, 2006: 245)

Derrida, li ser şikandin û hilweşandina avanîya mêrê serdest, “navendpeyv (logocentrizm)”a ku wek serdestîya aqil têgihdar bûye jî li deconstructionê xistiye. Wî, “navendpeyv”ê, wek teorîya bavkanîyê ku jin tê de wekî “dîkeyekê” tê cîbicîkirin, nirxandiye û rexne kiriye û vê rexneya wî pêşî li femînîstan vekiriyê. Bi xwendinên bi vî awayî, ku xwendinên ji nû ve hatine kirin, hatiye xwestin ku “a ku jinane ye” hêja û bi qîmet be.

Hem teorîya deconstructivist û hem jî rexneya femînîst, pergala nirxên ku çewisandinê li jinan dike û wan derveyî tekstan dihêle, li deconstructionê xistiye û ji bo ku karibin zimanekî taybet û arizî xwe ava bikin, xebitîne. Yek ji xala hevbeş a rexneya femînîst û deconstructionê ew e ku; “Pêdandîbûna Dahênana Wê” dane ber dasa rexneyê. Xwendina tekstan a bi awirekî “xwendina mêyane” û biqîmetkirina “tiştên ku jinane ye” yek ji tevkarîya girîn a deconstructionê ye ku li femînîzmê kiriye. Wan, zimanê nêrane a structuralizmê ku “kirdeyê” pêdandî dike, li deconstructionê xistiye û mîta hunermendê mêrê deha, rexne kirine.

Metoda deconstructionê, pêşniyazeke xwendinê ye. Derrida, ji prensîpa “a ku tê nîşandan” nikare were bisînorkirin dide ser rê û bi çav û awirekî şikdar li wê zanîna dinîhêre ku bi aqilekî mutleq hatiye bisînorkirin ûwekî ku teqez e tê pêşkêşkirin. Ew pirdengiyê derdixîne pêş. Bingehên dinyaya ramanî a Rojavayê, xala wan a çêbûn û derketinê dide ber pirsyaran û wan rexne . Ahu Antmen, tevkarîya deconstructionê a li femînîzmê, bi vî awayî dinirxîne:

Xerakirina ‘pêdandîbûna jinbûnê’, aşkerakirina têkilîyên hilxelitîna ku xuyakirina jinê a di temsîlê de diyar dike û pê re jî, dawîlêanîna li wî cî û derawa jinê ku “tê nîşandan” û mêrbûnê qewî û saxlem dike û wî di navendê de bi cî dike. (Antmen, 2012: 66)

Femînîstên Fransîz û poststructuralizm jî tevkarî li teorîya femînîst kiriye. Tezên der barê ziman û zayendê de tevkarîyeke veguherîner li rexneya femînîst kiriye. Piştewanî li ramana ‘jin dibin jin’ (ramana mirov wekî jin ji dayika xwe nabin, piştêre dibin jin ku Simone de Beauvoir bi taybetî bal kişandiye,) kirine û têkilîyên di

navbera ziman û avakirina zayendê de heyî li deconstructionê xistine. Maggi Humm dupat lê dike û dibêje:

“Bi taybetî teorîya rexneyê û deconstruction, bi awayekî hûrgerane û veşartî, xwedî wê reng û awayê ye ku dê karibe şoreşekê li dar bixe; ji ber ku êrîşî dichotomoyan (dijberiyên duberî) ên zimanî dike ku di navbera jin û mêran de heye.” (Humm, 2002: 42)

Aliyekî din a hevpar a femînîzm û deconstructionê ku rexne li “temsîlfyeta jinan” dikin, “metaforên zayendê” ye. “Metaforên zayendê” ku rexneya kevneşopî wê wekî jirêzê û normal dibîne, metaforên wisan afirandine ku “jin tê de tê hîçkirin, tê tiştêkirin, tê bêhêzkirin û kêmxistin” û bi hest re wekhev tê dîtîn û ji aqil tê bêpar û mehrûmkirin. Bi vî awayî jin, an bi awayekî neyînî an jî bi awayekî “temamker” hatiye temsîlkirin. Humm, ji bo rûxandina vê helwestê der barê femînîstên Fransiz wiha dibêje:

“Jinên fransiz hewl didin ku wêjeke jinan, “écriture féminine” biafirînin. Armanca wan ew e ku pirsyarî bikin ka ji alî ziman ve dijberiyên nêr/mê çawan tê hilberandin û jin çawan her tim dibe wek term û têgiheke neyînî an jî tamamker.” (h.b. 2002: 213)

2.2.1. Rexneya Deconstructîf

Dîtîn û ramanên Julia Kristeva ku teorîya xwe a der heqê femînîzmê de bi rêya teorîya psîkanalîtîkê daniye, girîng in. Julia Kristeva, li hember gotarên (discours) Freud ên “kêm” û “hewespêkirina bo penîsê”, parastina “zimanê semîyotîk” dike. Kristeva, pala xwe dide binavkirina Jacques Lacan a “pergala sembolîk” ku dibêje li hember dinyayeke bav, yanê otorîte, tê de serdest e, pergaleke wekî “pergal û zimanek semîyotîk” heye û ji vir û pê de dide ser rê. Terry Eagleton dibêje:

...pergala sembolîk a ku Lacan behsê jê dike, di rastiya xwe de, pergaleke zayendî û civakî a bavkanîyê ye ku tê de qaydeya bav serdest e û ev pergal; li dora “şanîdêra jêbihurî” a fallusê a civaka modern a çîndar hatiye avakirin. (Eagleton, 2014: 195).

Eagleton, helwest û pêkanîna Krsiteva ku li hember “zimanê sembolîk” li ser “zimanê semîyotîk” radiweste jî, bi pêwendîya xurt û pihêt a ku di navbera jinbûn û semiyotîkê de heye ve girê dide. “Her wiha, di navbera semîyotîk û jinbûnê de pêwendîyeke xurt heye. Lê belê, ev yek, ne tenê zimanekî arizî jinan e; ji ber ku berî heyama Oedipal çêdibe, jihevcihêbûna zayendan nas nake.” (Eagleton, 2014: 196).

Kristeva diçespîne ku “zimanê sembolîk”, pergala bavkanîyê û gotara (discours) nêrane temsîl dike û loma jî “zimanê semîyotîk” diparêze. Zimanê semîyotîk çekek e ku dê ji bo hilweşandina vê zimanê sembolîk bê bikaranîn. Kristeva, ji ber ku bi awayekî îrrasyonel tê kodkirin û di xwe de xewnên ku berpêyî jêrhişê tên tehdan, di hewîne û tê de nîşaneyên nepen û veşartî hene, pergala semîyotîk bi tiştê ku jinane ye ve dike yek; herçî pergala sembolîk e, ji ber ku di xwe de hewngirî (rasyonalîzm), gotara (discours) otorîter û tiştê ku bi mantiq e, di hewîne, Kristeva wê jî bi tiştê ku mêrane ye ve dike yek. Jinanebûn û mêranebûn ne bi çarçove û têkildarîyên xwe ên biyolojîk, lê belê bi çarçove û têkildarîyên xwe ên zayendî tê nixandî. Kristeva ku diparêze û dibêje, divê ji vir û pê de tekst bi awayekî pir-tewq werin qebûl kirin, pê re jî diyar dike ku di bin teksta ku otorîteyê, yanê mêrbûnê, meşrû dike de, bin-tekstek heye ku qonaxa semîyotîk tîne bîra mirov. Û diparêze û dibêje, ev bin-tekst dikare teksta esasî ku aîdî mêrbûnê ye, hilweşîne.

Di vê esas û çarçoveyê de, awirekî dîtir jî heye ku mirov dê karibe şîrove bike; ew jî çespendina Virginia Woolf e ku di pirtûka xwe a bi navê “Odeyeke Aîdî Xwe” de kiriye. Woolfa ku diyar dike û dibêje: “... di sedsala 19. de jî jinên ku bi navê mêran dinivîsîn hebûn û nivîskarên wekî Currel Bell, George Eliot, George Sand hin ji wan nivîskarên jin in ku navê mêran li xwe kirine.” (Woolf, 2016: 57). Anegorî Woolf, heke di gava xwendina van nivîskaran de mirov bala xwe bide bin-tekstan , dê bê dîtîna ku di navbera zayenda civakî û rolên jinbûnê ên kevneşopî de, pevçûn û lihevnekirineke navxweyî heye. Nûkhet Esen jî dibêje, “Ji ber ku di wêjeya jinan de, ev gotara (discours) dudengî kana du çîrokên ji hev cuda ye ku hem serdest e hem jî hatiye bêdengkirin, di berhemê de jî, tekst û bin-tekstê ava dike.” (Esen, 2006: 141).

3. WEKÎ KIRDEYEKÊ HEBÛN Û TEMSÎLÎYETA JINAN

3.1. Temsîliyeta Jinan Di Berhemên Dilawer Zeraq De

Berhemên wêjeyî, di gelek waran de bûne tekstên ku hişûbîra civakî û dîrokî di xwe de di hewînin. Loma jî piştî berbelavbûna berhemên çapkîrî ên wêjeyî, digel rexneyên ku tenê di warê wêjeyê de hatine kirin, di gelek warên wekî dîrok, sosyolojî, antropolojî, psîkanalîtîk, polîtîk û hwd. de jî, berhemên wêjeyî bûne yek ji çavkanîyên esasî ku lêkoloner hûr li ser sekinine. Her wiha ev yek di warê femînîzmê de jî, ji aliyê lêkolînerên wekî Kate Millett, Simone de Beauvoir, Mary Ellmann ve hatiye kirin. Wekî ku me di beşa duyem de jî dupat lê kiribû, piştî pêşketina tevger û teorîyên femînîst berhemên ku wek *kanon* hatine hesibandin, bi awirtêdenake rexneyî a femînîst, ji nû ve hatine nirxandin. Nirxandinên bi vî awayî û nû, xwe dispêrin teorîsyenên femînîst ên wekî V. Woolf, Kate Millett, Julia Kristeva, Betty Friedan, Simone de Beauvoir, Luce Irigaray, Monique Wittig, Hélène Cixous, Mary Daly û hwd. Ne tenê torîsyenên femînîst, her wiha hin antropolog, sosyolog, zimannas, felsefevan jî bi xebatên xwe ve asoya teorîsyenên femînîst berfireh kirine û di warê temsîliyeta û cîbicîkirina jinan de xebatên pêşengî pêk anîne. Derrida, Lacan, W. Benjamin, Foucault ji van kesan in ku xebatên wan ên pêşengî di warê pêşveçûna teorîyên femînîst de bûne sedema gavavêtinên mezin. Berhema Simone de Beauvoir a bi navê *The Second Sex* (1949) û berhema Mary Ellmann a bi navê *Thinking About Women* (1968), wek destpêka rexneya wêjeyî a femînîst tên qebûlkirin. Ev cure rexne, hêmaya jinê, a ku di hundirê berhema wêjeyî de hatiye afirandin û saz kirin, ji xwe re wek hîm qebl dîke. Bi taybetî li ser klîşeyên ku der barê jinan de, ên ku di berhemên nivîskarên mêr de pêk hatine, sekinîne û bi awirtêdaneke femînîst ew berhem veçirandine. Ji ber vê yekê ye ku; jintî, mêtî, civak, zayend, zayenda civakî, qadên giştî û taybet, temsîliyeta, vebêjî, zewac, keçinî/keçxamafî, çand, koç, şer, cezakirin, kirdebûn an jî tiştêbûn, şidet, dayiktî, tecawiz, dîn, dîrok û epîstemolojîyên avakîrî û hêmanên ku bi awayekî ve bi jinê ve têkildar in dane ber pirsan. Piştî van pirsyarkirinan, wan diyar kiriye ku, zanist jî tevde, jin di her qadê de li derveyî jiyane hatiye hîştin û bi ser de jî kêmxistî hatiye pênasekirin. Rolên zayenda civakî ne ku jin

di nav pênaseyên nêrane de çewisandine. Jina ku di tiştebûnê de hatiye hepskirin, bi van pêşketinan daye dû kirdebûna xwe û rabûna li ser xwe. Qadên temsîlkirinê ên sîyasî û zimanî bi hezaran salan hewldane ku hemû zanistan li ser kirdebûna mêran ava bikin û jinan jî di bin sîya vê kirdebûnê de bifetisîn. Wekî ku Butler jî balê dibe sere û dibêje,

Qadên ‘temsîlkirinê ên siyasî û zimanî, krîtera ku kirdeyan ava dike û dirûv dide wan, di serî de diyar dike; wekî encama vê yeke, temsîl tene li aliye ku dikare wekî kirde were pênasekirin, tê bexişandin. Bi gotinek din, ji bo ku bibe xwedî temsîliyetekê, bi taybetî, divêtiya kirdebûnê tê bicîanîn. (Butler, 2014: 44).

Tam di vê qonaxê de, rexneyên ku li hember vê serdestîyê pêk hatine, bûne sedema pêşketina rexneya wêjeyî a femînîst.

Wekî ku me di beşa duyem de jî diyar kiribû, rexneya wêjeyî a femînîst bi sê awayan berhemên wêjeyî dane ber pirsan. A yekem; berhemên ku wek *kanon* hatine hesibandin bi awirekî nû hatine nirxandin, a duyem; nivîskarên jin ên ku di dîroka wêjeyê de nehatine dîtin an jî nivîskarên ku nikaribûne xwe heyî bikin, berbiçav kirine û a sêyem jî; hewl dane ku wek xwendekar, rol û nirxandinên jinan derxin pêş û zimanekî jinane biafirînin. Lekolîn û nirxandinên bi vî awayî jî bi xwe re gotineke nû afirandîye. Gotara ku di hezaran salan de bi her awayî jin wek tişte nîşan daye, hatiye pûçkirin û li hember wê gotinê jî gotineke nû ava bûye. Gotareke jinane, gotareke derbarê jinê de û gotareke ku jin di tê de kirde ye. Her çî qas xwedîyên vê gotara nû bi taybetî jin bin jî, piştî demekê mêran jî hewl daye ku xwedîtî li vê gotarê bikin. Guhertin û pêşketinên di warê temsîlkirina jinê de bûne sedem ku ne tenê di warê teorîyê, di warê sîyasetê û zanistê, her wiha di berhemên wêjeyî de jî gotareke ku jin tê de kirde ye, bê nivîsîn. Wekî ku Fatna Ayt Sabbah jî balê dibe serê, “Her gotar, dinyayê anegorî pêşînî û armancên xwe ji nû ve diafirîne û dirûv dide wê. Her gotar, çî bedena jinan çî jî bedena meran, anegorî pêşînî û armanca xwe diafirîne. (Sabbah: 1995: 86). Piştî xebatên wek *The Second Sex* (Simone de Beauvoir), *Thinking About Women* (Mary Ellmann), *Sexual Politics* (Kate Millett), *Le Deuxième Sexe I-II* (Simone de Beauvoir), *A Room of One’s Own* (Virginia Woolf), *The Madwoman in the Attic* û *No Man’s Land* (Sandra Gilbert & Susan Gubar), ew gotara ku jin tê de winda bûye; dîkekirina wê; şayeskirina wê a wek tişte û bêkesayet û heyîbûna wê a ku ancax digel mêr mimkun e, bi rexneyan û analîzan hatiye

aşkerakirin. Berhemên ku jin tê de mîna ku her tim wek parçeyek goşt be, bes çêpek be, tene tiştayek be ji bo mêr, hatine şayesandin, hatine pûçkirin. Donovan wiha tîne zimên û dibêje, “Mêr ne li gorî jinê, lê jin li gorî mêr tê pênasekirin û tê jihevçihêkirin, jina ku bernaberî mêrê esasî ye ne esas e, rasthatinî ye. Ew (yanê mêr), kirde ye û teqez e herçî jin e, dîke ye.”(Donovan, 2015: 232).

Di berhemên Dilawer Zeraq de hema bêje temaya esasî bi giştî li ser jinan ava bûye. Di navenda vegotina wî de mêrê leheng ku bihêz e, xwedîdar e û kirdeya tekane ye, tune ye. Ji ber vê yekê jî, li hember wî mêrî, jina ku bi awayekî rasthatinî heyî dibe û li gorî wî mêrî dîke ye jî, tune ye. Di vegotina wî de, jin di navendê de cî digire û jinek heyeku dikare bi rastîya xwe re rû bi rû bibe û ew jin hem kirde ye û hem jî bi rasteqînîya hebûna xwe ve heye. ‘Kategorîya jinan’ a ku bi hezaran salan ava bûye, her tim bi kodên nêrane hatiye pênasekirin û di gotara wêjeyî de jî bi hemû giranîya xwe ve heyî bûye. Wekî ku me li jor jî anî zimên, jin li gorî mêr hatiye cîbicîkirin û ji bo mêrê leheng wek rasthatî hatiye afirandin. Wêje jî ji alîyê mêran ve hatiye dorpêçkirin û jineke ku kirdeya jiyana xwe ye û bi rasteqînîya xwe ve heye, nehatiye afirandin. Ji ber vê yekê ye ku awirtêdana femînîstî û epîstemolojîya femînîst hewl daye ku ‘kategorîya jinan’ ji nû ve pênase bike. Piranî di berhemên nivîskarên jin de ev pênaseya ji ber hatiye rûxandin. Tam di vê qonaxê de, hewce ye ku ‘kategorîya jinan’ ji nû ve bê pênasekirin. Pirsê yekem ku divê bê bersivandin ev e; gelo bi çî awayî mimkun e ku ‘kategorîya jinan’ ji qebulkirinê giştî ên temsîliyêten zimanî û polîtîk bê rizgarkirin û bi çî awayî dikare li kirdeyeke femînîst bê veguherandin? Çimkî, ‘zayenda civakî’ di pêvajoya dîrokê de, ji xalên hevbirînê, ên sîyasî û çandî, hatiye hilberandin. Ji ber vê yekê ye ku divê serê pêşîn li ser xalên hevbirînê bê sekinandin û ji vir jî pêkhatiya heyî bê rûxandin. Divê sedem û mercên hebûna ‘zayend’ û ‘zayenda civakî’ bê nirxandin û pirsê jê bê kirin. Ji ber ku zayend nayê guherandin ji ber ku bîyolojîk e; lê bele gelo pêkan e zayenda civakî bê guherandin ji ber ku sazîrî û avakîrî ye. Kodên zayenda civakî ên nêrane û tekilîyên serdest, qadên xwe ên temsîlkirinê ên zimanî afirandine. Kirdebûna mêr û tiştêbûna jinê di nav vî zimanî de watedar bûne, divê ev wate û pê re jî ev dînamîkên ku hatine avakirin, bê rûxandin.

Dilawer Zeraq, di berhemên xwe de ‘kategorîya jinan’, a ku li gorî mêr hatiye afirandin, dide ber pirsan. Da ku temsîliyeta jinan ji alîyê mêran ve pêk neyê; jin, ji

alîyê vegotin û hişmendîyeke nêrane neyên pênasekirin, jin di navenda çîrokan de cî bi cî kiriye û hewl daye ku xwendevan karibe jinan ji jinan hîn bibe û bibihîse. Zeraq, di ser wan jinan re; mêrtî, zewac, delalîti, têkilîya zayendî, zayenda civakî, çand, malbat, tecawiz, şîdet, hevşabûn, keçanî, cezakirin, fuhûş, dayîktî, derketina ji qadên taybet û cîgirtina di qada giştî de, vebêjî, şer, kirdebûn û tiştêbûn bi awayekî hişyarî û zanetî û bi kodên jinane dide ber hûrniherînan.

Têgihên wek *'endîşeya vegotinê'* û *'hevpeymanaxwîner û nivîskar'* ku Nurdan Gürbilek ji bo armanca nivîsîna berhama wêjeyî bi kar tîne, angaşteke cihê tîne pêş ku divê em berhema wêjeyî di kîjan çarçoveya rexneyî de bixwînin. Vegotin, bi serê xwe, di xwe de gelek zêde endîşe dihewîne. Di bin van endîşeyan de *'kodên civakî ên hînbûyî'* hene û ev kod, ew kod in ku têkilîya di navbera nivîskar û xwîner de heyî, diyar dikin. Gürbilek, diyar dike ku *"xwînerî bi jêbandorgirtinê, jêbandorgirtinê jî bi jinanebûnê re yek tê dîtin; û nivîskarî bi berxwedana li hember bandorê, berxwedana li hember bandorê jî bi nêrbûnê re tê pêwendîdarkirin û hevpeymanaxwîner û nivîskar li ser vê bingehe ava dibe"*. (Gürbilek, 2014: 12). Ew diyar dike ku ev rewş ne tenê ji gelemşeya cihêkarîyê pêk tê, di heman demê de bi endîşeya ku parçeyekî jêneqetê cîhana hûndirîn a nivîskar be jî têkildar e. Em ê di ronîya van agahîyan de, li ser *endîşeya vegotinê* û kodên *hevpeymanaxwîner û nivîskar* ên di berhemên Dilawer Zeraq de heyî, bisekinin. Her wiha heke em di ronahîya van nirxandinan de bidin dû pirsan û bêjin gelo çavkanîya kodên endîşeya hevpeymanaxwîner û nivîskar ên di berhemên Dilawer Zeraq de çi ne, em ê bibînin ku ew endîşe berpêyî rûxandina rol û kodên zayenda civakî ên hînkirî û hînbûyî ne. Ne tenê rûxandina rol û kodên zayenda civakî, pê re jî, wek kirde, temsîlyeta jinan pêk tê. Di metnên edebî de bi giştî, an bi vegotîneke kiraskirî an jî bi vegotîneke aşkera *'zimanê nêrane'* heye. Kodên vî zimanê nêrane, bi kodên zayenda civakî ve hatiye honandin. Pîrî caran, nivîskar bi van kodan famkirina xwe ya ji jinan jî aşkera dikin. Dilawer Zeraq ev kodên nêrane û zimanê nêrane bi awayekî *deconstructif* ji hev veçirandiye. Kodên endîşeya vegotina wî a esasî rûxandina zimanê nêrane û pê re jî avakirina temsîlyeta jinan e ku azadîya jinê û kirdebûna jinê derdixe pêş.

Em ê di vê xebatê de li ser berhemên Dilawer Zeraq romanên wî, ên ku wek *Sêyîneya Winda* hatiye binavkirin *-Şevên Winda Wêneyên Meçhul, Mirina Bê Sî, Nexşên Li Giyan-* û li ser pirtûka çîrokan a bi navê *Bişirîna Şermînî* hûr bisekinin.

3.1.1. Zayend û Zayenda Civakî

Gengeşeyên ku tevgerên femînîst bi dehan salan li ser sekinîne û bi hewldaneke têkoşer dane ber analîzan û li ser hûr sekinîne, bûye sedema pêşketinên bêhempa. Mirov dikare bêje ku di vê tekoşînê de, pênaseya ku li ser “zayend û zayenda civakî” hatiye kirin, pêşketin û destkeftîya herî girîng e. Ji ber ku diyar bû ku zayend bîyolojîk e lê belê zayenda civakî hatiye diyarkirin. Piştî ku yekem car Anne Dakley di pirtûka xwe a bi navê *Sex, Gender and Society* de, têgiha *gender* bi kar anî, ji bo tevgerên femînîst û dûre jî ji bo rexneya femînîst derî li pênase û zanyariyên nû vekir. Nirxandinên li ser zayenda civakî, xebatên di vî warî de bi pîr û pergal kir. Ji ber ku kodên nêrane û serdest, bi hezaran salan di hemû qadên zanistî de cî girtibûn û jin jî bi van kodan pênase kiribûn. Wekî ku me beşa yekem de jî anîbû zimên, zayenda civakî digel coxrafya, nirxên çandî, awirê polîtîk û mekanîzmayên îqtîdarê watedar bûye. Desthilatdarîya nêrane a bi hezaran salan pênaseyên xwe ên li ser zayendê, bi mekanîzmayên xwe ên zordariyê afirandine û jin di nav van pênaseyan de winda kirine û qadên polîtîk, giştî û taybet; zanyarî, epîstemolojî, wêje, dîrok û hwd. bi van kodan bi sînor kirine û jin tê de çewisandine. Nirxandinên di warê “zayend û zayenda civakî” de bûne sedem ku *zayenda civakî* wekî kategoriyeke nirxandinê bandora xwe li ser hemû qadan bike. Wêje jî bû yek ji van qadan.

Berhemên Dilawer Zeraq, ên ku me wek çavkanîyên vê xebatê diyar kirine, bi taybetî û bi awayekî hişber li ser çîrokên jinan ava bûne. Vebêjên jin, zimanekî jinane, şikestinên jinan, çewisandina jinan, berxwedana jinan, têgîhiştin û pêşketina jinan a bi kodên jinane, hest û ramanên jinan ên di warê jiyanê de, veguherînên jinan ên polîtîk û takekesî, kodên nêrane ên ku ji aliyê jinan ve hatine pûçkirin, derketina ji qadên taybet û cîgirtina di qada giştî de ya jinan, ji çend taybetiyên van berheman in. Ji ber ku *zayenda civakî* wekî kategoriyeke nirxandinê bandora xwe li ser hemû qadan daniye, em ê jî di destpêka xebata xwe de berhemên Dilawer Zeraq di warê zayend û zayenda civakî de binirxînin. Rexneya femînîst a wêjeyî herî zêde li ser gelemşeya çand û bavkanîyê hûr sekinîye ji ber ku jin di gerdişê de wekî ku bi mêr re ne di astekî de ye hatiye cîbicîkirin. Serdestîya nêrane, bi hezaran salan, ji bo jinan nekesayetbûn û cîbicîkirina digel mêrekî raberî jinan kiriye. Ev rewşa ku di qada

wêjeyê de jî ji bo jinan guncan hatiye dîtin ancax bi sekinîn û rabûna li hember bavkanîyê hatiye rûxandin.

Bişirîna Şermînî, pirtûka Dilawer Zeraq a çîrokan e. Ji şeş çîrokan pêk tê. Ji xeynî çîroka bi navê *Hêvîya Ezîz Beg*, lehengên sereke ên çîrokan hemû jî jin in. Çîroka yekem *Agirê Şermê*, bi pênaseyekê dest pê dike. Bi pênaseya goristanê. “Goristan: qonaxa dawîn a jîyanên ku payîz li wan bihurîye.” (Zeraq, 2016: 9). Jîyana ku payîz lê bihurîye a keçekê ye. Keça ku bi çenteyekî ve tê goristanê û bi helwesteke bêhemdî xwe li nav menzelan digere. Piştî ku ji cixareyê hilmeke kûr dikişîne ji çentê xwe şûşeyeke plastîk derdixe, şilavîyekê dirijîne mista destê xwe û du caran bi wî awayî şilavîyê li ser û çavên xwe dike. Piştî ku şilavîya mayî jî ji di ser milên xwe ve berjêr dike û bi ser xwe de dirijîne, ji erdê heste werdigire û berê xwe dide ber derîyê leşkergehê. Ji ber ku ew mêrê ku wê dilê xwe dayê û ji alîyê wî ve hatiye xapandin, leşkerek e; leşkerêkî ku piştî xapandina keçikê û bidestxistina hin tiştan ji navê winda bûye. “Heste di nav destê xwe de rast kir, tilîya xwe a mezin danî ser loxa wê, nêzî cilê xwe kir û bi jenandinê agir bi canê ciwan xist.” (Zeraq, 2016: 12). Gelo kîjan çand, gerdîş an jî kod dibe sedem ku jineke ciwan ji ber şerma hin tercihên xwe, hin tiştên ku jiyaye agir bi canê xwe dixê? Ew kodên nêrane ên ku li ser betanekî ava bûne dibe sedem ku ew keçik êdî wek herimî bê hesibandin. Ew canê ciwan a ku agir li canê xwe dixê, dibe qurbana kodên bi hezaran salan. Ji alîyê mêrekî ve tê xapandin û terikandin; lê belê dê alîyê hemû mêran ve were şermezarkirin, lomekirin û eybkirin. Dizane çi yê were serê wê; dizane ku, heke ew agir bi canê xwe nexê ew mêrên ku xwedîtîya jinan bi betanekî bi dest dixin dê wê heta hetayê şermezar bikin û dê her roj û dan agir li giyanê wê bixin. Kodên zayenda civakî ne; ku barê parvekirina jin û mêrekî tenê li stûyê jinekê dikin û ew kod in ku mafê bikaranîna jinekê didin mêrekî. Ew kod in ku ji bo mêrekî dibin rêya bidestxistina hin tiştan û piştî jî heqê jinavêwindabûnê, lê belê heman kod ji bo jinekê dibin sedema xeniqandina di behra şermê de. Loma jî ew jin, dê di nameyêke ku belkî jî dê tu caran negihîje xwedîyê xwe de, wiha bêje. “Ez ê vê şerma ku her kêlîya ku diçe pozê min dişewitîne, paqij bikim. Ez ê vê şermê bişewitînim... Bi agirê şermê.” (h.b. 2016: 16). Tam di vê qonaxê de hewce ye ku em balê bibin li ser serdestîya mêran a ku di demên şeran de pêk tê. Ew şerma ku dibe sedem ku keçik agir li canê xwe bixê, balê dibe salên nodî ên ku bi dehan keç xwe kuştin. Keçên ku

tenê bûn daneyên hejmarî û di dîroka mêran a serdest de çî aşkera çî kiraskirî hatin şermezarkirin. Keçên bênav, wek lehenga vê çîrokê.

Çîroka duyem, bi navê *Mirinek Nermijî Di Mesîla Evînê De* ye. Lehenga sereke a çîrokê dîsa keçîkek e. Digel keçîkê lehenga dî jî hemşîreyek e. Keçîka ku nivîskar jinanî ya wê, mêtîya wê, hestên wê bi gotareke jinane tîne zimên, çend meh e ji alîyê hin kesan ve li nexweşxaneyekê bêkesûkûs hatiye hiştin. Bi mehan e ku birînên ji alîyê kevirên ku lê hatine barandin ve hatiye vekirin, sax nebûne. Ne diaxive, ne dibişire, ne jî dijî. Bi saya hemşîre û doxtor rojbiroj, gavbigav, hêdî hêdî pak dibe. Hemşîre gava qala wê dike dibêje:

Xwezî, roja pêşî we ew bidîta; te digot qey hemû kevir û berên dinyayê lê barîyabûn... Xwîna wê, ku êdî ji herikîne westîyabû, mîna ku sînorê şerma mêtîyê diyar bike, xêz û xetên nexşeyî li ser rûyê wê nîgar kiribû. (h.b. 2016: 17).

Sînorê şerma mêtîyê çî ye, çawa û ji alîyê kê ve tê dîyarkirin? Gelo laşê ku kevir lê hatine barandin ji kîjan alîyê ve êşîyaye û xwîn jê çûye? Gava ku em guh didin dengê dilê keçîkê em dibînin û dibihîzin ku; a ku êşîyaye ne laşê wê ye, dilê wê ye. Ji ber ku, sedema rewşa wê a ku tê de ye jinanî ya wê ye. Ew sûc û gunehê ku bûye sedema kevirê barandinê, dîldayîna wê a li Adem bûye. Dil daye Adem û di bin sîya hezkirinê de dest daye Adem. Sînorên nêrane ên ku şermê û sûcdarkirinê dixê para jinê, jina ku dide pey hestên xwe mecbûr dimîne ku mirinê bide ber çavên xwe, gerdîşa ku ji hezkirinê jî ditirse, neçarîya ku li hember gerdîşa genîbûyî û hwd., hemû bi kodên zayenda civakî tîne honandin. Di vê honakê de tim jin e, a ku av lê nayê vexwarin. Sînorên ku ji alîyê bavkanîyê ve hatiye afirandin rê nade ku jinek hez bike, ji bo hez kirina xwe û hestên xwe tevbigere. Bavkanî nahêle ku jin bilive. Ji ber vê yekê ye ku belkî dengê hundirîn a keçîka ku kevirê barandine, yan jî rasterast dengê nivîskar, bi van peyvan digihîje xwîner. “Qedexe bû; tînegermîya hestan, qedexe! Alîyê mê a evînê... Qedexe! Mêtîya hişyarbûyî, qe-de-xe!... Evîna mê... Ji bo bend û bedenên qesra nêr, di nav kevir û tehtan de bûbû xerca zexmkirinê...” (h.b., 2016: 21). Wekî ku me bêrê jî diyar kiribû, zayend bîyolojîk e, zayenda civakî ji alîyê serdestîya nêrane ve hatiye afirandin. Loma jî tînegermîya hestan, alîyê mê a evînê, mêtîya hişyarbûyî, evîna mê qedexe ye. Ne ku zagonên xwezayê yan jî zagonên bîyolojîk wisa dibêjin, zagonên ku ji alîyê mêran ve û ji bo mêran hatine afirandin wisa dibêje û ji ber vê yekê jî mêtîya hişyarbûyî tê qedexekirin. Ji ber vê yekê ye ku

‘bedenên qesra nêr, di nav kevir û tehtan de bûbû xerca zexmkirinê’. Hezkirina jinê derî qanûnê ye loma jî ji alîyê mêran ve divê were cezakin. “...ji bo ku ji rê û rêçikên qayde û yasayan avarê nebin, bi badana simbêlên pereşûtî, li hev şewirîn.” Berginda cezayê divê layiqê cezayê be, loma jî mêrên ku xwedî simbêlên pereşûtî ne, biryara recmkirinê didin. ‘Jina ku wan ê tu car nikaribûna wekî wê hezbikirana’ ji alîyê wan ve di wî warê hanê de ku mirov dikare jê re bêje ‘Keviristan’, hatiye recmkirin. Hezkirina ku ji alîyê jin û mêrekî ve pêk hatiye tenê bûye sûcê jinê. Ên ku qayde danîne mêr in, ên ku qaydeyên xwe pêk anîne jî mêr in, ên ku jinên ku ji qaydeyên wan averê bûne dane ber keviran dîsan mêr in. Nivîskar bi zanetî û hişyarî ev hemû kodên nêrane dide ber hûrnihêrînan. Bi gotina “Çilkên rondikên veşartî, di bendên bindestîya hezaran salan re çizirîn...” serdestîya nêrane a bi hezaran salan û bindestîya jinê a bi hezaran salan dide ber rexneyê. Bi rexneya xwe, dike ku wan kodan birûxîne û bi awayekî dekonstruktîf dijberîya ku ji alîyê mêran ve hatiye afirandin berepaş bizivirîne. Rolên zayenda civakî ên li jinan hatine ferz kirin, neçarî kiriye para jinê, zordarî û serdestî jî kiriye para mêr. Wekî ku demên me diyar kiribû, Derrida têgiha “navendpeyv”ê, wek teorîya bavkanîyê ku jin tê de wekî “dîkeyekê” tê çibicîkirin, nixandîye û rexne kiriye û vê rexneya wî pêşî li femînîstan vekiriye. Tansu Bele balê dibe li ser toreyê û wiha dibêje. “Jin, bi fermana adet û qaydeyên mêrê serdest, ji bo xatirê evîna xwe, mecbûr e ku lalî û bêdengî û serjêkirina xwe qebûl bike. (Bele, 1998: 71). Ji ber vê yeke, em dikarin bêjin ku, ew jina ku ‘serê wê mîna mîyeke serjêkirî, kil dibe’ ne bi ziman û kodên nêrane heyî dibe, berevajîya vê zilm û zordarîyê, bi hezkirina xwe ya bi hestên jinane heyî dibe û dîsa ji ber vê yekê ye ku li hember kodên zayenda civakî dibişire. Bi mêtîya ku jiyanê heyî dike ve dibişire. Bi bişirînekê jî diçe.

Çîroka sêyem a bi navê *Bişirîna Şermînî* çîroka Şermînê ye. Şermîna ku ji alîyê jineke dî ve bi hevoka “Tu dibê qey ronahîya di nav tarîyê de heyî, bes ji bo şanîdana delalîya te ye...” tê pênasekirin. Şermîn û Gulbîn du heval in û berêvarekê li kafeyekê rûniştine. Ji ber ku Şermîn bi wechekî xerab û ne xweş rûniştîye, Gulbîn sedema rewşa wê a ku tê de ye meraq dike û wê dide ber pirsan. Piştî demekê Şermîn dest bi vegotina çîroka xwe û jinanîya xwe dike û xwîner pê dihise ku mêran çi anîye serê Şermînê. Mêrên ku Şermîn ji bo wan dibêje: ‘Mêr... Sedemên hemû pêxapandinên min...’ Cara ewil bi kodên mêrane û serdest, di salên xwendekarîya

lîseyê de Xelo derdikeve pêşberî Şermînê. Gava Şermîn xwendekara lîseyê ye rojekê xortek tê ber wê disekine û piştî pîrsa Şermînê -a ku rewşeke wisan lê qewimîye ku ji tirsan lê ye ziravqetî bibe- diyar dike ku ne ew lê Xelo ji Şermînê tiştêkî dixwaze. Ew xort di serî de sînoren Şermînê dide ber çavên wê. A ku ji Şermînê tê xwestin her çibe êdî, divê ne mimkun be ku bersiva wê 'na' be. Piştî Xeloyê porbiryantînkirî, şîqînî ji tizbîya xwe tîne û bi awayekî ku xwedîyê hemû jinan, daran, kolanan, esmanan be, ber bi Şermînê ve tê. Bi gotina '*Şermîn xanim!.. Agirê dilê min li te geş bûye. Ji îro pê de tu de'wa min î, te fam kir!*' Li benda bersiva 'erê an jî 'na' nasekine. Fermana xwe dide û piştî xwe dide û Şermînê û diçe. Ji wê rojê şûnde her roj piştî ku dibistan belav dibin, wekî ku xwedîyê Şermînê ye tê û heta kolana mala wê bi wê re dimeşe û her qala xwe, qala hevalên xwe; qala kirinên xwe û hevalên xwe ên wek şewitandina bavê kesekî, revîrevî ji wan deran çûyîna kesekî ku berî ku ew malik lê bikin mîrat; qala pîlanên xwe ên der barê zewacê de, kevanîtiya ku layiqê Şermînê dibine, dike. Xelo û mêrên wek Xelo, ên ku bi kodên serdestiya nêrane perverde bûne, pêşk û torêyên ku ji bav û kalên wan ji wan re wek kelepûr û mîrat maye, dike ku ew hê di xortanîya xwe de dest bi tevgerên mêrane(!) bikin. Mêrên wek Xelo hestîkotên zilma bi hezaran salan in. Loma jî hezkirina wan ji fermanan, parvekirinên wan ji axavtinên pesindayîna xwe pêk tê. Loma jî Xelo dikare xamatîya Şermînê, jinanîya Şermînê dîl bigire. Jiber ku xwedîyê jinan mêr in û hin ji wan meran, li ser navê hezkirinê jinan dîl digirin û hin jê jî wek bav û birayên xwe, heke bibihîzîn ku Şermînan bi mêran re tekilîyek danîye dikarin guh û pozê wan jêkin. Jin di nav van rolên zayenda civakî de ew qas tişte ye ku; jê nayê ku tu tiştî bike. Jixwe ne hewce ye tiştêkî bike û beje. Xeloyên ku bi fermanekê tên, dikarin, şimaqekî li bin guhê Şermînê jî lêdin û biçin. Ji ber ku Şermîn silav li pismamê xwe ê ji Swêdê hatiye dike û bi ser de wî hembêz û maç dike. Xwedîyê Şermînê, mêrê xas(!) Xelo, bi dîtîna wê rewşê re mafê şimaqlêdana li bin guhê Şermînê bi dest dixê. Şimaqa xwe bi gotina '*dêlik, ne hêjayî evîna min î!*' dixemilîne û Şermînê di rewşeke berepaşkîçûyî û serqûnkî lierdeketî dihêle û diçe. Ev mêranîya ku jîyanê diherimîne, jîyanê di ber jin de têdixê jehr, metirsî û xofa di dilê jinan de şîn dike û dibe sedem ku jin bi rewşeke quncifî li jîyanê bimînin. Dibe sedem ku jin her di bin sîya ew tîrsa ku dil û mêjîyê wê de cî girtîye, biçewise. Şermîn, bi hest û bawerîyên têkçûyî û çewisî dest bi zanîngêhê dike. Em gava guh bidin dengê dilê

Şermînê, em van gotinan dibihîsin: “Bawerîya min bi min jî, bi kesên dî jî nemabû. Min dikir nedikir nedikarî vê bêbawerîtyê bişikînim û têk bibim. Min dixwest, lê min nedikarî...Min her roj nalet li Xelo dibarand.” (h.b. 2016: 35). Piştî ku Şermîn Ajdayê nas dike, bi saya wê têkilî bi xort û keçên ku bi sîyasetê ve eleqadar in datîne. Êdî xwe wek berê tenê hîs nake. Di nav wê civatê de xortek heye ku bala Şermînê herî zêde diçe ser wî. Xortekî ku zêde ji xwe bawer e û di axavtin û tevgerên xwe de jî bi xwe ewle ye. Bi gotina Şermînê, xortekî mîna ku bêje ‘Hûn her yek ji masîyên deryaya min in...’ Jê û pê de Şermîn her tim bi wan re hevaltî dike. Ew û Seyîtxan hema bêje her roj digihîjin hev û tev li hevalên xwe dibin. Şermîn, a ku dilê wê roj bi roj, gav bi gav bi Seyîtxan ve tê girêdan, dibêje qey di rûyê hevalên Seyîtxan de têkilîya wan a evîni aşkera nabe. Hezkirina wê a bi awayekî yekalî, her ku diçe di dil û hundirê wê de difetise. Lê Şermîn êdî ne ew jin e ku ji alîyê Xelo ve hatibû çewisandin. Seyîtxan her çî qas mirovekî zana û hişyar be jî, li gorî Şermînê car caran tiştên şaş û eletewş jî dike û dibêje. Di demên wisa de Şermîn tev li axavtinê dibe û gotinên wî pûç dike. Di wan deman de Seyîtxan bi awirên hişk li Şermînê dinihêre. Bivênevê ev rewş bi xwe re pîrsekê jî dixê hişan. Çima û bi çî mafî Seyîtxan awirên hişk li Şermînê dinihêre? Otorîteya wî a mêranî a ku ne ji zanîna xwe lê belê ji rolên xwe yê zayenda civakî vergirtîye, hildiweşin. Divê Seyîtxanê xwende û zana ji Xelo cihê bifikirîya û tevbigirîya; lê ew rolên ku bi kodên xwe yê serdest mêr dorpêç kirine, nahêle ku Seyîtxan gavek be jî ji Xelo pêşdetir be. Şermîn êdî ji awirên wî jî ditirse. Di wan deman de tu hevaleyê jî piştgirî nade Şermînê. Jixwe rojek tê Seyîtxan heqereteke a ku ji ya Xelo ne kêmtir e li Şermînê dike. Di civatekê de, ji ber ku Şermîn henekek li Seyîtxan dike, Seyîtxanê awirtûj ê ku Xaloyê hevalên xwe ye, bi awayekî kef û kunc bi dev ketî, radibe li ser pîyan û dest bi axavtinê dike. Îdîa dike ku Şermîn ji bo hevaltîya dilnî a Seyîtxan ketiye nav civata wan, derdê wê tenê mêr û hezkirina mêran e. Divê Şermîn di wê civatê de hezkirina xwe bide ber rexneyan. Ji ber ku di rûyê jinên wek Şermînê, ên ku aşiq û mirîyê mêran in, evîna rastî nayê famkirin(!). Şermîn vê kêlîyê bi van hevokan tîne zimên:

Wî got û hey got. Hemû kul û êşa xwe ên ku heta wê gavê di hundirê xwe veşartibû, rijand; evîn û hezkirina min da ber lêpîrsîn û darazan; û kir ku ji ar û rûmeta xwe a jinane şerm bikim... (h.b. 2016: 41).

Ew kêlîya ku dibe sedema têkçûyîna hestan, têkçûyîna hêzê û jixwebawerîyê, careke dî baskên Şermînê dişikêne. Kodên zayenda civakî ên nêrane nahêlin ku jin hez bikin, dest bidin hezkirîyên xwe, fikr û ramanên xwe bînin ziman û xwe heyf bikin. Her çî awayî dibe bila bibe, divê bi her awayî serdestîya mêran a li hember jinan bidome. Berdêla vê serdestîyê her tim cezakirin û biçûkxistina jinan e. Hestên jinan gava dibe benîştê devê kesan ew jin di nav civakê de bi awayekî hêvîşikestî dijîn û ji ber vê yekê ye ku Şermîn nizane ka evîn çî ye, bi çî awayî tê jiyandin. Loma jî gava cara dawî dilê wê dikeve mêrekî dî, haya wê ji tevger û tercîhên wî mêrî çênabe. Bi dilekî sax tevdigere, heta ku wî mêrî bi mêrekî dî re di nav cîyan de dibîne. Şermîn mîrateya ku ji Xelo û Seyîtxan jê re maye baskên xwe carek dî ber bi xeletîyekê vedike. Û bi bişîrîneke şikestî û şermînî dimîne.

Çîroka pêncem a bi navê *Lihêfa Şevê* ye. Bi vebêjîya jineke hemşîre dest pê dike. Jineke ku li hember hemzayendên xwe xwedî zimanekî hişk û nêrane ye. Bi darazên hişk qala jinan dike. Ew şev li nexweşxaneyê nobedar e, ji ber ku fikr û ramanên ku didin pey hev nahêlin di xew re biçê, dest bi xwandina pirtûkê dike. Di vê navê de du mêr keçikekê tînin wir û jê pîrsa doxtor dikin. Her du mêr polês in û diyar e ku keçika teşexweş jî ne jina yekî ji wan e. Keçik ji bo muayeneyekê anîne nexweşxaneyê. Piştî ku hemşîre wek adetî çend pîrsan ji keçikê dike hîn dibe ku keçik hê panzdeh salî ye û li taxeke xizan a ku li derveyî bajêr e dijî. Li kafeyekê wek qasedar dixebite. Gava ew hê heft salî bûye bi darê zorê ji gund hatine derxistin, gundê wan hatiye valakirin. Bavê ku di însatan de xebatkar bûye, ji qata çaran ketiye û ji wê rojê pê de di nav cîyan de kût û ketandî maye. Wan çaxan keçik di pola sêyan de xwendekar bûye. Gava hemşîre jê dipirse ka wê çima xwe xistîye vê rewşê, keçik bi vî awayî wê dibersivîne: “Sê xwişk û du birayên min ên ji min biçûktir hene; tazî û birçî... Bi tenê heqdesta qasedarîyê debar û îdara me nabe. Ku tu bî, tu yê çî bikî...?” (h.b. 2016: 66). Keçik bi van gotinan kodên hemşîreyê, a ku xwedî pêşdarazan e, dişikîne. Ji ber wê ye ku jina hemşîre dilê xwe pê dişewitîne û pîrsekê ji xwe û ji me dike. ‘Rewşa keçikê eyan beyan bû. Lê ên din? Lê em? Lê ez? Lê dêya wê?’ Keçik hê panzdeh salî ye lê ji alîyê xwedîyê qafeyê û bi şirikîya polês, ji alîyê dêya xwe ve û ji alîyê hemû civakê ve tê firotin û bi ser de jî ji ber ku nebe bela serê tu kesî her kes dîdevanîya betanê keçxamatîyê dike. A ku tînin serê wê, anîne serê wê ne girîng e. Jiyan a ku lê kirine jehr ne girîng e; a girîng ew e ku divê betanê keçxamatîyê

saxlem bimîne. Lihevkirina civakê a ji bo betanê, mixabin, ji bo xwedîkirina çend zarokên sêwî û malbateke xizan pêk nayê. Ji ber ku rolên zayenda civakî ên nêrane û hînbûyî bi firotin, dîkekirin, biçûkxistina jinê jin di civakê de cî bi cî kiriye. Çi panzdeh salî çî jî çil salî, ji bo serdestîya nêrane û bavkanîyê ne girîng e. Jin di nav rolên zayenda civakî de wisa hatiye cîbicîkirin. Gotina Sîmone De Beauvoir, a “Mirov wek jin nayê dinyayê, mirov piştêre dibe jin.” rewşa ku keçika panzdeh salî tê de ye bi her awayî dide ber çavan. Rexneya femînîst a wêjeyî herî zêde li ser gelemşeya çand û bavkanîyê hûr sekinîye ji ber ku jin di gerdîşê de wekî ku bi mêr re ne di astekê de ye hatiye cîbicîkirin. Serdestîya nêrane bi hezaran salan ji bo jinan nekesayetbûn û cîbicîkirina digel mêrekî raberî jinan kiriye.

Çîroka dawî a pirtûka Bişîrîna Şermînî, a bi navê *Jiyek Cemidî Di Hembêza Tîrmehê De* ye. Keçikek ji dengê eksoza erebeyekê ew qas ditirse, ew qas ditirse ku qîjîni jê diçe. Li ber dikanekê xwe serqûnkî diavêje erde û li ber dîwarê dikanê xwe li hev diquncifîne. Digel xirexir û fişînê dilerize. Qasek şûnde ji dikanê mişterîyeke jin derdikeve. Mîna ku cinê hesin dîtîye di cîyê xwe de ecêbmayî dimîne û di dilê xwe de dibêje ‘Herhal ev jî nû ye...’ Bi awirên bizdok lê dinihêre, bi tevger û gavên şareza jî ji wîr dîr dikeve. Dikandar ji tevgerên mişterî dikeve şikê û derdikeve derve. Tiştê ku dibîne li xweşa wî naçe, dilê xwe tehl û tirş dike. Li dora keçikê diçe û tê, li ser serê wê disekine, gava dibîne ku dawa kirasê wê heta qorika wê kişîyayî ye, dilî wî dibije goştê spî ê çîpê xurt. “Xwest ku hema di wê gavê de vê bedena ter û ciwan bistîne binê xwe, têra xwe wê biçiqîne, ji xweşîyê bilerize û di ava hênik a vê xweşîyê de avjenîyê bike.” (h.b. 2016: 69). Ev xwestekên gemarî û qirêj pêk nayên ji ber ku keys tune ye. Xwedî dikanê ji nişkê ve lingê xwe î rastê hildide, heta jê tê pihîn li qorika keçikê dixê. Keçik bi vê pihîni di cîyê xwe de dilerize. Keçik mîna pîsikeke bi tirs ji wir dipengize û di bin baranê de ji kolanan derbasî kolanên din dibe. Zilamekî qeşeng ku cil û bergên li gorî modeya dawîn li sere, gava di ber keçikê re derbas dibe belxema xwe vedirêşe ber pêyên wê. Bedoyê dîn tiranê xwe lê dike. Keçik tê li parkê rûdinê. Dûre du keç di ber wê re derbas dibin, ji wan yek bi awayekî rûtirş lê dinihêre û dibêje ‘Xwedê nokan dide kesên bêdiran!..’

Gotina “Mirov wek jin nayê dinyayê, mirov piştêre dibe jin.” Wek hemû jinan ji bo wê keçikê jî têbor e. Mêrên ku bi jîpek û du kamyonan têne gundê wan cerdevanîyê li bavê û ên din ferz dikin. Malbat biryara koçkirinê hildide. Mal tê

berhevkin, dê ji warê bav û kalan biçin. Piranî mêtên gund çek hildane û bi wan çekan pesnê xwe didin, simbêlên xwe ba didin. Rojekê keçik diçe ber çem û pûngan berhev dike. Xeyala bajêr dike, li ser xamatîya ku zorê dide laşê xwe difikire, bi hestên geş û şîrîn û di hemdê xwe de, li ber devê cem rûdinê. Qasek şûnde li hember, ji nav newalê kesek ber bi wê ve tê. Piştî demekê, Ehmoyê kulek, kurê Mala Çavqelişîyan, li ber wê xuya dibe. Ehmoyê ku tifing ji lingê kulek re kiriye destek ji kanîyê av vedixwe, rûyê xwe dişo û lûleya tifingê keçikê bi pêş de dizixtîne û bi dengê hişk ferman lê dike. Dibêje, eger keçik dengê xwe derxe, ew ê wê li wir bike term. Laşê ku mîna çêlika çivîkekî, hawara ku di hundirê wê de difetise, keçanîya ku li ber bihara xweye, xeyalên koçkirina bajêr, zaroktî, jinanî hemû di bin Ehmoyê kulek de diherime, dimire, laşê ciwan di bin Ehmo de dipelixe û ‘hemû tînegermîya hestên jinane bi hilma sar a Ehmo hêdî hêdî dicemide û seqem digire.’

Jina mişterî, xwedîyê dikanê, zilamê ku cilên xweşik li xwe kiriye, Bedo, keçên ku ji parkê derbas dibin hemû alîgirê Ehmo ne. Çendî ku xwe wisa nehesibîn in ji ew nihêrîna ku bi awayekî bîzê wan ji wê diçe li wê dinihêrin, ji Ehmo ne kêmtir in. Ew fersenda ku dikeve destê Ehmo, ji bo wê rojê, bi destê dikandar nakeve. Her kes li hember keçikê Ehmoyek e; ji ber ku her kes bi kodên zayenda civakî, ên ku jin herimandine û avêtine alîyekî, tevdigerin. Keçika ku aqilê xwe winda kiriye ji bo hemûyan pîs û pelas e. Wekî ku Kiristeva û Jung ji bo hemû dervemayîyan çi nijad, çi zayend, çi çermreşî û hwd. têgiha ABJECTIONÊ (pîs û pelas) bi kar tînin, em dikarin bêjin ku ji ber ku kom û kirde dixwaze tiştên ku sînorên wî tehdît dikin ji xwe dûr bixînin, keçik ji hemû jiyanê dûr hatiyexistin. Keçxamatîya ku dibe qurbana Ehmoyê kulek û simbêlên badayî, derîyekî li ber civakê, li ber mêran vedike, ne ku digire. Êdî ji bo hemû Ehmoyan, ew jin tiştêyek e û kîngê dilê wan biçê dê bikaribin bi kar bînin. Keçika ku bi şev jî li parkê dimîne, di bin darên bîyê de di xew re diçe. Xortê çîpxwar, bi gavên xaromaro ber bi darên bîyê dimeşe, bi çiqê di destê xwe de dawa kirasê wê hinekî hildide jor û bi awirên harbûnê li nav şeqan dinihêre. Şûtika xwe ji navtenga xwe derdixe, pê destê wê girê dide, destê xwe ê rastê datîne ser devê wê û bi şelpe şelpe şorika devê xwe, bi dengê pistînî gazî mêtên dî dike. Dibêje: “Kuro zû... haydê lez kin! Îşev bê derpê ye...” (h.b. 2016: 75). Çima hemû mêt, bi çavê kelûmel û tiştêyek ku ew dikarin tecawizê wê bikin li jina ku derdikeve kuçe û kolanan dinihêrin? Ji ber ku şidet ne gelemşeyeke patolojîk e; divêtîya rolên zayendî

ye ku îqtîdara mêrê serdest ew heq daye mêran. Ji ber ku yek ji wan qadên meşrûkirî ên vê şîdetê ye. Tacîz, tecawiz, lêxistin, cezakirin, biçûkxistin ji vê meşrûyeta çêkirî tên, ne ku ji rolên xwezayî. Ji ber vê yekê ye ku Zeraq, van mêran bi ziman û kodên ku ji alîyê wan ve hatiye çêkirin, dişayesîne. Bi badana simbêlan, bi keflidevanketinê, bi şelpe şelpe şorika devan, bi xeyalên gewîbûyî, bi wijdanê ku li hember arezûyan têk çûye, şayes dike. Zeraq, bi awayekî dekonstruktîf ew zimanê nêrane, ê ku ji hezaran salan bi vir de ye ji bo temsîliyeta mêran û mêranîya wan hatiye bikaranîn, daye ber rexneyê û li deconstructionê xistiye.

Romanên Dilawer Zeraq ji sêyîneyekê ên bi navê *Şevên Winda Wêneyên Meçhûl*, *Mirina Bêsi*, *Nexşên li Giyan* pêk tên. Romana yekem a Sêyîneya Winda, *Şevên Winda Wêneyên Meçhûl* e. Şevên Winda Wêneyên Meçhûl bi vebêjîya Yasemînê dest pê dike. Yasemîn ji navçeyeke ji Anatolya Navîn bo perwerdehiya zanîngehê hatiye Stenbolê. Xwendekara pola yekem a beşa hiqûqê ye. Ji ber ku pereyê ku bavê wê ji wê re dişîne têra wê nake di kafeyekê de wek qasedar dixebite. Bavê ku pir girîngî daye perwerdehiya keça xwe, nehîştîye ku Yasemîn biçê di karê kulbekirin û hilqetandina silqan de bixebite. Yasemîn, nêzî mehekê ye di kafeyê de wek qasedar dixebite, ji nehê sibehê heta nehê şevê, bi bişîrîneke ji bêgavîyê, bi berbendkirina hemû hêrs û hestên xwe yê jinane, duçarî awirên tacîzkar û gotinên rûşûştî yên muşteriyên tê û di vê rewşê de dixebite da ku bikaribe bixwîne. Tacîza awirên mêran ku ji bo mêran wek mafekî normal nehatiba hesibandin, Yasemînê jî mecbûr nemaya ku hêrs û hestên xwe yên jinane berbend bike. Yasemîn ji kafeyê, bala xwe dide meydana ku di navîna kolaneke dipdirêj de ye û li jinên ku her roja şemîyê tên û li wê meydanê dicivin, temaşe dike. Ew roj tiştêkî cihê diqewime û polês bi tundî mudaxaleyê civaka jinan dikin. Jineke ku di nav wê qerqesûnê de çok daye erdê û polêsên ku bi pihînan û bi copan bêrawest lê dixin bala Yasemînê dikişîne. Ew jî jî piştî lêxistina ku wê ji hal dadixe, bi livên bêtaqet li tiştêkî digere, dûre du wêneyên çarçovekirî ji erdê werdigire û bi gavên neçar ber bi alîyê ku jin hatibûn ve dimeşe û diçe. Çîroka Yasemîn û Seyranê bi vî awayî dest pê dike. Yasemîn êdî rojên şemîyan li ba Seyran û jinên din beşdarî çalakîyên Dayikên Roja Şemîyê dibe. Xwîner, çîroka Seyranê bi şahidîya Yasemînê hîn dibe û Seyranê nas dike. Gava ku Seyran hê keçeke xama ye û li gundê xwe diçe dibistana navîn ew û Faris dil didine hev û dibin delalîyê hev. Faris dibêje ez ê xwezgînîyan bişînim bo te

û şevêk xwezgînîyên Seyranê, mêvanên xêrê tîn mala bavê wê. Seyran ew şev ne ji bo Faris; lê belê bo Sevdîn, birayê mezin ê Faris ji bav tê xwestin. Seyrana ku li benda xwezgînîyên Faris e haj pê tune ye ku bo Sevdîn tê xwestin. Gava diya wê jê dipirse, Seyranji wan re dibêje: “Hûn dizanin.” Ew çand, a ku jin bêfrade hiştiye, pêk tê û ew ên ku ‘dizanin’ û dewsa jinê biryar didin, wê şêvê li beramberî du çêlek û pênc pezan Seyranê didin Sevdîn. Ew şev qewlê jiyana Seyranê tê birîn. Faris, ji navê winda dibe, Sevdîn û Seyran dizewicin, Sevdînê ku tu caran dilê Seyranê naşikîne û her tim li hember Seyranê bi awayekî rêzgirtî tevdigere, demek şûnde ji derîyê dilê Seyranê dikeve hundir. Seyran ji mêrê xwe hez dike, du zarokên wan tîn dinê. Lê kêfweşî û bextewarî zêde nadome. Şevêk leşker diavêjin ser mala wan û Sevdîn hildidin dibin. Wekî ku Sevdîn dibe hîva bin ewrê wisa winda dibe û diçe. Sê mehan bêsekn û rawest li Sevdîn digerin, komele, cih û qereqol namîne ku pirsê Sevdîn lê nekin. Piştî sê mehan navê Sevdîn jî tev li navên windayan dibe. Piştê, Faris di sarîya sibehê zivistanê de, li derîyê malê dixê û vedigere. Seyran êdî ne ew keça xama ye. Salên ku bi Sevdîn re derbas kiriye, ew pijandiye, jintîya wê hînî wê kiriye, hezkirina Sevdîn xistîye dilê xwe û dayika du zarokan e. Lê li gorî civakê û gerdîşê divê jina bî bi birayê mêrê wê ê ku di malde ye re were zewicandin. Piştî liberdana dayika Sêvê, mezin û rêspîyên gund, Faris mecbûr dimîne û bi jinbira xwe re dizewice. Nivîskar vê rewşê bi wan hevoka tîne zimên. “Faris, bi qasî demekê li ber xwe da, lê ew jî zêde li hember daxwaza diya xwe, li hember edet û toreyên ku Xwedê pê dizane ka jiyana çend jinan tê de genî bûye, nesekinî.” (Zeraq, 2005: 57). Rolên zayenda civakî ên ku tu alternatîf danayîne ber jinê, bi qanûnên gerdîşê jinê bêfrade dike û jin tê xwestin, ji bo wê qelend tê dayîn, bi rîtueleke mêrane ji alîyê mêrekî ve radestî mêrekî tê kirin, ji ajalên ku ji bo qelendê wê tê dayîn jî bêqîmettir dibe û bi ser de mecbûr dimîne bi tîyê xwe re dizewice. Bi gotina Seyranê ve, her tişt wekî berê, bêyî ku heqê wê hebe ku tiştêkî bêje û bikaribe kartêkê lê bike, li ser navê wê diqewime û ji alîyê melê gund û rûsipîyê malbatê ve, bi xelat û berginda zêrekî reşadî; bi xwarina şîvê û xwendina mewlûdekê li Faris tê mehrkirin. Ev erzanîya ku bi zêrekî û bi merasîmeke nejidil pêk tê û layiqê jinê tê dîtin kana xwe ji serdestîya nêrane a civakî werdigire. Pê re jî hemû heqên şûtîyê yên Sevdîn dibe yên Faris... Jina ku di bin heqê şûtîyê de wek tiştêyek virde û wêde tê kişkişandin mecbûr e ku rolên jintîyê qebûl bike. Jixwe rolên zayenda civakî, ên ku ji alîyê mêran ve bi

hezaran salan de hatine avakirin, ji bo jinê li gorî berjewendîyên xwe jiyane saz kirîye û ew jî di wir de bi cî kiriye û jê re qadeke livînê jî nehiştiye. Tiştê ku ji destê jinê were nemaye. Jina ku bi her awayî ji alîyê rolên zayenda civakî hatiye dorpêçkirin mafên xwe yê zayendî jî winda dike. Ne bi dilê xwe û ji ber hezkirina xwe yan jî ne ji ber hewcedarîyên xwe; ji ber rolên çandî û jinane a ku sînorên wê ji alîyê serdestîya nêrane ve hatiye diyarkirin, dikeve nav cîyên mêran. Mehrê ku ji alîyê melê gund ve hatiye birîn bes e, ne hewce ye tê de hest û ramanên jinê hebe. Seyran, dibe jina Faris. Seyrana ku ne dengê Sevdîn ê nerm, ne hezkirina Sevdîn a germ, ji bîr nekiriye, her bi xeyala wî dijî, dibe jina Faris. Şevkê dîsa leşker diavêjin ser gund. Faris ne li malê ye, Seyran bi ducanîya heft mehan e. Dengê guleyan, qedexeya derketina derve, xofa ku ji şeva birina Sevdîn pê de ye ketiye dilê Seyranê, qolincên zayînê ku di wê şeva bêyom de musalatê canê wê bûne û her tişt ji bo Seyranê şeveke reş amade dikin. Dengê lêdana derî a bi qûndaxa çekan û pihînan ve jiyana ku qewlê Seyranê a ku her tim ji alîyê mêran ve hatiye birîn reş dibe. Dayika Sêvê deri li wan vedike, dikevine malê, di çend deqeyan de malê serûbin dikin û dûre jî pêşî ji dayika Sêvê, paşê jî ji Seyranê pîrsa Faris dikin. Qomitanê ku ji bersiva “nizanim” hêrs dibe; kef û kunc bi devê wî dikeve, çav lê sor dibin bi hişkî Seyranê paş ve dehf dide û li bin guhê dîwêr dixê. Bi çûna leşkeran re, tiştê ji nava Seyranê diqete, qolinc û jandana zarokanê têne wê û tenê bi alîkarîya Dayika Sêvê zarokê xwe yê sêyemîn, kurê Faris tîne dinê. Serê sibê Faris vedigere malê, navê kurê xwe Çîyager lê dike, bi rûyekî geş û devliken mizgînîya ku Seyranê dayê, dide ser serê xwe û çavê xwe. Kêfxweşîya neçaran û bindestan tu cara zêde nadome, sê roj şûnde leşker dîsa diavêjin ser malê û Faris hildidin û diçîn. Di vê navberê de dergûş nexweş dikeve, Dayika Sêvê ji neçarîyê berê xwe dide mala apê Faris ê ku neyartî li wan dike. Ji ber ku gava Sevdîn li leşkerîyê vedigere li gorî adet û toreyan tevnagere û dewsa daxwaza dotmamê, xwezgînîyan dişîne pey Seyranê, neyartî dikin û li gorî gotina wan jî ku heta niha wan dest nedaya ber, Farisê jî dê ji zû ve bûbûya winda. Dayika Sêvê, Seyran û pismamê Faris, ê ku li bajêr lîseyê dixwîne, zarok digihîjinin nexweşxaneyê bajêr. Lê ji bo dergûşê jiyana ku di şeveke bêyom de dest pê kiriye zêde nadome. Zarok piştî yazdeh rojên ku di nav kuvazê de dimîne, diçe ber rehma Xwedê. Jina ku ji her alî ve hatiye dorpêçkirin, ji her alî ve jî winda dike. Barê jiyane, ê ku xeta wî ji alîyê mêran ve hatiye xêzkirin, her tim li ser piştê jinê ye. Piştî

van hemû bobelatan ji ber ku leşker her tim diavêjin ser mala wan û Faris dibin qereqolê, mecbûr dimînin û rojekê koçî bajêr dikin. Li taxeke ku nîşteçîhên wê, mîna wan in û ji mirovên mecbûrmayî pêk tên, xanmanekî peyde dikin û dest bi jiyana nû dikin. Bi qasî sal û nîvek şûnde Seyran keçikekê tîne dinê, pala xwe didin hev, bi hebûna hev tiştên ku jiyane ji wan texsîrkiriye tamam dikin. Şevê... derîyê wan bi kulman û pihînan tê lêdan; vê carê çar kesên ku ne cilên leşkeran an jî ên polêsan li wan e, çar kesên ku cilên sivîl li xwe kirine Faris dibin û çîroka Seyranê, a ku dide dû şopa windayên xwe, car din dest pê dike. Sevdîn dibe heyva bin ewran, Faris jî dibe ava berfê dihele û diçe. Loma jî, çîroka Seyranê, a ku em bi şahidîya Yasemînê û bi vebêjîya Seyran û Yasemînê pê dihîsin û hîn dibin, li Stenbolê û li wê meydanê dest pê dike. Dayika Sêvê û Seyran Dayikên Roja Şemîyê ne û her hefte ji Amedê radibin û diçin Stenbolê ku pîrsa windayên xwe bikin. Pirseke bêbersiv mayî... Dinyaya ku ji alîyê mêran û serdestîya mêrane ve hatiye sazîkirin, barekî din jî dide ser piştê Seyranê. Seyrana ku ji roja roj de ye nekaribûye bi xwestek û îradeya xwe rêya xwe diyar bike û her tim mecbûr maye ku li ser rêya ku dane pêşîya wê bimeşe.

Romana duyem a Sêyîneya Winda, *Mirina Bêsi* ye. Lehengê romanê ê sereke Hogir, bi navekî din Mîrza, bi navekî din Wî û bi navekî din Merwanê dewrimcî ye. Sê kes, yek jê kej û çavdûçikî, yek jê girs û keledirêj, yek jê reşik û kinik, şev nivê şevêkî li derî dixin û vê carê bi solan nakevin malê, malê serûbin nakin, tenê dixwazin Hogir cilên xwe li xwe bike û bi wan re biçê. Hogir, li Xangul xanima hevsara xwe û li her du kurên xwe dinihêre û bi wan re diçe. Ew çûyîn dibe destpêka şikenceyê û kuştina bênav û deng. Du roj şûnde, di bin pîra ku xeta trêne di ser re derbas dibe, gundî cendekê dibînin. Cendekê ku yek li serî, bi temamî heşt gule berdane canê wî, ji alîyê polêsan ve wek mirovekî bêkesûkûs tê hesibandin û di goristana bêxwedîyan de tê veşartin; dûre diyar dibe ku ew kes Hogir e. Bi beşdarbûna deh hezaran kesan, xwedîtî lê çêdibe û cinazê wî ji bo veşartinê tînin Amedê. Serokê Partîya Gel û Kedê ê Amedê, ew roj bi xwe re hejmarek mirovên ku xwedîtî li wî kiribûn dibe. Mirovên ku di bin guleyan de can û ruh didin, dibin mêvanê Hogir. Xwîner, çîroka Hogir bi awayekî pîralî û pîrvebêj hîn dibe. Narîna ku di ciwanîya xwe de ew di komeleyekê de nas kiriye, bûye hevala wî, bûye delalîya wî; hevsera wî Xangul xanim; vebêjê nivîskar, zarokêkî sêzdeh salî, xortekî ku pismamê Hogir e, mirovên ku der heqê wî de bihîstînin û şahîdîyên xwe bi hev re

parve dikin, Hogir bi xwîner didin nasîn. Ev roman her çi qas romana çîroka Hogir/Mîrza be jî pê re jî romana çîroka Narînê ye jî. Ev berhem ku em dikarin bêjin xwedî tezekê ye, berhemeke wisan e ku, tê de, hemû tezen ku di berhemên Zeraq ên dîtir de bi awayekî aşkera an jî kiraskirî hatine danîn, aşkeratir û zelaltir hatiye gotin. Ji ber ku nivîskar bi awayekî hişyarî, hê berîya salên heştê, li Farqînê, keçên xwendekar ên lîseyê di komeleyekê de li rex mêran şayes dike. Ji xêncî Narîn û çend keçên din tu kes keçên xwe naşînin lîseyê. Bavê Narînê, ê ku mele ye û mirovekî pêşverû ye, keça xwe dide xwendin. Bi ser de ne bav ne jî birayên Narînê wek mirovên ji rêzê tevnagerin û li hember azadîya Narînê bi hurmet tevdigerin. Narîn ji hevala xwe Zêrînê dibihîze ku Mamoste Filît li komeleyê dursa zimanê Kurdî dide û ev agahî dibe sedem ku Narîn biçe komeleyê. Mamoste Filît yek ji cîranê wan e ku mala wan di heman kuçeyê de û bi çend diwaran bi hev ve ye. Perwerdehîya zimanê Kurdî coşeke bêhempa dixê dilê Narînê, ji ber ku bavê Narînê ew kes e ku ji bernavê xwe î melatîyê bêtir girîngî dide Kurdbûna xwe. Civînên ku li komeleye çêdibin, perwerdehîya ziman, pêvajoya ku hem bi awayekî hişmendî hem jî bi awayekî pratîk ber bi guherînan diçe û Narînê jî bi xwe re kaş dike. Narîn di wan şert û mercan de Mîrza nas dike. Bi awayekî veşartî be jî dibin delalîyên hev, çima ne aşkera, ji ber ku her çi qas bavê Narînê, birayên Narînê ne kesên paşverû bin jî, civak û têkilîyên di nav civakê de bi kodên zayenda civakî pêk tên. Loma jî rojek tê Narîn jî ji vê çandê para xwe hildide. Xwezginîyên Narînê ên ku dostên bav û kalanên bavê Narînê ne tên xwezginîya Narînê. Birayê wê Nadir û Narîn her çi qas pêyên xwe bidin erdê jî mixabin li hember lihevkirina civakê têk diçin. A balkêş ew e ku di nav wan rolan de kesa ku herî zêde xwedîtî li rolên zayenda civakî dike dayika Narînê ye. Narîn gava piştî sal û deman qala wan rojan dike wiha dibêje. “Ne ku kalê te û xalên te nedihîştin. Na. Lê pîra te piçekî zêde guh dida derûdorê û galegalên wan.” (Zeraq, 2011: 103). Ji ber ku jineke ku di bin sîya mêranîya serdest de hatiye çewisandin, hemû hînbûyînan wê bi pergala civakê hatiye dorpêçkirin, bi tîrsa ji ber civakê çêbûyî, tevdigere. Di wê tîrsê de agahîyeke kiraskirî, a ku herî zêde jin wê dinasin, heye. Ew jî barê jinbûnê ye; ku qewimîneke xirab –bi kodên zayenda civakî- çêbe barê wê dê her tim li ser piştê jinê be. Dayika Narînê, a ku hemû zanîna wê û zanava wê ji alîyê civakê ve hatiye diyarkirin, bi kodên xwe keça xwe diparêze. Wekî ku me gotibû, ev berhem ku em dikarin bêjin xwedî tezekê ye; bi hin gotin û bi hin jiyînan

armanca teza xwe a ku daye ber xwe pêk tîne. Ew armanc ev e; hewl dide ku, bi awayekî, rolên zayenda civakî bi hemû qirêjîyên xwe ve bide ber çavan û digel wê jî hişmendîyeke nû ku jin tê de azadtîr û serbixwe were temsîlkirin, biafirîne. Ji ber vê yekê ye ku di civîneke ku li komeleyê pêk tê de, ev tespîta dîrokî tê kirin. Li ser pêşketina jinan û neşikîna hin qaydeyên hişk ên feodalîyê axivîne û dîtina xwe kêm zêde li ser desthilatdarîya mêran danîne û gotine “para mêrên Kurdan a di berdewamîya vê kevneşopa ne durist de zêde ye û hetera wan a di vî warî de jî dike ku tu derizîn di kevneşopîya heyî de çênebe.” (h.b. 2011: 107). Rolên zayenda civakî û kevneşopîya ne durist a bi desthilatdarîya mêrane heyî dibe, ew qas bi kokên zexm û xurt xwe heyî dike ku Zêrîna ku hevala Narînê ye, di wê civînê de mêrên şoreşger jî dide ber rexneyan û dibêje;

... gava dîlaneke hevaleyê şoreşger jî çêdibe, ew tu destkarî li daweta xwe nake û dawet bi qaydeya hatî danîn, li ser kêf û zewqa mêran tê kirin û ji jinan re dimîne, li ser banan temaşekirina kêfêkirin û govengerandina mêran û pijandina xwarinê û kirina xizmet û suxreyê. (h.b. 2011: 107).

Ew para mêrên Kurdan ên ku hetera wan a di vî warî de jî dike ku tu derizîn di kevneşopîya heyî de çênebe bi awayekî gavên biçûk be jî hêdî hêdî diderize. Qet nebe di hişmendîya çend jin û mêrên xort de, di tercîh û jiyîna Narînê de û di mezinkirina Narînê a keça xwe ya bi navê Arîn de têk diçe û hin kodên desthilatdarîya mêranê diderizin.

Romana sêyem a Sêyîneya Winda, *Nexşên Li Giyan* e. Honaka romanê bi awayekî hatin û çûyîna di navbera du deman de pêk hatiye. Hatîn çûyîneke di navbera demên zaroktîya çend keç û zarokên kurîn û demên îroyîna wan. Roman jî donzdeh binsernivîsan pêk tê. Ew binsernivîs li ser sê hîman ava dibin. Demên ku hê zarok in û li kolanan bi hev re dileyîzin; demên ku her yek xwedî ramanekê ye û li gorî wê fikr û ramanê tevdiger in; û demên piştî çûyîna, windabûna, mirina zarokên xwe kezeba dayikan a ku dibe warê şewatê. Ji ber vê yekê ye ku navê sernivîsan bi vî awayî ye: *Yarî (I)*, *Biryarî (I)*, *Yarî (III)*, *Kiryarî (II)*, *Yarî (II)*, *Hevalyarî*, *Yarî (IV)*, *Kiryarî (I)*, *Dilbiyarî*, *Biryarî (II)*, *Giyanname (I)*, *Giyanname (II)*. Roman bi lîstika çar keçikên pênc şeş salî ku li kolanê ne dest pê dike. Bi zimanekî zarokane sê keçik gazî yeke din dikin û piştî destûrdayîna Xaltîya Xecê, Menîce jî tev li her sê keçikên din dibe. Menîce, Seyran, Fîrûzan û Durdane di navbera xwe de dikevin gengeşiyê

ku biryar bidin ka gelo ew ê bi malokan, bi teytokê, bi zirnaziqê, bi heftokê... kîjan lîstikê bileyîzîn. Ji ber ku Menîce ji hemûyan biçûktir e, ew çî dibêjin li hember wan nazîyan dike. Dawîyê de biryara lîstina lîstika malokan didin û dest bi lîstinê dikin.

Du zarokên kurîn jî di serî de bi lihevkirineke zarokane birîna kuçikekî bi destên xwe ên zarokane dipêçin û paşê jî ji ber ku sê hevalên wan çûne Kanîya Mezin ew jî didin dû wan û diçin Kanîya Mezin. Memo, Bado, Şîro, Xelo, Sevdîn digihîjin hev û qerpîtan diteqînin.

Xelo ji teqîna qerpîtan xisar digire, Menîce, ya ku ji hemû keçikan biçûktir bû, ji xeniqandina coyê difilite. Paşê xwîner pê dihise ku ew zarok mezin bûne, her yekî daye dû ramanekê: Menîce û Xelo bûne şervan; Şîroyê ku bûye qontra û Badoyê ku berbertîyê dike dikuje; Sevdîn winda ye, Memo jî bûye endamê partîyeke sîyasî ku diyar e ew partî li ser hukim û iqtîdarê ye.

Seyîne bi vê romanê ve digihîje hev. Lehengên Şevên Winda Wêneyên Meçûl Seyran û Yasemîn, lehenga Mirina Bêsî Narîn di vê rormanê de li rex dayikên Menîce, Xelo, Sevdîn tên bicîkirin. Dayikên, jinên ku bi awayekî winda kirine û di bin sîya windayên xwe de winda bûne. Wekî ku me gotibû berhemên Zeraq xwedî tezekê ne, ev tez di vê romanê de digihîje armanca xwe. Jinên ku digihîjin hev, her sê romanên jî digihîjin hev û Sêyîneya Winda heyî dikin. Jinên ku bi rengekî guhertî tev li jiyane dibin, edî xwedî îradeyekê ne û rolên zayenda civakî dirûxînin. Jinên şervan, jinên çalakvan, jinên polîtîk, jinên ku ji qada taybet derketine qada giştî, jiyane bi rengekî cihê dijîn. Çendî ku her yek xwedî windayekî ye, çendî ku her yek bi kezebeke ku her dişewite ve dijî jî, dîsa jî li ser pêyan in û kirdeyên jiyana xwe ne. Zeyneba a ku dayika Bado ye, xwedî kurekî şervan e û Bado yê ku di hembêza wê de can daye; Xangul xanima ku jina Hogir e û di xewnên xwe de her tim mêrê xwe dibîne; Meryema a ku dayika Xelo ye û di xewnên xwe de ji şivanekî pirsax Xeloyê xwe dike; Xeyce ya ku dayika Menîcê ye û di xewnên wê de keça wê her bang li wê dike; Dayika Sêvê a ku xwedî du kurên winda ye; bi vê ronamê digihîjine hev û Zeraq, teza xwe bi wan jinan digihîjîne armancê. Dayika Sêvê bi Xeyce û Meryema re diaxive û gotina Kurmancan a ku: 'jin dibêjin, jin dara şikestîye; mêr dibêjin, mêr dara şikestîye' bi awayekî rewşenbîrî şîrove dike.

“Hema bi hev re rabûne û va ye tofana xwe li dinyayê jî xistine. Erê her du bi hev re rabûne. Lê hûn bizanibin... Ku aliyekî ji wan piştî xwe li aliyê dî bizivirîne, her du alî jî dê bişikên. Her du alî jî dê bibin darê şikestî. Loma, ew bi rabûna xwe a bi xurtî, qelsî û kêmasiya hev tamam dikin û nahêlin; ne zêdeyî û xurtîya wan, li ser hev zal be ne jî qelsî û kêmasiyên wan, li ser hev dal be.” (Zeraq, 2014: 71).

Nivîskar hem bi vê axavtinê hem jî bi gotineke Xelo, peyt li teza xwe dike. Xelo, di nameyêke xeyalî de deng li dayika xwe dike û dibêje: “Pergaleke bavo hebû. Simbêl li ber poz... Digot qey hêz tenê jê re hatiye beşandin... Gere ew simbêl... Bihata kurkirin... Bihata jêkirin... Bi destê rabûneke xasmêrane... Bi destê rabûneke xasjinane...” (h.b. 2014: 92). Teza *Sêyîneya Winda* a ku bi çîrokên jinên neçar destpêkiribû, bi pevrerabûna jin û mêran a li hember kevneşopîya genîbûyî, digihîje armanca xwe û kodên zayenda civakî yekbiyek tên rûxandin.

3.1.2. Qadên Giştî û Qadên Taybet

Wekî ku me di beşa yekem de jî dupat lê kiribû, ji derveyî malê her der qada giştî ye. Û jin di sedan salan de her tim di nav malê de û bi rolên dayiktîyê û bi rolên jinbûna mêrekî hatiye pênasekirin û cîbicîkirin. Her tim li derveyê qada giştî hatiye hiştin û hişmendîyeke civakî a ku wek normal hatiye qebûlkirin, bi kodên serdestîya nêrane hewl daye ku ev normalîteya ne normal neyê guhertin. Ji polîtîkayê, ji perwerdehîyê, ji sporê, ji qadên xebata zanistî, ji laboratuwaran, ji qadên huner û afirandinê, ji qadên muzîk û hunerên dramatîk, tew ew çend balkêş e ku ji mekanên derveyî ên berhemên wêjeyî jî hatine dervekirin û têra desthilatdariya mêrane nekiriye ku bo jinê ber derîyê malê, serê kanîyekî, sekinandin û rûniştina ber devê çemekî jî qedexe kiriye. Heta ku bi rîtûlelên diyar ji aliyê mêrekî ve teslîmê mêrekî din bûye di nav mala bav de olam kiriye; piştî olama mala mêrê xwe kiriye. Wekî ku me di binsernîvisa Zayend û Zayenda Civakî de jî anî ziman Dilawer Zeraq di berhemên xwe de bi hişmendîyeke cuda û bi rengekî hişyarî helwest nîşan dide. Di berhemên xwe de pêşî jinê li gorî pergala û hişmendîya civakê di mal û di qada taybet de şayes dike; piştî gav bi gav jinê ji wan mekanên taybet derdixe û ber bi qadên giştî dibe. Daketina jinê a bo qadên giştî; jinê tevî jiyanê dike û ew hepsa ku di sedan salan de bo wê hatiye avakirin, hildiweşîne.

Di *Bişirîna Şermînî* de, xwîner bi çîroka keçeke ku ji alîyê leşkerekî ve hatiye xapandin dest bi xwendinê dike û dibîne ku keçik li ber derîyê leşkergehê agir li bedena xwe dixê. Di çîroka duyem de keçikeke ku ji alîyê mêran ve kevir lê hatiye barandin, di nexweşxaneyekê de bêkesûkûs hatiye hiştin û xwîner delalîya wê jî, êşa wê jî ji jineke din dibihîse. Dawîyê de ew keçik jî jiyana xwe bi destê xwe diqedîne. Çîroka sêyem de Şermîn û Gulbîn li kafeyekî rûniştine û Şermîn qala çîroka xwe ya baskîkestî a ku ji alîyê mêran ve baskên wê hatiye şikandin, dike. Di çîroka bi navê *Lihêfa Şevê* de, jineke hemşîre nobedar e û ew şev du polêsji bo muayeneya betanê keçanîyê, keçeke panzdeh salî tînin nexweşxaneyê. Keçik ji alîyê patronê xwe ve û bi şîrîktîya polêsan tê firotin. Di çîroka dawî a ku bi navê *Jîyek Cemidî Di Hembêza Tîrmehê De*, keçeke ku ji alîyê Ehmoyê kulek ve tecawiz lê hatiye kirin û di kolanan de bi awayekî aqilavêtî dijî û ji alîyê mêrên dîtir ve tecawiz lê tê kirin. Em dikarin bêjin ku qadên giştî ên ku jin daketinê, ne ji alîyê jinan ve, wekî bi sedan salan, ji alîyê mêran ve hatiye sazîkirin. Loma jî jinên ku di van qadên giştî de cî girtine ne bi hewldanên xwe, bi heyîna xwe, bi îradeya xwe; bi berjewendîyên mêran û bi rolên ku ji alîyê mêran ve li cîyê ku ji bo wan layîq hatiye dîtî bi cî bûne. Şermîna ku zanîngeh xwendîye, her du hemşîreyên ku temsîlkarê jinên xwende ne jî bi awayekî azad û serbixwe di qadên giştî de cî negirtine. Ji ber ku temsîliyeta jinê a li qada giştî ne tenê li dervebûn e. Laşê ku ha di mal de ha li derve, ji alîyê mêran ve tê bikaranîn temsîliyeta jinê a bîndestxistî, kêmxistî naguherîne. Handan Çağlayan dibêje ku: “Zanava kollektîf, pala xwe dide têkilîya ku her domdar e û wê bi bîr dixê; nexwe, guherîna kirdeyên zanav wan pênase dike û li liv û tevgerê dixê, dikare zanavê bi xwe jî biguherîne. (Çağlayan, 2014:27). Belê divê zanava jinê, tiştêbûna jinê biguhere ku temsîliyeta jinê a di qadên giştî de wekî kirdetîya wê pêk bê û xizmetî hişmendîya mêrane neke.

Gava em berê xwe didin Sêyîneya Winda, em dibînin ku di warê gelemşeya qada giştî û qada taybet de; Zeraq, jinên ku di romanên de wek leheng derdikevin pêşberî me bi awayekî hişyarî û gavbigav derxistîye qadên giştî ên polîtîk. Qadên giştî ên polîtîk di xwe de giringîyekê dihewînin ji ber ku azadîya jinê a ku ji alîyê mêran ve hatiye çewisandin, bi tevger û geşadanên polîtîk ên jinane derizîye û hin kodên hînbûyî hatine hilweşandin. Yasemîn bo perwerdehîya zanîngehê ji navçeyê Anatolya Navîn hatiye Stenbolê û ne di polekê, di odeya wargehekê an jî di malekê

de derdikeve pêşberî xwîner. Li kafeyekê wek qasedar dixebite û bi şahidîya şîdeta ku Seyran ji polêsekî dibîne ew jî derdikeve qada meydanî û tevî jin û dayikên çalakvan ên Dayîkên Roja Şemîyê dibe.

Seyran ji alîyê xwezgînîyên Sevdîn ve ji bav tê xwestin û dibe bûka mala Bişarê Çeto. Ku çîroka wê bi sedema windabûna mêrên wê ên du bira bûn, neguherîyabûya, belkî jî Seyranê her tim di maleke li gund de bimaya û li wir bihata bicîkirin. Seyrana ku hem ji alîyê Sevdîn, hem jî ji alîyê Faris ve qedr û qîmet dibîne bi windabûna wan re ji qada taybet derdikeve qada giştî. Dide dû doza zelalkirina jinavêwindakirina her du birayan. Ew û xwesîya wê Dayika Sêvê, her çi qas jinên gundî bin jî, li bajarêkî mezin jiyana xwe didomînin û li bajarê herî mezin jî beşdarî çalakîyan dibin. Birina, jinavêwindakirina her du birayan çi qas polîtîk be, derketina Seyran û Dayika Sêvê a ji qada taybet bo qada giştî jî ew qas polîtîk e. Li vir hûrgilîyeke pir girîng heye ku divê em dupat lê bikin; gelemşe ne tenê derketina ji qada taybet bo qada giştî ye, a girîng ew e ku jin dibe xwedî kesayet û dibe vebêja dîroka xwe. Wekî ku me di geşedanên tevgerên femînîst de jî anîbû ziman, çalakîya kolektîv û kesîdebûnê, hebûna jinê a di qadên giştî de xurttir kiriye.

Di *Mirina Bêsi* de jî windayek heye. Hogirê ku hem hogirê gelê xwe ye hem jî pêşengê gelê xwe ye, emrê xwe di rêya heyîkirina gelê xwe de gorî dike. Emrê ku ji girtîgehan, ji şikenceyan, ji jiyaneke bazdayî û firarî gihîştîye van rojan, di destê kujerên xwe Çolak, Kaygusuz û Acem de dawî dibe. Xangul xanim, a ku hevsera wî ye û; Narîn, a ku berîya salên heştêyan li Farqînê delalîya wî, hevrêya xortanîya wî bûye jî, wek Seyran û Dayika Sêvê li qada giştî hatine bicîkirin. Narîn hê di keçanîya xwe de bi çend hevalên xwe re diçe komeleyekê. Balkêş e ku çendî ku biçin komeleyê jî di civînan de cî nagirin û di girtinaqeraran de bêfonksîyon in. Ji ber ku nivîskar rasteqînîyekê dide ber çavan ku di wan salan de ne civak ne jî mêr ji bo veguherîneke hîmî ne amade ne. Çûyîna Narîn û çend keçên hevalên wê a bo xwendina lîseyê jixwe ji bo civakê şoreşek e, bi ser de ev çend keç, pir bi rehetî nebe jî, diçin komeleyekê, dersa zimanê zikmakî dibînin û di hin çalakîyên komeleyê de cî digirin. Veguherîneke gav bi gav û peresînî jinên wekî Seyran, Narîn, Xangul xanim, Dayika Sêvê û Yasemînê, ji jinên di Bişîrîna Şermînî cihêtir dike. Veguherîneke peresînî û bi hişmendîyeke jinane û polîtîk, jinan ji bin sîya mêran derdixe û jin wekî xwedî kesayet û kirde tîrî temsîlkîrî. Ev reng temsîliyet di berhema bi navê Nexşên

Li Giyan de digihîje asta xwe ya herî bilind, ji ber ku êdî tu jinek bi mêrekî ve nayê nasîn û pênasekirin. Zeyneba, Xeyca, Meryema, Dayika Sêvê, Seyran, Narîn, Xangul Xanim, Yasemîn digel hev in û bûne temsîlkarên jinên veguherî. Menîce (Arya) û Arîn, a ku keça Narînê ye, wekî mizgînîya roja bê, ser navê jina azad hatine afirandin. Berhemên Zeraq ên ku xwedî tez in, jinan ji qadên giştî gav bi gav derdixe qadên taybet ên polîtîk. Wekî ku Fatmagül Berktaş jî dibêje:

...dîrokzaniya femînîst, nedihat wê wateyê ku mirov ji rabirdûyê li hin jinên leheng bigere an jî dîrokê bi jinan ve bi sînor bike, vê ramanê tiştekî jê girîngtir di xwe de dihewand ku; dê bi awir û perspektîfeke femînîst, li ser hemû aliyê jiyane bihata sekinandin û her wiha dê pratîk û têgihên heyî bihatana rexnekirin û veguherandin û pê re jî dê yên nû bihatana afirandin.” (Berktaş, 2012: 189).

Her yek ji jinên di Nexşên Li Giyan de digihîjin hev, bi vê hişmendîyê heyî bûne û bi rûxandina kodên kevneşopîyê û bi avakirina perspektîfeke nû hene. Zeraq, cîgirtina jinan a li qadan jî li deconstructionê xistiye û têkilîya di navbera qad û zayendê de rûxandiye.

3.1.3. Tecawiz

Tecawiz, di nav xwe de şideteke piralî dihewîne, ne tenê li ser laş pêk tê û xisarê dide laş. Kodên tecawizê bi zayenda civakî ve girêdayî ne û mekanîzmayên desthilatdar ên nêrane, çî aşkera çî kiraskirî, mafê tecawizê bi awayekî bo mêran wek maf diyar kirine. Ji ber vê yekê ye ku hiqûq, dewlet, mekanîzmayên iqtidarê, çand, şîrikên tecawizkar û destdirêjkiran e. Mirovahî li ser dinê tu cîyê sûcê tecawizê bi awayekî mayînde çareser nekiriye; ji ber ku zagon, yasa û mekanîzmayên ji aliyê mêran ve ji bo mêran hafîne saz kirin her tim li dora mijarê çerx dane xwe, li çareyan gerîyane, lê tu car pişgirêk çareser nekirine. Em dikarin bêjin ku bi ser de di bin sûcê tecawiz de jin hatiye çewisandin ji ber ku; sîstemên hiqûqê ên nêrane tecawizê wekî razîbûn û sedema pîjkirinê şîrove kirine. MacKinnon di vî warî de dipeyitîne ku: “Li gorî analîza femînîst, tecawiz tenê ne qewamek e, rûxîna qaydeyên sincî ye an jî ne tenê di navbera du kesan de têkilîya berevajî danandî ye, rasterast çalakîyeke teror û şikenceyê ye. (MacKinnon, 2015: 199).

Di berhama bi navê Bişîrîna Şermînî di çîroka bi navê *Jîyek Cemidî Di Hembêza Tîrmehê Dede* qewimîneke wisa tê li serê keçeke delal û xweşik ku tu cara Xwedê, yê neyê jibîrkirin. Piştî vê qewimînê diyar e malbat ji gund koç kiriye û hatine bajarekî mezin. Xwedîyê keçikê kî ne û li ku û bi çi awayî dijîn ne diyar e; lê belê keçik bi awayekî aqilavêtî di kolanan de dijî. A girîng ew e ku sîstemên hiqûqê ên nêrane ku di tecawizê de barê para razîbûn û sedema pîjkirinê li ser milê jinê dike şîrka xwe, di vê çîrokê de jî pêk tine. Ehmoyê kulek, ê ku mêranîya xwe bi çek dest dixê, tîfing ji lingê kulek re dixê destek, xwedî mafekî xwezayî ya mêran e ku ne ji yasayên civakê ne jî ji yasayên dewlêtê ditirse. Kesekî yan jî sazîyeke ku Ehmoyê kulek sûcdar bike tune ye; ji ber ku Ehmo bi kêrî kesan û sazîyan tê; lê belê keçik bi kêrî tu tiştî nayê. Keçik tiştêyeke ku kêrî mêran tê. Loma jî kolanan ku keçik tê de dijî bi Ehmoyên kulek ve devedev tije ye û ji yekî bifilitî, ê dinan jî ên din derdikevin pêş te. Ji destpêka çîrokê heta dawîya çîrokê her kes bi awirên Ehmo keçikê dinihêre. Dikandar hema ew gav derfet bibîne, yê ne ji tu tiştî fedî bike ne jî mirovahîya xwe bîne bîra xwe. Jixwe mirovahîya ku bi kodên serdestîya nêrane ava bûye mafê tecawizkirinê dide dikandar jî, Ehmo jî, xortê çîpxwar jî. Dizîya ku bi sedan salan ji laşê jinê, ji hestên jinê, ji derûnî û hebûna jinê hatiye kirin bi xwe re ne sûcek; berawajîya wê, bi xwe re mafek anîye. Mafekî mêrane(!) ku di xwe de tu sinc, zagon, rêz yan jî mirovahîyê nahewîne. Wekî ku Janice Haaken jî dupat lê dike “Şîdeta mêran, ji awayekî patolojîya mêran an jî ji xerabîya kontrolkirina dozînê bêtir û pêvtir, wekî berhema neresen (berhema talî) a rasterast a pêşînî û îqtîdara mêran tê şîrovekirin.”(Holmstrom, 2012: 192). Îqtîdara nêrane a serdest bi kodên şîdet û tirsfirandinê her tim jin çewisandiye pê re jî ji laşê wê heta hestên wê hebûna xwe li gorî arezûyên xwe bi kar anîye. Ji ber vê yekê ye ku tecawiz ne nexweşîyeke patolojîk an jî xerabîya kontrolkirina dozînê ye. Tecawiz, ew tişt e ku wek mafekî nêrane hatiye dîtin ku ji tirsfirandina li hember jinan û hemû heyînan pêkhatî ye.

Di çîroka bi navê *Lihêfa Şevê* de keça ku ji aliyê du polêsan ve ji bo muayeneyê hatiye nexweşxaneyê hê panzdeh salî ye û ji aliyê mêran ve tê firotin, ji aliyê mêran ve tê kirin û bi şîrîktîya her kesî ve jî xwedîtî ne li wê; lê belê li betanê keçxamatîya wê tê kirin. Şîrîktîya civakê agewîbûyî bi awayekî aşkera tecawizê zaroktîya keçikê dike. Çendî ku li gorî hemşîreyê keçik ji halê xwe razî xuya bike jî - ku ev fikra wê paşê diguhire-, razîbûn an nerazîbûn jî şîroveyeke nêrane a bi zimanê

nêrane ye. Ji ber ku di vî warî de ‘razîbûn’ ew peyve ku bi kodên zimanê nêrane a serdest mane girtîye. Bavekîdi nav cîyan de kût û ketandî mayî, xwişk û birayên ji wê piçûktir, dayika neçar mayî ne sedemên razîbûnê ye, sedemên mecbûrbûnê ne. Civaka ku bi kodên qirêj ên nêrane difikire, tu keys li ber keçikeke panzdeh salî nahêle; ew civak dixwaze ku bikaribe tecawizê laşê wê yê ter û ciwan bike. Wekî ku MacKinnon jî tîne zimên “Heke heyînek bo tecawizkirinê guncan be, ev yek tiştêkî ne bîyolojîk e, tecawizkirin rewşeke civakî ye û pênaseya çibûna jinê dike.” (MacKinnon, 2015: 206). Em dikarin bêjin ku jin, ne ji taybetîyên xwe yên laşî an jî xwezayî duçarî vê şidetê dimîne; mêr, yasayên civakî ên li gorî zayenda civakî a ku ji aliyê mêran ve hatiye sazîkirin, li gorî berjewendîyên xwe saz kiriye û gelemşeya tacawizê jî di nav wê hizr û ramanê de bi mane kiriye. Kana tecawizê, sedema tecawizê, sûcdarê tecawizê mêr e û hişmendîya rast ew e ku di gelemşeya tecawizê de bi tu awayî navê jînê neyê qirêjîkirin, divê navê jinan neyê ser zimanan û di nav mijarê de cî negire.

Zeraq, di her du çîrokan de jî du keçên xama ên çardeh panzdeh salî di navenda çîrokê de bi cî kiriye. Rasteqînîya civakê, a ku ji bo hin tiştan girîngî nade temênê keçan, zarokan, keçjinan danîye ber çavan. Her çi qas dilê xwîner bi rewşa ku keçik tê de ne bişewite jî, digel wê dibîne ku temsîlkarên civakê a di çîrokan de cî girtine ew rewş normalîze kirine û bi normalîzekirina tecawizlêkirinê her du keçikan jî bi kar tînin. Em dikarin bêjin ku nivîskar di vî warî de jî civak, kodên nêrane, serdestîya nêrane a çandî li deconstructionê xistiye.

3.1.4. Fuhûş û Qehpiktî

Fuhûş yek ji wan gelemşeyan e ku ji aliyê mêran ve hatiye afirandin, sazîkirinkujin ji xwe re kiriye tişte û qurban. Hemû kodên zimanî en nêrane di wî warî de jî bar li ser milê jinan kiriye û bi gotina ‘bila ew jî wî karî neke!’ jin sûcdar kiriye. Ev kodên zimanî ên nêrane, di sedan salan de ew qas normalîze bûye ku ne tenê ji aliyê mêran ve, digel mêran ji aliyê jinan ve jî hatiye normalîzekirin. Di çîroka *Lihêfa Şevê* de hemşîreyek ew şev li nexweşxaneyê nobedar e. Ji qajeqaja jinên ku jan û birûyên zarokanînê dikişînin ew qas aciz e ku bi gotinên sûcdarker û darêzker

rewşê dinirxîne. Zeraq, bi axavtineke hundirîn dengê hemşîreyê bi van gotinan digihîje xwîner:

...gelo çima jin, pêşî bi bêdengîyeke dilkirî, xwe di bin mêrên xwe de dirêj dikin, piştî jî di dema zarokanîne de, mîna ku êş û janên xwe ên taloxkirî bi bîr bînin, dengê xwe bi hev dixînin û bi heman rengî diqîjin... (Zeraq, 2016: 59).

Diyar e ku hemşîre ne bi kodên zimanekî jinane, beravajîya vê bi kodên zimanekî nêrane dihizire. Ji ber ku jan û birûyên zarokanîne çendî ku bi qajeqaj pêk were jî xwezayî û jinane ye. Hemşîreya ku dixwaze xwe ji vê rewşê dûr bixe destê xwe diavêjê pirtûka xwe da ku bixwîne. Vê carê bi dengê polêsekî ku li ser serê wê sekinîye, serê xwe ji ber xwe radike. Du polêsan keçikek ji bo muayeneyê anîne û dixwazin ku doxtor lê binihêre. Keçik, li gorî dîtîna hemşîreyê, diyar e ku ne jina yek ji wan e û zû li wê jiyane banîyaye. Keçik gelo li kîjan jiyane banîyaye û çima ji bedewîya wê zêdetir mehd û sikûmê wê heta tu bêjî hêrsok û mîna ku tiştêkî lê qewimîbe, canbêzar xuya dike? Di wê navberê de ji ber ku doxtor hê ne li wir e, hemşîre keçikê ji bo muayeneyê amade dike û wek adetî çend pirsan ji keçikê dike û der barê keçikê de dibe xwedî hin agahîyan. Çendî ku mafekî hemşîreyê wisa tune be jî, ji ber meraqa xwe dixwaze keçikê muayene bike. Keçik dibêje: “Tu yê tu tiştêkî nebînî...” Tam di vê qonaxê de em ê car dî gotina “Mirov wek jin nayê dinyayê, mirov piştî dibe jin.” bi bîr bixin; ji ber ku civaka ku rola qehpikîyê di temenekî ev qas ciwan de xistîye para keçikê, pê re kodên zimanê nêrane ên jargonî jî hînî wê kiriye. Wekî her kesî/ê ew jî girîngî dide parastina betanê, ne ku girîngî dide zarokîya ku jê hatiye dizîn. Çendî ku navenda mêtîyê pik û paqij be jî ji alîyekî din ve keçik bînpêkirî ye, bikarhatî ye, cegirandî û xeritandî ye... Pirsên hemşîreyê ne tenê pirs in; wekî ku me di serî de jî gotibû, gotinên kubi kodên zimanê ên nêrane ne; ku di wî warî de jî bar li ser milê keçikê dike. Pirsên wekî “Tu çima li xwe wisa dikî?” “Tu jê hez dikî?” Bersiva keçikê a: “Ji mecbûrîyetê!” û dûre gotina hemşîreyê a ku wekî ku pirsê xwe bike qemçik û bi gotinê wê ve bike, hema di pey re dibêje: “Mecbûrîyet!?”... (h.b. 62). Belê mecbûrîyet! Heta ku civak jintîyê wek tiştêyeke ku bi kêrî mêran tê, bibîne û pênas bike; keçikên, jinên ji bo debara xwe û nasên xwe bikevine vê kemîne. Ev rewş kemînek e; ji ber ku di dehan salan de ji bo jinan, lê belê ji alîyê mêran ve, hatiye sazîkirin û kudandin. Di vê sazîkirinê de mekanîzmeyên îqtîdarî ên nêrane di hemû çax û deman de, mekanên ku ji bo fuhûşê ne ava kirine; ji

fuhûşê bac wergirtine û bi ser de jî wekî ku mêr û mêranî li derveyî vê mekanîzmayê ne, bi kodên zimanî hemû bar li ser milê jinê kirine. Her çi qas karker û kedkarê fuhûşê jin bin jî, divê neyê jibîrkirin ku mekanîzma ji alîyê mêran ve tê avakirin û di vê mekanîzmayê de jî jin bi her awayî tê mexdûrkirin. Zeraq, di çîroka bi navê *Lihêfa Şevê* de, ew mekanîzmaya ku jin hem ji alîyê laşî ve hem jî ji alî hestî ve tê mêtin û jintîya wê di wir de tê xeniqandin, dafîne ber çavan ûkeçikeke panzdeh salî di wê mekanîzmaya genîbûyî de bi cî dike. Civakeke ku nikare -a rast naxwaze- xwedîtî li keçikeke panzdeh salî bike, xwedîtî li zarokên sêwî ên çavlidest bike; lê belê dikare wê keçikê, wan keçikan, li gorî arezûyên xwe ên mêrane û gewîbûyî bi kar bine. Ji ber ku kodên zayenda civakî ên ku li ser şîrîktîyeke hevpar ava bûne, di hezaran salan de ev mekanîzma normalîze kiriye û ev kod hem bi zimanî hem jî bi ramanî di civakê de daye rûniştandin. Disa ji ber vê yekê ye ku jina hemşîre, a ku di serî de hem jinên ku jan û qolinca zarokanîne dikişandin hem jî keçika panzdeh salî digel van kodan dadirizand, piştî ku keçik çîroka xwe jê re dibêje, diheyîre û şaşwaz dimîne. Nivîskar li wîr jî hin kodên hînbûyî li deconstructionê xistiye. Di ser hemşîreyê re mirovên ku derîyê dilê xwe û derîyê hişê xwe ji rasteqînîya civakê re dadaye, rexne dike. Hemşîre ya ku dibêje qey her jin wek wê ye û xwedî kar û derfetên baş in, ew şev dibîne ku civak û civaka ku ji alîyê mêran ve hatiye avakirin keçikeke panzdeh salî bi awayekî ji rûmetxistî bi kar tîne. Û belkî ne hişyarbûnek an ronakbûneke e, lê ji bo rewşa hemşîreyê ku tê de ye, ji bo famkirina wê a ji rasteqînîya civakê, dibe gavek. Ne tenê gavek, serîrakirineke jinane û bi zimanekî jinane... Wiha dibêje hemşîre: “Min xwest vereşim; hemû hinav û organên xwe ji nava xwe, ji hundirê xwe derînim û jintîya xwe, a ku di paş perdeya tenik î şermê de asê hatiye hiştin, şilf î tazî bihêlim.” (h.b. 67)

3.1.5. Cezakirin

Rolên zayenda civakî ên gerdûnî hema bêjin li her derê dinyayê û di hemû çaxan de mafê cezakirina jinan daye mêran. Zagonên ku ji alîyê mêran ve hatine diyarkirin û sazkin, bi xwe re serdestîya mêran, digel wê jî bindestîya jinan ava kiriye. Di her çaxan de jî bi awayekî wekî ku mafekî xwezayî ye ku li mêran hatiye beşişandin; cezakirin, watelêkirin, bicîkirin, sûcdarkirin, dan û standina jinê ji alîyê

mêran ve hatiye diyarkirin. Pênaseyên ku ji alîyê mêran ve û ji bo jinan hatine kirin jin ji heyînbûnê daxistîye tiştêbûnê û di nav zagonan de jî jin wek tişte bi cî kiriyê. Wekî ku me di beşa yekem de jî diyar kiribû di demajoya dîrokî de jî rewş her tim bi van kodan pêk hatiye. Şaristanîya Asûrî û Mezopotamyayî ku mafê verûtina porê jinê, kişandin an jî parçeyek ji jêkirina guh dide mêr; Dêra Katolîk, di çarçoveya hiqûqê de maf dide mêran ku li jina xwe bixe û tew divê bi şiveke bi qasî stûriya ‘tilîya beranî’ li jinên xwe bixe. Palder û bingehên qanûnî ên ku şîdeta mêran zexm kirine, di hemû çaxan de li gorî şert û mêrcên heyamê bûne xwedî meşrûiyetekê. Heskî bi gotara olî heskî bi gotara qanûnî heskî jî bi epîstemolojîyên avakirî mafê cezakirina jinan li mêran hatiye bexiştandin. Recmkirin yek ji wan cezayan e ku ji alîyê yasayên mêrane ji bo jinan hatiye afirandin. Her çî qas wek cezayekî ku ji bo jin û mêrên zîna kirine, bê pênasekirin jî, mexdûrên ku bi vî cureyîhatine cezakirin, pîranîya wan jin in. Jiber ku hem di yasayên kevneşopîyê de hem jî di yasayên modern de ‘razîbûn û sedema pîjkirinê’ bûye sedema xalîkirina meran û ji bo jinan jî bûye sedema sûc û cezakirinê. Wekî ku me di beşa yekem de jî qal kiribû bi *seyda cezûyan* ku di serdema navîn de li Ewrûpayê pêk hatiye, bi hezaran mirov hatine qetilkirin. Lê belê ji wan mirovan sê paran du par ji jinan pêk hatiye. Bi *seyda cezûyan* jinên hekîm ên pakker, jinên afirîner ên xwedî huner, jinên ku di civakê de wek rêber tînin, jinên ku xwedî mal û milk in, bi qetlîameke mezin hatine tunekirin.

Çîroka bi navê *Mirinek Nermijî Di Mesila Evînê de*, li odeyê nexweşxaneyekê, jinek tê şayesandin. Jin ew jin e ku “te digot qey hemû kevir û berên dinyayê lê barîyabûn...” Çîrok bi du vebêjanpê de diçe. Vebêjek, hemşîreyek e ku bi mehan e hewl dide ku birînên jinikê pak bike. Em dikarin bêjin ku vebêja/ê duyem nivîskar e ku digel dengê dilê jinikê, xwîneran bi çîroka jinikê dihisîne. Sûcê giran, ê ku bûye sedem ku mêrên xwedî simbêlên pereşûtî li hev bişêwirin û keviran li jinikê bibarînin *dildayîn* û *hezkin* e. Hezkin û *dildayîn*, a ku nivîskar bi hevokên li jêr şayes dike, dibe sedema kevirêbarandina canekî, ê ku ter û teze ye.

Dil e, war û wargeha evînê ye. Evîna ku bi êşê tê meyndin. Evîna ku bi geşbûnê re êşê diafirîne. Evîna ku her ji kîsê xwe dixwe û rêya qedîna xwe diyar dike... Evîn e... Jixwekirina hemû adet û kirasên derveyî mirovî ye... (Zeraq, 2016: 24).

Belê, mêrên ku xwedî simbêlên pereşûtî ne ew qas kevir lê barandine ku hew maye navê wî warî bibe ‘Keviristan’. Jinik, a ku ji Keviristanê hatiye qewirandin; bi rojan, bi hefteyan, wisa bêhiş û ji xwe bêhay, di beşa nexweşên giran û xedar de dimîne. Piştî bi mehan, bi merhem û dermanan hemû birînên ji derve tên pakkirin; lê belê ‘kewandina êş û janên hundirîn dimîne ji însafa xwedayan re’.

Fatmagül Berktaş ji bo cezakirina jinan wiha dibêje: “Li darê dinyayê ku em lê dijîn, ‘sûc’ê ku jin bi hewldana navlixwekirinê dike, her tim bi qasî cezakirina şewitandinê ne dramatik be jî, her tim berdêla vê cezayê navlixwekirinê heye.” (Berktaş, 2015: 13). Belê, sûcê jinikê ew e ku bêrêztî li hember kevneşopîya genîbûyî kiriye û bi hestên xwe ên jinane tevgerîyaye û ‘bi pevrebûneke bêsiûc û bêguneh, bi pevrebûneke rewa û bêşerm, bi pevrebûneke xweşiktir û delaltir...’ bi mêrekî re, bi Adem re -Adem ê ku wî jî dildaye wê- pê şabûye. Mêrên ku li hember hevşabûnê, pevrebûnê derûdor didin qilqalê û tu yê bêjî bûne dizê Xwedê, mêranîya xwe ya bi simbêlên pereşûtî tu caran li hember Ehmoyên kulek pêk nayînin. Di rewşên wek tecawizlêkirin û firotinên keçikên panzdeh salî de dibin şîrikên hev. Dibin temsîlkarên wê mêranîyê ku bi sedan salan li ser çewisandina jinan xwe heyî kiriye.

Zeraq, di vê çîrokê de bi awayekî aşkera hemû kodên nêrane li deconstructionê xistiye û hewl daye ku bi kodên zimanekî jinane li hember vê cezakirînê, jinê heyî bike û wê rakê li ser pêyên xwe. Zeraq bi gotina: “... avîya şîrî zor da pizîyan, orîna orgazmê bi wan ket û jina ku wan ê tu car nikaribûna wekî wê hez bikirana, li ber çavên wan bû wekî erfit...” (h.b. 26) ve kodên nêrane ên serdest bi zimanekî aşkera dirûxîne. Ne tenê bi vê gotinê, piştî ku jinik digel bişîrînekê ji hemşîreyê xatir dixwaze û sibetirê xwe ji paceyê re diavêje, çîrok bi wan hevokan diqede: “Wê xwe avêtibû bextê dilê xwe; evîna xwe ji bendîgehên sinc û exlaqê xelas kiribû... Kan û kakilê jinbûna xwe bi dest xistibû. Mirin jê re dawîyeke nerm bû...” (h.b. 27).

Kan û kakilê jinbûnê, a ku hin caran bi tecawizlêkirinê, hin caran bi firotinê, hin caran bi kevirîlêbarandinê tê binpêkirin û çewisandin, bi alegorîya bişîrînekê û bi alegorîya baqê gulên ên ku hemşîreyê ji bo jinikê kirîbû, tê rûxandin.

3.1.6. Zewac

Mekanîzmayên kontrolkirinê ên li ser jinan, ji destpêka bavkanîyê heta îroyîn, di bingeha xwe de her tim mayînde bûne; lê belê li gorî şert û mercan û derfet û hişmendîya heyaman kiras guherandiye. Çendî ku ji kirasê heyama koletîyê derbasî heyama feodalîteyê, ji kirasê feodalîteyê derbasî modernîzmê bûbe jî naverok neguherîye. Naveroka ku ji destpêka bavkanîyê vêdetir li ser bêzanavkirina jinê ava bûye, bi mekanîzmayên wekîyekmêrî, gotara olî, malbat, zewac jin dorpêç kiriye û di nav van mekanîzmayên kontrolkirinê de fetisandiye. Zanava ku ji alîyê bavkanîyê ve li jinê hatiye bexiştandin ‘dayiktî’ ye. Bi rûxandina hiqûqa dayiktî ve jin bi rola dayiktîyê hat xapandin pê re di malê de hat hepskirin û pê re jî bi peymanî zewacê, mêran xwe kir xwediyê keda jinan û xwediyê zarokan. Malbat jî wek zewacê sazîya herî xurt a bavkanîyê ye û bi rêvebirina sazîya malbatê îqtîdar û desthilatdarîya mêran tê zexmkirin. Bavkanî bi kodên nêrane û bi hiqûqeke nêrane birêve çûye. Zewac jî yek ji wan gelemşeyan e ku di nav hiqûqa bavkanîyê de hatiye pênasekirin û bisînorkirin. Sinorên zewacê pir teng in û ne mimkun e ku jin di nav van sinoran de bilive û heyî bibe. Zewac, bi awayekî bazirganî pêk tê û di vê bazirganîyê de tiştêya herî erzan jin e. Jina ku navê ‘bûk’îyê lê tê kirin figura danûstendîne ye. Wekî ku me di beşa yekem de jî dupat lê kiribû, bi rîtûelên wekî dayîna drahomayê, bûkanî, rihêl (cihêz), qelend, xwazgînî, di dema mehrbirînê de teslîmkirina jinê a ji alî mêrekî ve bo mêrekî dî û ya herî girîng; teslîmkirina keçanîyê (bekaretê) a ji bo mêrekî ye.

Formên zewacê ên ku di her sed sal û di her heyaman de bi her awayî ji alîyê rolên zayenda civakî ve hatine sazkirin, li gorî berjewendîyên mêran reng û dirûv girtine û li ser mêtina ked û jiyana jinan heyî bûye. Di romana *Şevên Winda Wêneyên Meçhûl* de Seyran hê keçeke xort e. Dilê wê, ê baskpêvebûyî ku daye dû evîna Faris, Faris û evîna bo wî xewn û xeyalên wê dixemlînin. Zewac û xwestina keçekê divê li gorî adet û toreyan be; jiber wê yekê ye ku li benda vegera Sevdîn, birayê mezin î Faris, vegera wî a ji leşkerîyê dimînin. Sevdîn dê vegere, Faris dê ji birayê xwe re biryara xwe aşkere bike û dê bi îzn û fermana Xwedê û bi qewlê pêxember Seyranê ji Faris re bixwazin. Loma jî gava mêvanên xêrê tên mala bavê Seyranê, Seyran ji ber ku dê bigihîje delalîyê xwe, lê ye ku bifire. Her tişt li gorî adet û toreyan pêk tê, dayika Seyranê ji Seyranê dipirse û Seyran jî dibêje ‘hûn dizanin’. Ên ku dizanin rûspî û zanayên wê çandê ne û ên ku dizanin xwedî îradeya biryardayîna li ser navê

law û keçan in. Denîz Kandîyotî, ji bo kodên vê gerdîş û şîrîktîyê, têgiha ‘kontrolkirinên çandî’ (Kandiyoti, 2015: 80- 81) bikar tîne û dupat lê dike ku ev mekanîzmayên kontrolkirinên çandî li ser zayendîtîya jinan kontroleke kolektîf pêk tîne. Zayendîtîya jinan, a ku ji kesîdebûnê hatiye dûrxistin, heta ketina navcîyan û ketina navcîyan a bi kê re jî ji alîyê vê mekanîzmaya ve tê dîyarkirin. Biryar tê dayîn, qewlê Seyranê tê birîn û Seyran li beramberî, du çêlek û pênc pezan ji alîyê bavê xwe ve bo Sevdîn tê dayîn. Xewn û xeyalên xortan ên ku ji alîyê kevneşopîyê ve tu caran nayê bihîstîn ew şev jî baskên Faris û Seyranê dişikîne û Seyran di şanzdeh salîya xwe de dest bi payîza jiyana xwe dike. Piştî amadekarîya rihêl û cihêzê, piştî pirsên Seyranê, ên ku di dilê wê de bêbersiv dimînin, Seyran dibe bûka mala Bişarê Çeto û pê re jî Sevdîn jî, ku di der barê wî de tu agahîya Seyranê nîn e, dibe mêrê wê. Bi gotina Seyranê, peywîrên xwe yê jinbûnîyê bi cî tîne. Di wê zewacê de her tişt li gorî şert û mercên gerdîşê pêk tê, lê belê tîne tiştêkî ku Seyran jî texmîn nake, diqewime û Seyran ji wê tarîyê difilite. Sevdîn, mêrekî dilvekirî û hişwer e. Rojek ji rojên Xwedê jî dilê Seyranê naşikîne û wek mêrên ji rêzê li hember Seyranê helwest girê nade. Loma jî jîntîya Seyranê li Sevdîn dikene û Sevdîn dikare wekî mêrekî di derîyê dilê Seyranê re derbas bibe. Hezkerin û evîna ku li wan diqewime û dibe sedema rengînbûna jiyana wan, bi birin û windakirina Sevdîn re li Seyranê reş û tarî dibe. Dûre gerdîş car din bi adet û toreyên xwe ve derdikeve holê. Jina bîmayî, aku di malê de ye, divê bi tîyê xwe re bê zewacandîn û wisa jî dibe. Dayika Sêvê û rûspîyên gund bi rojan zext û zor li Faris dikin ku bi jinbira xwe re bizewice û di dawîyê de jî gotina xwe li wan ferz dikin. Bi gotina Seyranê ve, her tişt wekî berê, bêyî ku heqê wê hebe ku tiştêkî bêje û bikaribe kartêkê lê bike, li ser navê wê diqewime û ji alîyê melê gund û rûspîyê malbatê ve, bi xelat û bergînda zêrekî reşadî; bi xwarina şîvê û xwendina mewlûdekê li Faris tê mehrkirin. Zayenda civakî a ku bi kodên nêrane avabûye û bavkanî, toreyên xwe bêyî ku îradeya jinan jî bihesibînin pêk tîne her pêk tîne.

Heman adet û tore di romana *Mirina Bêsî* de jî derdikeve pêşîya xwîner. Narîn, keçeke xama ye ku diçe xwendina lîseyê û di vê navberê de bi çend hevalên xwe re diçe komeleyekê jî. Li wir Mirza nas dike, dil didin hev û dibin delalîyên hev. Temsîliyeta jinan a berîya salên heştêyî, a ku li navçeyekê û li sazîyekê li gorî heyamê, her çi qas balkêş û metelhişt be jî, hem hişwerîya malbatan hem jî hişwerîya

kesan, li ber çavên xwîner normalîze dibe. Çendî ku temsîliyeta jinan ne temsîlyeteke berfireh û bikeys be jî, dîsa jî di warê derketîna jinan a ji qadên taybet bo qadên giştî pêngaveke mezin û hêja ye. Di vê pêngavê de hin kod û hînbûyînen bi sedan salan jî ber bi guhertîna ve ne. Tevî ku civak bo guhertîneke dorfireh û pîralî ne amade be jî, helwesta Narînê û ên hin mêran di romanê de cî girtine, ji bo siberojê hin hêvîyan jî şîn dikin. Bavê Narînê ê ku mele ye, birayê Narînê ê bi navê Nadir, Mamoste Filît û Mîrza ji wan mêran in ku li hember jinan ji derveyî adet û toreyan tevdigerin. Digel ku Narîn jineke xwende û li gorî Seyranê azadtir e jî, li hember çand û gerdîşê têk diçe û ew jî mîna Seyranê tê zewicandin. Rojekê xwezgînîyên wê, ên ku nasên bavê wê ne, ji rêyeke dûr tên, bi îzn û fermana Xwedê û bi qewlê pêxember wê ji bavê wê dixwazin û digel hemû îtirazên wê, wê didine Seîd. Her çî qas birayê wê Nadir piştgirî dide wê jî, ev yek bi kêrî tu tiştî nayê û careke din jî gerdîşa nêrane a sedan salan pêk tê. Çendî ku Narîn jî bi kodên zayenda civakî a nêrane û bi kodên bavkanîyê ve hatiye zewicandin jî, di navbera wê û Seyranê de cihêtiyeke pir girîng heye. Seyran, a ku şeva ku ji bo Sevdîn tê xwestin tenê karibûye ku bêje 'hûn dizanin' û ji bo zewaca bi Faris re jî nikaribûye tu îrade nîşan bide û gotinekê jî bêje. Ji ber ku kodên ku Seyran hîn bûye û tê de dirûvên jintîyê girtîye bi tu awayî nahêle ku jin bilive û heyî bibe. Lê belê, beravajîya Seyranê, Narîn xwedî derfetên pêşketî ne û li gorî Seyranê bi her awayî jineke azadtir e. Loma jî dikare li hember malbata xwe, gerdîşê, mêranîyê rabe û bêje 'na'. Çendî ku 'na'ya Narînê li gorî şert û mercên wan rojan bi kêrî tu tiştî neyê jî, ji bo siberoja wê û keça wê deriyên hişmendîyeke nû li ber wan vedike. Roj tê Narîn dikare ji mêrê xwe cihê bibe û mafê biryardayîne, a der barê jiyana xwe de, bi dest bixe. Pêvajoya ku bi çîroka Seyranê dest pê dibe û bi çîroka Narînê didome, nîşan dide ku Zeraq, zewaca ku bi kodên serdestîya nêrane pêk hatîne jî li deconstructionê xistiye û bi destê Narînê di kodên zayenda civakî ên nêrana de çend derizîn pêk anîne.

3.1.7. Hevşabûn û Hezkirin

Geşedanên der barê rexneya femînîst de û pê re jî rexneya femînîst a wêjeyî, diyar kirine ku têkilîya di navbera îdeolojî û çandê de heyî, bûye sedem ku jin di temsîlên wêjeyî de, di rêza duyem de bimînin û digel vê agahîyê jî rê dane ber

rexnegiran ku vê rewşê wek giştî û gerdûnî bi rolên zayenda civakî ve girê bidin. Digel rolên zayenda civakî, bavkanî û gotara nêrane jî ji wan kartêkeran in ku bûne sedema pênasekirina jinan a bi zimanê serdest ku kirdewariya wê hatiye pûçkirin. Şanîdana jinan a bi hin kod û şanîdêrên giştî re û pênasekirina wan a di nav qalibên diyarkirî de, bûne mijarên ku rexneya femînîst girîngî daye wan û hewl daye ku hem wan kodan aşkera bike hem jî bi kodên zimanekî jinane wê cardin ava bike. Rasteqînîya ku rexneya femînîst û rexneya femînîst a wêjeyî dane ber çavan pêşîya nirxandinên nû vekirîne. Di vê pêvajoyê de femînîstên wekî Hélène Cixous, Luce Irigaray, Julia Kristeva, Monique Wittig, teorîyên xwe spartine gotarên (discoursên) qadên wekî psîkanalîzm, zimanzanî û biyolojiyê û teorîyên Lacan û Derrida. Zayenda ku bi rêya ziman hatiye sazkirin û di tekstên wêjeyî de jin her tim wek tişte û ji bo mêr bi cî kirîye, bi saya van teorîsyenan hatiye rûxandin. Digel vê yekê norm û qalibên nêrane ên ku îradeya jinê a “kirdebûnê” ji destê wê girtine, hatiye aşkerakirin. Wekî ku me berê jî dupat lê kiribû, bi taybetî nivîskar û teorîsyenên femînîst ên wekî Virginia Woolf û Mary Daly hewldane ku di mît û efsaneyan de pêşdarazên mêran û zimanê nêrane deşîfre bikin. Têgiha “difêrancé” a Derrida ku bûye sedema rûxandina hîyerarşîya ku li ser hin dijberîtiyên duberî ava bûye, digel xwe rêyeke nû li pêşîya rexneya femînîst a wêjeyî û rexneya deconstructif vekiriye. Jinanîya ku di tekstên wêjeyî de wek jixatîrxistî, tişte, dîkekirî hatiye nişandan, bi kodên zimanekî nêrane û bi epîstemolojîyên nêrane hatiye zexmkirin. Bi van geşedanan ev mantelîte û feraset hatiye hilweşandin. Zayendîtî jî yek ji wan gelemşeyan e ku sinorên wê ji aliyê mêran ve hatiye diyarkirin û di wê diyarkirinê de, çendî ku tegîha zayendîtîyê ji aliyê ol, bîyolojî, psîkolojî û exlaqê ve hatiye nirxandin jî, ji aliyê polîtîk ve nehatiye nirxandin. Tam di vê qonaxê de divê were bibîranîn ku rexneya femînîst a wêjeyî digel aşkerakirina zimanê nêrane, ji bo berhemên wek kanon hatine hesibandin jî nirxandineke jinûve ji xwe re kiriye armanc; ji ber ku, di tekstên wêjeyî de, jin her tim digel mêrekî û ji bo mêrekî hatiye şayeskirin. Zayendîtî û pênaseya jinan a di berhemên wêjeyî de, gelemşeyeke polîtîk e. Di navenda vegotina mêtînan de her tim mêrekî leheng û di derdora wî de jî jin/jinên nekesîde hatine afirandin. Jina ku bi awayekî rasthatî tev li metnê dibe, bi awayekî rasthatî jî winda dibe. Ne heyîbûna wê bo wê ye ne jî jiholêrakirina wê. Ev cure pênasekirina jinan a di tekstên wêjeyî de, herî zêde di dîmenên hezkirin û

hevşabûnê de pêk tê. Mêrê leheng, ê ku di navenda vegotinê de cî digire, bihêz e, xwedîdar e û kirdeya tekane ye. Jina ku bi awayekî rasthatî derdikeve hember wî mêrî, pirî caran ji parçeyekî goşt an jî tiştayeke ku tê bikaranîn, ne tiştêkî dî ye. Sharon Smith tîne zimên ku: “Di çanda popûler de, zayendîtiya jinan ne di tevdehiya kesayetiya wan de tê dîtin lê bele di hin beşên laşen wan de tîne temsîlkirin û ev yek jî qebûla berbelav ku laşê jinên roja îroyîn ji bo zewq û kêfxweşiya meran heyî dike, rave û aşkera dike.” (Smith, 2012: 17). Kategorîya jinan a ku bi sedan salan ji aliyê mêran veû bi vî awayî hatiye sazîkirin û temsîlkirin, bi vî awayî jî di wêjeyê de heyî bûye. Çi kiraskirî çî aşkera jin wek tişte hatiye şayeskirin. Jina ku bi her awayî hatiye îstîsmarkirin ji aliyê tîkîlîyên zayendîtî ve jî hatiye îstîsmarkirin û bi ser de navê vî îstîsmarê averêbûna sincî û hunerî hatiye danîn. Halbûkî ev gelemşe ne ji averêbûneke sincî yan jî hunerî ye, ji derveyî averêbûnê helwestgirêdaneke polîtîk e.

Wekî ku me di berê jî anîbû ziman, di berhemên Dilawer Zeraq de di navenda vegotinê de mêrekî ku leheng e, xwedîdar e û kirdeya tekane ye tune ye. Di berhemên Zeraq de, di navenda vegotinan de jin cî digirin û xwîner jî rasteqînîya wan dibîhîse û ji wan hîn dibe. Dîmenên hezkirin û hevşabûnê a ku vebêjên wan jin in bi temamî derveyî kodên nêrane ên îstîsmarker in. Gava em berê xwe didin berhemên em ê dibînin ku dîmenên gelemşeyên wek tecawiz, fuhûş û şîdet ji aliyê rolên zayenda civakî a bi serdestîya nêrane ve hatiye şayeskirin; lê belê dîmenên hezkirin û hevşabûnê ji aliyê jinan ve û bi hestên jinane hatiye şayeskirin.

Di navenda çîroka bi navê “*Mirinek Nermijî Di Mesîla Evîne De*” de keçikeke ku bi cezayê recmkirinê kevir lê hatiye barandin heye. Keçika ku me bere jî qala çîroka wê kiribû, qedexeyek bînpê kiribû û ji Adem hezkiribû û bi ser de jî ew û Adem bi hev şa bûbûn. Hezkirina ku ji tînegermîya giyanê nûciwan dertê û xwe dispêre xwezaya mirovahîya wê, bi badana simbêlên pereşûtîtê bînpêkirin û cezakirin. “Dilê ku afirînerê hestê yekta ê mirovane ye, ji bo ku jiyanê tîr û tijî bike, bi lêdana xwe a geş û xurt, dikir ku ew hênaseyên kûr û dirêj bigire... Dilnên wê ew dilgeş dikirin.” (Zeraq, 2016: 18). Belê dilgeşîyeke ku tu xisara wê dê negihije mirovahîyê, berawajîya wê dê jiyanê rengîntir bike, tê cezakirin. Deryaya hestên jinane ên nûhişyarbûyî, di kêlîyekê de radibe ser pêyan û bi dîfîna Adem re keçîk serê xwe radike û li wî dinihêre. Halbûkî li gorî tore û gerdîşê ev yek qedexe ye.

“Qedexe bû; tînegermîya hestan qedexe! Alîyê mê a evînê... Qedexe! Mêtîya hişyarbûyî, qe-de-xe! ... Evîna mê... Ji bo bend û bedenên qesra nêr, di nava kevir û tehtan xerca zexmkirîne...” (Zeraq, 2016: 20). Qedexeya ji bo evînê helbet dê ji bo hevşabûnê bibe sedema cezakirineke keviristanî. Qedexeyên ji bo jinê, cezayên ji bo jinê, kevirên ji bo jinê, ne ji zagonên xwezayê pêk tên; yan jî kana wan ne psîkolojî an jî bîyolojî ye; kana wan û kakila wan mêranîya desthilatdar û mêtînger e û ji jiyana jinê didize û heyî dibe. Keçîk, bi bişîrîneke digel lêvên lerîzok, derîyê dilê xwe ji Adem re vedike û her du canên ku bi agirê evîn û evîndarîyê disojin digihîjîn hev. Wekî darên ku hema bi dayîna tava biharê re, di şevê de hemû kulîlkên xwe vedikin, hestên her du canên nûciwan li hev dipiçikin.

“Bi pevrebûneke bêşûc û bêguneh, bi pevrebûneke rewa û bêşerm, bi pevrebûneke xweşîktir û delaltir... hogirî û dilovananiya herî mirovane a du mirovan... her du bedenên bawerîya saf û xwerû a ji evîn û hezkirinê kifş kirin... Behra evînê bi pêlên mezin coş bû, rabû ser; wan jî li gorî dilê xwe, xwe tê de şûst...” (Zeraq, 2016: 24).

Hevşabûna ku nivîskar bi van hevokan; bi pênaseya wek: ‘hogirî û dilovanîya herî mirovane a du mirovan’ şayes dike, di bin keviran de tê pelixandin û çewisandin. Peyvên ku bi aweyekî hişyarî li hember vê zagona hovane hatine bikaranîn, digel nermahî û tînegermîya xwe, hestiyarî û mirovahîya xwe serhildaneke radîkal jî dihewîne. Serhildana keçîkê a ku dibe sedema avêtina xwe ya ji pencerê, berteka nivîskar a dekonstruktîf e jî; ji ber ku keçîk ‘evîna xwe ji bêndîgehên sinc û exlaqê xelas’ dike. Hezkirin û hevşabûna dilovane û mirovane a du mirovan li hember simbêlên pereşûtî hatiye heyîkirin. Nivîskar bi zanetî û bi helwestgirêdaneke bîraverî li hember kodên nêrane ên serdest û genîbûyî radibe. Hevşabûn û hezkirin jî ji yek wan gelemşeyan e ku biryardayîn û jiyîna wê bi îrade û azadîya jinê pêk tê.

Çendî ku Seyran, lehenga sereke a Şewên Winda Wêneyên Meçhûl, li gorî tore û gerdîşê hatiye zewicandin û bo zewacên wê hemû ritûelên gerdîşê pêk hatibe jî, bi hezkirina xwe ya ji bo Sevdîn ew jî şoreşa xwe ya jinane pêk tîne. Wekî me berê jî qala çîroka wê kiribû, Seyran di serî de dil dide Faris û her du delalî dixwazin bizewicin. Lê belê li gorî tore û gerdîşê Seyran ji bo birayê mezin tê xwestin û dibe jina Sevdîn. Gava Sevdîn ji holê tê rakirin û tev li refa windayan dibe wê carê jî Seyran bi birayê piçûk Faris re tê zewicandin. Di nav van tekilîyan de aherî girîng û balkêş ew e ku, Seyran her tim bi hestên xwe yê jinane hatiye şayeskirin. Di vê

şayeskirinê de kodên hezkirin û hevşabûnê bi ziman û hestên Seyranê diyar dibin. Wekî ku keçika ku lehenga sereke a çîroka bi navê “*Mirinek Nermijî Di Mesîla Evînê De*” ye, di navenda çîroka xwe de wek kirde cî digirt heman awayî Seyran jî di navenda çîroka xwe de wek kirde cî digire. Her du jî bi jinantîya xwe hatine temsîlkirin û şayeskirin. Seyran, di destpêkê de, ji bo bihevrebûnên zayendîtî ên bi Sevdîn re vê gotinê dibêje. “Ji bo ku ez di devê jinên gund de nebim benîşt, min dengê xwe nedikir û çokên xwe dişidandin.” (Zeraq, 2005: 44). Ji ber ku, li gorî toreyan ne mimkun e ku jinek nekeve nav cîyên mêrê xwe û îradeya xwe nîşan bide. Îradeya Seyranê a ku jixwe ji alîyê civakê ve hatîbû bidestxistin, bi tekilîya Seyran û Sevdîn re yekem car dikeve destê Seyranê û Seyran ji wê şevê şûndetir dibe xwedîyê jinantîya xwe.

“Di wê berbangê de yekem car jinantîya min li Sevdîn kenîya û wekî mêrekî ku dê karibe di derîyê dilê min re derbas bibe, li ber çavên min xuya kir... Di wê berbangê de min hemû hest û dilnên xwe yê jinantîyê Sevdîn hembêz kir... tîrêjeke ku êdî dê ji bo hest û dilnên min bibûya wekî ronahîya rojê, di nav dilê min de birûsî.” (h.b. 45).

Feraseta jinane a ku di çîroka keçika ku kevir lêhatiye barandin û di çîroka Seyranê de derdikeve pêşberî xwîner di çîroka Narînê de jî bi heman awayî heyî dibe. Narîn, a ku yek ji lehengên Mirîna Bêsî ye, çendî ku keça meleyekî be û di navçeyeke piçûk de bijî jî li gorî dewr û dewranê jineke azad e. Çûyîna wê a lîseyê a ji bo xwendinê û çûyîna wê a li komeleyekê, bi îradeya wê pêk tê. Tevî ku hin mudaxeyên derveyî çêbe jî Narîn ji xwe bawer tevdigere. Narîn jî keçeke xama ye. Diçe pola dawî a lîseyê. Bi dîtîna Mîrza a li sazîyê dilê wê diperpîte û dil dide wî. Dûre dem hezkirina wan dixe evîneke hevpar û digel evîna wan; hevaltî, hogirtî û hişmendîya wan jî dibe hevpar. Berîya salên heştêyan e û dem ji bo wan û civakê tiştên xerab amade dike. Mîrza ji bo demê jî navê wînda dibe. Kes nîzane li ku ye. Di wê navberê de polês diavêjin ser mala wan û li her derî pîrsa Mîrza dikin. Narîn her çî qas bikeve tatêla wî jî nikare ji tu kesî agahî bigire. Bi ser de jî di wan rojan de xwezgînîyên wê tîna û Narîn û kekê wê yî mezin Nadir çî dikin, çî qas heter û lavayî li bavê xwe dikin jî serederî bi wan nakin û Narîn didine Seîd. Narîn êdî dergistî ye. Rojekê telefona malê lê dixe û Narîn dengê Mîrza dibihîze. Tawilê ji mal derdikeve û diçe mala hevala xwe Seyranê û li wir digihîje Mîrza. Narîna dergistî ew roj li wir tercîha xwe a jinane pêk tîne û bi Mîrza re bi hev şa dibe. Narîn a ku dibêje ‘ez ê

hezkirina te di naxê xwe de xwedî bikim...’ ji kiryara xwe û terciha xwe tu poşmanî hîs nake.

Nivîskar, bi dîmenên hevşabûnê li hember rolên zayenda civakî, ên ku jin wek namûsa mêran bi cî kiriye, jinanîya xwezayî bi ser lingan dixê. Loma jî dengê dilê Narînê bi wan gotinan jinanîya xwe pîroz dike û digihîje xwîner. “Narînê ne xwe gunehkar didît ne jî suçdar. A niha, kêliyên ku xewnên wê dixemilandin, dijîya... Narîn a niha bes hêza evîna xwe dijîya... hêza evîna ku şiyaneke xwe abadîni heye ku hişkegerdîşê bêhêz û teres dihêle.” (h.b. 181). Nivîskar dîsa bi helwesteke zanetî û bîraver gerdîşê dide ber rexneyan û digel hêza evîne hişkegerdîşê bêhêz û teres dihêle. Em dikarin bêjin ku çî bi kodên zanistê çî bi kodên zayenda civakî a bi serdestîya nerane be, bi sedan salan jin ji zayendîtiya xwe dûr hatiye xistin û digel wê jî wek tiştayeke zayendîti hatiye penasekirin û bicîkirin. Digel wê yekê divê bê aşkerakirin ku ev ne rasteqînya jîyanê, xwezayê û jinbûnê ye. Freud, ê ku di warê psîkoanalîzê de wek pêşeng hatiye qebûlîkirin jî, li derveyî wê nirxandina kêmxistî nemaya. Ji ber wê yekê ye ku wek hemû qadan divê di warê wêjeyê de jî -çî zayend çî jî çîn- zanavên ku hatine maxdûrkirin ji dîroka derewîn tên cihêkirin. Rosemary Hennessy balê dibe ser û dibêje:

Gava polîtîkayên ser zayendiyê li ser bingeha hewcetiyan mirovane bê bicîkirin, ji bo hestpêkirin û dilzîziyê mirov bi potansiyele ve têkildar dike; Zemîn û bingeha gotarên ser zanava zayendî bi hewcetiyan dîtir ên jîyanê ên mirovane û bi bangewaziyên demokrasiya bêkêmasî re digihîje hev, ancax bi vî rengî dikare were amadekirin.” (Holmstrom, 2012: 165).

Ji vê tespîte jî diyar e ku têkilîyên zayendî divê ji dorpêçkirina feraseta mêranî a serdest were cihêkirin û ji aliyê jinan ve cardin werebimanekirin.

3.1.8. Jin û Jin

Rolên zayenda civakî, epîstemolojîyên hatine hilberandin, rêgezên sincî, têkilîyên îqtîdarî, rewşa polîtîk; jin wek dîke pênase kiriye û ew di qada jîyanê de li her derî bi dîkebûn û kêmbûna wê ve bi sînor kiriye. Ev dîkebûna ku jî aliyê mêran ve hatiye afirandin, sazîkirin û bicîkirin, gihiştîye sinorekî wisa ku bandor li hişmendîya jinan jî kiriye. Gotarên wekî, jin heyîneke dexes e, bi dek û dolaban heye, ji hemzayendên xwe hez nake, bêtrade ye û hwd. bi kodên zimanekî nêrane

hatine afirandin û jinan bixwe jî bawerîya xwe li van gotaran anîne. Yan jî em dikarin bêjin ku di nav sedan salan de ev kodên nêrane ên bi rolên zayenda civakî hatine afirandin di hemû qadan de wek rasteqînîyeke normal hatiye nîşandan. Zanist, epîstemolojîyên ku hatine hilberandin, psîkolojî, dîrok, felsefe, ol û wêje û hwd. ji van qadan in ku jin bi rolên dîkekîrî, kêmxistî û bêkesayet pênase kirine. Jina ku li hember hemzayenda xwe bi van kodan tevgerîyaye hay pê nebûye ku bi kodên zimanekî nêrane tevgerîyaye. Piştî geşedanên rêxistinên femînîstî û teorîyên femînîst, hişmendîyeke nû derketîye holê û di warê pûçkirina epîstemolojîyên ku hatine hilberandin de pêngavên pir girîng hatine avêtin. Rexneya femînîstî a wêjeyî jî yek ji wan qadan e. Wekî ku me demên berê jî anîbû ziman, rexneya femînîst a wêjeyî hewl daye ku metnan bi hişmendîyeke nû binirxîne û hînbûyîn û kodên der barê jinan de birûxîne. Rexneya femînîst a wêjeyî; hûrlêgerîna dîroka wêjeya nêrane û tekstên ku bi zimanê nêrane hatine nivîsîn, xuyanêkirina nivîskarên jin, avakirina hişmendîya “xwînerên femînîst” û bi nivîsar û tevdehiyeke xwendinê re, avakirina zimanekî ku “aîdî jinan e û jinane ye.” ji xwe re kiriye armanc. Di ser van armancan re, qalib û gotinên zayendparêz ku di tekstên wêjeyî de hene, aşkera kirine. Di warê wêjeyî de dijmintiya ku li hember jinan pêk hatiye, hatiye aşkerakirin û pê re jî ziman û kodên nû hatine afirandin.

Di berhemên Dilawer Zeraq de têkilîyên hemzayendîtîyê ên jinan, ji derveyî kodên nêrane ên hînkirî û bi pêşdaraz in. Wekî ku me demên berê jî diyar kiribû, Zeraq di navenda vegotina xwe de jinanbi cî kirine û digel wan jînên serleheng jinên dîtir afirandîne û bi têkilî û parvekirinên wan jinan dijmîntîya jinê a li hember hemzayenda xwe hilweşandiye û ew bi kodên jinane afirandiye. Yasemîn û Seyran, jina hemşîre û keçîka kevir lê hatiye barandin, hemşîreya nobedar û keçîka panzdeh salî, dayîkên windayan û şervanan, Narîn û hevalên wê ên bi navê Seyran û Zêrîn, Şermîn û Gulbîn, Seyran û xwesîya wê Dayika Sêvê, Rewşen û Arya ew jin in ku di tekîlîyên hemzayendîtîyê de derdikevin hember xwîneran.

Şevên Winda Wêneyên Meçûl bi vebêjîya Yasemînê dest pê dîke û bi hevnasîna Yasemîn û Seyranê dikude. Yasemîn, bi çavnêrîyên xwe û meraqa xwîner digihîjîne Seyranê a serleheng romanê. Xwîner bi saya şahidîya Yasemînê, bi çîroka Seyranê, a ku me heta niha bi hûrgilî qal kir, dihise. Seyran û Yasemîn hem temsîlkarên jêbûnîyê ne hem jî temsîlkarên nejihevtîyê ne. Jêbûnîya wan ew e ku

wek jin her du jî bindestîya jinan a ku ji çîna duyem in û wek hemû jinan her du jî di bin dîyardeya gerdûnî a newekhevîtîya zayendîde şikeste xwarine. Nejihevtîya wan jî ew e ku Yasemîn ji nijada serdest e; lê belê Seyran ji nijada bindest e, Yasemîn perwerdedîtî, Seyran kêmpeweredîtî ye. Bi guhertin û şahidîya Yasemînê, xwîner dibîne ku jin ji jinan fam dikin û jin bi jinan re şoreşa xwe pêk tînin. Çendî ku Yasemîn li gorî Seyranê bi avantaj be jî ji aliyê hişmendî û hişyarî ve jiyana Seyranê deriyên nû ber wê vedike. Hevnasîna wan a ku di Şevên Winda Wêneyên Meçhûl de dest pê dike, di pirtûka seyîneyê a dawî, di Nexşên Li Giyan de dewam dike. Jiyanê û qewlê Seyranê, Seyran ji mal derxist û tevî qada giştî kir; zilma ku Seyranê dît û çîroka Seyranê a ku jî Yasemînê re qal kir jî Yasemîn tev li wê qada giştî kir. Du jin bi hev re heyî û zêde dibin, li hev zêde dikin. Rojek, şemîyek dîsa Seyran beşdarî çalakîya Dayîkên Roja Şemîyê dibe û ew roj dor dora wê ye ku dê çîroka windayên xwe bêje. Lê di cîyê xwe de dişewişe, çokên wê dişikên û ditewire erdê. Piştî ku wê dibin nexweşxaneyê û dûre Yasemîn wê dibe mala xwe û çîroka hevaltî û hogirtîya du jinan dest pê dike. Yasemîn wê destpêkê bi van hevokan tîne zimên:

Wê gavê, ez bi xwe hisiyam; min ji wê rojê de bû; ji wê roja ku çok dabû erdê û li ser navê me, li ser navê me hemû jinan pihînen desthilatdarîya bi hezaran salan di nav piştî xwe ya westayî de nerm dikir, xwestibû ku wê hembêz bikim. (Zeraq, 2005: 33).

Edî wextên hevnasînê, jihevfamkirinê, parvekirinê, pardariya êşan dest pê dike. Bi hembêzkirina her du jinan hevalbendî û hestbendî dest pê dike. Zeraq, di honaksazîya metnan de gav bi gav jinan bi hişmendîyeke jinane bi hev dide nasîn û pê re jî bi xwîner dide nasîn. Ne bi kodên zimanekî nêrane; bi kodên zimanekî jinane.

Heman rewş ji bo lehengên jin ên romana duyem a sêyîneyê jî derbasdar e. Di Mirina Bêsî de, hevaltîya jinan a ku bi hestbendî pêk tê, di cîhana wan de pêk tê û çendî ku cahil in, hê bihara jiyana xwe dijîn dîsa jî di warê hogirtî û hemrêtîyê de xwedî bîr û hiş in. Laleş a ku dexesîya Narînê dike, li hember hestên xwe yên dexesane têk diçe di nav honaka romanê de dihele û winda dibe. Zêrîn û Seyran, li hember jihevhezkirina Narîn û Mîrza birêz tevdigerin û çî piştgirî ji destên wan bê ji wan teksîr nakin. Piştî salan, roja ku Narîn dibihîze ku Hogir (Mîrza) hatiye kuştin di bîra bîranînên xwe de winda dibe û dîsa bi hevalbendî û hestbendîya jinekê tê ser hişê xwe. Ew jin keça Narînê a bi navê Arîn e. Arîn, a ku bi kodên Narînê, bi kodên jinane mezin bûye, bi wan kodan bûye jin.

Di çîroka bi navê *Mirinek Nermijî Di Mesîla Evînê Dede* bi mehan digel doxtoran hemşîreyek xwedîtî li keçika ku kevir lê hatibû barandin dike. Hemşîre, jineke taybet û bijare ye. Ne ku gunehê xwe pê tîne, hewl dide ku bi hestên xwe ên jinane here dilê wê, birînên wê bikewîne û ‘neçarîya wê a mê’ derman bike û ‘sosretîya ku lê qewîmî’ ye pê bide jibîrkirin. Keçika ku ji peyvan xeyîdîye û xwe spartîye bêdengîyê, hest bi destdayînen hemşîreyê ên nerm, dayikane, jinane û mirovane dike û digel bişîrînekê derîyê dilê xwe jê re vedike. Bi bişîrînekê, du dilên jinane ên li hember serdestîya mêrane rabûne û dest dane hev, hev hambêz dikin. Çendî ku, keçik sîbetirê xwe ji pencerê biavêje jî hemşîre dizane ku ‘mirin jê re dawîyeke nerm’ e û keçika ku kevir lê hatiye barandin ‘kan û kakîla jinbûna xwe bi dest’ dixê.

Di çîroka bi navê *Bişîrîna Şermînê* de hevala Şermînê dixwaze sedema kesera wê hîn bibe. Gava Gulbîn, Şermînê dide zorê ku bila derd û keserên xwe bi wê re parve ke, Şermîn hemû şikestinên xwe ên ji alîyê mêran ve pêk hatiye jê re yekbiyek dibêje. Çendî ku dengê Gulbînê a hundirîn car çaran li hember xweşikîya Şermînê bi pistînîyeke dexesane were bihîstîn jî, dîsa jî dengê hestên hogirtîyê girantir tê û gava Gulbîn ji şikestinên Şermînê haydar dibe piştgirîyeke xurt a dostanê didê. Û dîsa jinek jinekê tîne ser hiş; ew hişê ku divê di bin serdestîya mêrane de neyê pelixandin. Dibêje:

Keçê heke tu guh bidî gotinên der û dorê, divê tu bi mêran re hevaltîyê nekî, bi wan re ranebî û rûnenî. De îcar mêtîya te li ku ma...? ... Revena Xwedê! Te digot qey Xelo û Seyîtxan çî bi te kirine... êdî bes e! Hişê xwe bide serê xwe.” (Zeraq, 2016: 47).

Mêtîya ku ji alîyê mêran ve hatiye çewisandin ji alîyê jinekê ve tê bibîrxistin û piştgirîya hêzdayîne tê dayîn.

Di çîroka bi navê *Lihêfa Şevê* de jî du jin hene. Jina hemşîre a nobedar û keçika ku ji alîyê du polêsan ve ji bo muayeneyê hatiye nexweşxaneyê. Di vê çîrokê di destpêka çîrokê de, wekî yekem car di honaksazîya Zeraq de jineke ku xwedî awirtêdaneke cuda ye derdikeve pêş xwîneran. Wekî ku me di demên berê jî anîbû ziman, hemşîreya nobedar bi kodên nêrane ên serdest jinan bi mane dike û bi zimanekî neyînî û kêmxistî qala hevzayendên xwe dike. Lê belê ev feraset di nav honaksazîya çîrokê de têk diçe. Ji ber ku gava ji çîroka keçikê a panzdeh salî agahdar dibe, ji rasteqînîya jîyanê a kermegirtî, a herimî û a ji mîrovbûnê daketî agahdar dibe.

Gava polêsê ku ew anîye, rapora paqijbûnê ji destê doxtor werdigre û keçik bi mexdûrîyeta ku xwe dispêre paş perdeya jintîyê, serê xwe di ber xwe de xwar dike û dide dû wî û diçe, hemşîre pê dihise ku ‘edla dinê’ bo her kesî ne eynî ye. Hemşîreya ku lê ye vereşe, ji şevê û ji keçika panzdeh salî a qehpika mecbûrmayî, tiştêkî fam dike. Dixwaze jintîya xwe ya di paş perdeya tenik û şermê de asê maye vereşe, ji hundirê xwe derîne û şilf û tazî bimîne.

Hestbendî û hevalbendîya jinan a ku li derveyî kodên mêrane mane, herî zêde di romana dawî a sêyîneyê de derdikeve pêş xwîner. Di *Nexşên Li Gîyan* de çî tekilîyên jinên şervan çî jî tekilîyên dayikên şervanan û windayan bi awayekî pêşketî û tekoşer tê şayeskirin û pênasekirin. Du jinên şervan li derveyî hemû kodên hînbûyî û gerdîşî, wekî du kesên ji nû ve afirîne, hatine şayeskirin. Dayikên windayan û şervanan, jinên ku hevserên wan winda ye, jinên ku –wekî Yasemînê- piştgirî didin wan, bi rûxandina kodên nêrane ên bi sedan salan serdest bûne, xwe heyî dikin û dibin kirdeyên jiyana xwe. Ji wan her yek xwedî kesayet e û serbixwe ye. Jinên ku di bîryarîya yarmetî û parvekirinê de giranîyan û êşan li hev sivik dikin.

3.1.9. Mêr û Mêranî

Mêr û mêranîya ku di dîrokê de bi serpehatîya mêrane di asteke bilind de hatiye pênasekirin, wekî ku normalîzasyona jiyane bixwe ye jî hatiye nîşandan. Duparkirina mîrovahîyê li ser vê ferasetê ava bûye û wekî ku mafên zikmakî ne hatine qebûlkirin. Ev ferasata ku ji alîyê mêran ve, ji bo mêran û bi kodên nêrane ên serdest hatiye afirandin, bi xebatên tevgerên femînîst têk çûye. Diyar bûye ku rolên ku wekî qanûnên siruştî hatine nîşandan ji alîyê serdestîya nêrane ve di sedan salan de hatiye afirandin, sazkirin, hinkirin û cîbicîkirin. Çî epîstemolojîyên heyî çî jî dîrok, sosyolojî, felsefe, wêje, hunerên plastîk, tip... û hwd. di bin ronahîyên nû de hatine nirxandin. Mêrtî, mêranî, mêr jî yek ji wan mijaran e ku bi gelemşeya jinê ve û femînîzmê ve têkildar e. Çendî ku tevgerên femînîst, teorîsyênên femînîst hewl dane ku gelemşeyên wekî: qada giştî û taybet, pênaseya bavkanîyê, zayend û zayenda civakî, gelemşeya der barê kurtajê de, şîdet û kodên gerdîşê û kodên modernîzmê, temsîliyeta jinan a di wêjeyê de û tiştêbûna jinê binirxînin û çareserîyan peyda bikin jî, mixabin her tim gelemşe mîna ku gelemşeya jinan bixwe be, hatiye famkirin û li

ser bîrewerkirina jinan hatiye sekinandin. Halbûkî, alîyê gelemşeyê a herî girîng ew e ku divê di çareserkirina gelemşeya bindestxistina jinan de wekî ku rolên mêran tê pênasekirin divê birewerkirina mêran jî bê nirxandin û mêrê alternatîf jî bê berçavkirin. Di jihevparvebûna ku ji alîyê mêran ve hatiye sazîkirin de rolên mêran pir aşkera ye; lê belê mêr û mêranî têra xwe wekî pirsgirêkekê nehatiye pênasekirin û di warê veguherîna mêran de xumamîyek derketîye holê. Pirsê herî girîng ew e; bîrewerkirina mêran divê bi çi awayî pêk were? Wekî ku di pirtûka bi navê ‘Jineolojiye Giriş’ê de jî dupat lê hatiye kirin:

“Her çi qas di literatura femînîst de, hişmendîya mêrê serdest bi awayekî berfireh hatibe rexnekirin jî, çareserî tene li ser bîrewerkirin û hişmendkirina jinan hatiye danîn. Guherîn û veguherîna meran, hişmendbûna mêran a di warê zayend û azadîyê de, birêxistinkirina meran a bi awayekî ku karibe di azadîya civakî de rola xwe bilîze, li xwe nekiriye berpirsiyarî. (Jineolojiye Giriş, 2015: 95).

Berhemên Dilawer Zeraq ên ku me gotibû ku di navenda çîrok û bûyeran de her tim jin bi cî bûne, di vî warî de hin bersiwan dihewîne. Di honaksazîya Zeraq de, jina ku bi awayekî rasthatî li derdorê mêran nehatiye bicîkirin û temsîlkirin û mêrên ku bi wan jinan re bi awayekî têkildar in hene û temsîliyeta jinê di bin sîya wan mêran de pêk nehatiye. Em dikarin mêrên ku di berhemên Zeraq de derdikevin li pêşberî xwîneran di du beşan de li hev dabeş bikin. Mêrên ku li gorî normên gerdîşê û bi kodên nêrane tevdigerin û yên ku kodên nêrane diderizînin û ber bi guhertinekê ve ne.

Mêrên ku li gorî normên gerdîşê û bi kodên nêrane tevdigerin, îqtîdarê bo mêranîya xwe bi kar tînin û di dîmênên wekî: lêxistina mêrekî a li jinekê, tecawizkirina mêrekî a li jinekê, di axavtin û parvekirinên takekesî de kêmxistin û piçûkdîtîna jinekê û xwedîtîlêkirina mêran a li jinekê, derdikevin pêş xwîneran û di nav wan dîmenan de tînin şayeskirin. Ehmoyê kulek, ê ku tecawiz li keçikeke xama dike, dikandar û mêrên din jî keçikê her tim wekî tiştayeke ku dikarin zorgayî lê bê kirin dihesîbînin; jixwe wisa jî tevdigerin. Mêranîya wan digel zimanekî gemarî û giyanekî dilgemarî pêk tê. Heman rewş ji bo Xelo û Seyîtxanê xwende jî derbasdar e. Çendî ku wekî bi kiryara tecawiz lê kirinê dernekevin pêş xwîner jî, dîsa jî têra xwe desthilatdar û şikîner in. Şîdeta ku bi kar tînin çi bi peyvên ji jî bi şimaqekê, jixwebawerîya jinan tîk dibin. Polêsên ku keçika panzdeh salî ji bo muayeneya

bekaretê tînin nexweşxaneyê û şîrikên wan ê xwedîyê kafeye, hemû bi kodên nêrane ên serdest tevdigerin û ji bo hemûyan jî jin wekî tiştayeke berdel û pêguhorê ye û pir erzan e û ne xwedîyê hest û fikran e. Ji ber vê yekê ye ku mêrên xwedî simbêlên pereşûtî, dikarin keçikeke xama darizînîn û cezayê kevirlêbarandinê lê layiq bibînin. Dikarin wekî leşkerê ku di Agirê Şermê dekeçikê dixapîne, jinan bixapînin. Keçika ku ji alîyê leşker ve tê xirandin agir li canê xwe dide. Mêrên ku îqtîdarê bo mêranîya xwe bi kar tînin, li pişt xwe jinên mexdûr dihêlin. Yek xwe ji pencerê diavêje, yek agir li canê xwe dixwe, yek aqil diavêje, yek bixwebawerîya xwe winda dike û yek jî destên polês û xwedîyê kafeyê dibe tiştaya firotinê. Em dikarin bêjin ku dîmenên neyînî ên ku jin di tê de hatine bicîkirin, bi temamî ji bo rexneya gerdîşa genîbûyî, rolên zayenda civakî, bavkanî û kodên zimanî ên nêrane hatine afirandin. Ji ber ku nivîskar bi awayekî aşkera di wan dîmenan de zimanekî dekonstruktîf bi kar tîne û kod û serdestîya mêran dirûxîne. Wekî mînak em dikarin van hevokan nîşan bidin.

“...Ji bo bend û bedenên qesra nêr, di nava kevir û tehtan de bûbû xerca zexmkirinê...” (Zeraq, 2016: 21)

“...ji bo ku ji rê û rêçikên qayde û yasayan avarê nebin, bi badana simbêlên pereşûtî, li hev şewirîn.” (h.b. 25)

“Û coyê pišta wan ê pêxweşîyê fireh bû, fireh bû; aviya şîrî zor da pizîyan; orîna orgazmê bi wan ket û jina ku wan ê tu car nikaribûna wekî wê hez bikirana, li ber çavê wan bû wekî efrît...” (h.b. 26)

Di honaksazîya berhemên Dilawer Zeraq de wekî mêrên ku li jor me qala wan kir, mêrên ku bi hemû kodên xwe ve temsîlkarê çanda mêranî ya serdest in; mêrên ku alternatîfa wê çandê ne jî hene û ew jî beravajîya wan meran, li hember gerdîş û kevneşopîya genîbûyî helwest girê didin. Mêrên wekî Sevdîn, Ezîz Beg, Mîrza (Hogir), Mamoste Filît, kurê meta bavê Yasemînê, patronê Yasemînê ê pirtûkfiroş, Nadir ê ku birayê Narînê ye di warê temsîliyeta mêrên ku xwedî hiş û bîr in derdikevin pêşberî xwîneran û nivîskar bi awayekî hişyarîbirewerkirina mêran li xwe dike armanc û mêrê alternatîf jî bi ber çav dike.

Seyran ji bo Sevdîn dibêje ji bavê min cuda bû. Û pê ve diçe û dibêje mirovekî pir fambar û tegihîştî bû, der heqê sarî û dilsarîya min de tu tişt nepirsî û bi sebra xwe û zanîna xwe kiribû ku ez jê fêhm bikim, dilê min lê vebe, lê germ bibe û ez

jê hez bikim. Hevalnavên ku Seyran ji bo Sevdîn bi kar tîne û wî digel wan hevalnavan pênase dike ne tenê ev in. ‘Bîrewer’ û ‘zana’ ji wan hevalnavan in ku Seyran sedema jêhezkirina xwe a ji Sevdîn bi xwîner dide hisandin û famkirin. Sevdîn bi axavtin û tevgerên xwe rê li ber Seyranê vedike da ku Seyran bikaribe bawerîya xwe bi xwe bîne, xwe baş bîne ziman, hewl bide ku mirovan jî serwext bike. Mêrên bi vî rengî ku di gundan de wisan zû bi zû peyde nabin, bi temsîliyeta Sevdîn û çend hevalên wî, mêranîya li gundan heyî diderizîne û rê li ber hişmendîyeke nû vedike. Sevdîn bi liv û tevgerên xwe, bi sebr û hedana xwe, bi gotinên xwe ên watedar, bi fambarîya xwe û bi awayê hezkirina xwe ve, şikestinên Seyranê ên ku ji demên xwestin û zewacê de çêbûbûn, pê dide jibîrkirin, birînên wê ên jinane dikewîne. Ji wir jî evîn dest pê dike ku nivîskar dîsa bi hişyarî ‘hezkirin’ê ji kodên zayenda civakî xelas dike û têdixe çarçoveya hevparîyê. Her çi qas Faris wekî Sevdîn pêşketî nebe jî, li hember Seyranê ew jî her tim rêzgirtî tevdigere û ew jî tu caran bi kirinên xwe û gotinên xwe dilê Seyranê nahêle. Seyran dibe temsîlkarê hemû jinan û dibêje: “Hemû tiştên ku di jiyane de li ser navê jinbûnê ji dayika min hatibû texsîrkirin, li mala Bişarê Çeto, pir bi rehetî û bi awayekî ecêb xweş li hember jinan dihate nîşandan.” (Zeraq, 2005: 77). Wekî ku me gotibû Zeraq bi hişyarî mêrên wiha afirandîye, bi rastî jî em dikarin bêjin ku mala Bişarê Çeto wek alegorîya hişmendîyeke nû û ji derveyî bavkanîyê hatiye bikaranîn.

Ezîz Beg, serlehengê çîroka bi navê *Hêvîya Ezîz Bege*. Gav qîza wî Hêvî hatiye dinê Ezîz Beg di girtîgehê de bûye û piştî pênc mêmên bînavmayîna pitikê ev nav li keça xwe kiriye. Li hember tajan û heqeretan, kirin û gotinên rûmetşikên, panîyên wek hinaran qelş lê ketî, meşandina li ser xweyê, mana di ava sar de ên di şêvên zivistanan de, bi hêvîyan li ser pîyan maye û bi hêvîyan ji rojên dojhê filitîye. Niha mêvanên xêrê werin, mêvanên ku hatina wan, kîbûna wan, ji ku hatina wan hemû wek pîrsek di mêjîyê Ezîz Beg de tê û diçe. Keça wî Hêvî biryara xwe daye, her tişt diyar kiriye û dixwaze ku xortekî ku ji Anatolîya navîn e û bavê wî jî leşkerekî ji salên dojhê ye. Biryardarîya Hêvîyê, salên dojhê û qijînên di guhê Ezîz Beg de, ew ên ku bi şehwetên xwe ên genî destdirêjêya jin û keçan kirine, ew ên ku meytên keç û xortan li paş erebeyen kişkişandine û ew ên ku ser û guhên mirovan jê kirine û dilê Ezîz Beg ê westîyayî. Ne ku dilê keça xwe dihêle, tenê xwe dide ber pirsan. Ji xwe re dibêje: “Gelo min çi kêm hişt...? Şaşitî li ku derê çêbû...” (Zeraq,

2016: 53). Belê, Ezîz Beg her çi qas biêşe jî li hember tercîha keça xwe rêzgirtî tevdigere û ew 'na'ya ku ji keça xwe re nabêje di hilma wî a dawîn de difetise.

Mîrza, Mamoste Filît, Nadir ê birayê Narînê, bavê Narînê, Kekê Qedrî, Cembelî, Zibeyr, Beşîr, Cemal, ji çend mêr in ku di Mirina Bêsî de derdikevin pêşberî xwîneran. Mîrzayê ku di salên berîya darbeya 12ê Îlonê de bi awayekî xurt û pêşeng tevdigere wekî serlehengê romanê ye. Di honaksazîya Zeraq a ku di navbera demên bê û îroyîn de derbas dibe Mîrza, cî bi cî bi navê Hogîr derdikeve pêşberî xwîneran. Mîrza yê ku di demên bê de tev li tevgerên şoreşger bûye xwedî hişmendîyeke zelal û pêşketî ye û kesekî birewer e. Gava bi navê Hogîr di demên îroyîn de derdikeve pêşberî xwîner, xwîner dibîne ku bêhtîr xurt e û xwedî berpirsaryêke girîng e. Hogîr, piştî salên ku hin caran bi serhîlatî hin caran jî di girtîgehan û di şikenceyanxaneyê de derbas bûne, digihîje rojên îroyîn. Gava sê kes tî û şevêkê wî ji mala wî dibin û ew bi mecbûrî piştî xwe dide her du zarokên xwe û Xangul xanîmê, Serokê Partîya Gel û Kedê ê Amedê ye. Çûyîna dawî û mirineke bêsi. Çi bi navê Mîrza çi bi navê Hogîr, di hemû deman de mêrekî pêşeng û birewer derdikeve pêşberî xwîneran. Mêrekî ku emrê xwe ji bo bawerîyên xwe kudandiye û di ber azadîya gelê xwe de ronaya çavên xwe rêtiye. Mêrekî ku kodên nêrane ên serdest hem di hişmendîya xwe de hem jî di pratîkê de guherandiye û bi hişmendîyeke şoreşgerane tevdigere. Ji ber vê yekê ye ku hê di salên berîya darbeya Îlonê, li komelêyê ew û du jin li ser kevneşopîya genîbûyî, a ku jin bindest kiriye, diaxivin, didin û hildidin. Hogîr hemû jiyana xwe bi kodên şoreşgerane û pêşverû dijî. Çendî ku mêrên din di dem û dîmenên kin de hatibûn şayeskirin jî, xwîner pê dihise ku her yek jî li hember gerdîşê û kodên nêrane ên serdest kêr zêde ber bi guhertînekê ne an jî şoreşa xwe pêk anîne. Dîsa jî li hember van mêran mêrên ji rêzê jî hene. Wekî Cindî. Cindî jî wekî her kesî tê diçe komeleyê, di xebatan de ked dide, ew û xwişka xwe bi hev re tî diçine komeleyê. Lê belê Cindî li hember dexesîya xwe a mêrane têk diçe. Cindî yê ku dil daye Narînê, gava pêdihise ku di navbera Narîn û Mîrza de têkilîyeke taybet heye, dide pey dek û dolaban û xayîntî li Mîrza dike û wî îxbar dike. Mîrza mecbûr dimîne ku wek firarî bijî. Wê havînê jî, Narînê didine Seîd û her du heta hetayê ji hev diqetin.

Ji xeynî van kesan çend mêrên din jî di romanê de hene ku bi gotina Hogîrî dibin sîya mirina Hogîr. Derdo, Çakır, Kaygusuz û Acem. Temsîlkarên îqtidara

mêrane a dewletî, temsîlkarên şikencekaran û temsîlkarên ji mirovbûnê dûrketinê ne. Piştî şikenceyeke xedar, Hogir didin ber guleyan û dibin kujerên wî.

Em dikarin wek giştî bêjîn ku di berhemên Zeraq de, gelemşeya mêrbûnê û mêranîyê çi bi temsîlkarên gerdîşî çi ên alternatîf û pêşverû, di derdora gelemşeya jintîyê de heyî bûye û ji bo zelalkirina gelemşeyên dîrokî ên der barê jinan de hatiye bikaranîn. Hebûna Hogir her çi qas tena serê xwe bi qîmet û girîng be jî û ji derveyî pêjnkarîya Zeraq a ku di navênda vegotina xwe de jinan bi cî dike xuya bike jî, dîsa jî bi awayekî di çarçoveya gelemşeya jinan de hatiye nixandî. Wekî ku me di serî de jî gotibû, alîyê gelemşeyê a herî girîng ew e ku divê çareserkirina di gelemşeya bindestxistina jinan de wekî ku rolên mêran tê pênasekirin divê bîrewerkirina mêran jî bê nixandî û mêrê alternatîf jî bê berçavkirin.

3.1.10. Dayiktî

Dayiktî, peyveke e ku ji alîyê mêran ve payeyeke giran lê hatiye barkirin. Piştî têkçûyîna daykanîyê a li hember bavkanîyê wateyên jinan hemû ji asta xwe hatine daxistin û hebûna jinê di nav zanava dayîktîyê de hatiye hepskirin. Dayiktî wek pîroz hatiye pênasekirin û di bin vê pîrozbûnê de hebûn û serdestîya mêran a mêrane hatiye nixumandin. Ji ber ku jin jî wan pênaseyan wek rolên xwezayî qebûl bikin di sedan salan de çi bi gotarên felsefî, çi bi gotarên olî, çi bi gotarên bîyolojîk jinbûn her tim bi dayîkbûnê ve hatiye sînorkirin. Car hatiye bi bihuşta di bin pêyê dayîkan ve, car hatiye bi xwedîbûna zarokên kurîn ve, car jî hatiye bi gotarên olî û mîtolojîk ve jinbûn bi kêmbûnê ve hatiye hevwaterkirin. Lê belê piştî geşedanên tevgerên femînîst diyar bûye ku ew senaryo ji alîyê mêran ve hatiye sazîkirin û lîstin, bi mebest û bi armanc tevgerîyaye ku jinê bi rola dayîkbûnê ve pasîf bike û vê pasîfbûnê jî wek zanîstbide qebûlkirin. Dayîkbûn tê wê maneyê ku divê cîyê jinê her tim mal be û divê jin ji bo berdewamkirina ajara mêran zarokan bîne dinê û wan mêzin bike.

Dayîktî jî yek ji wan sazîyan û rolan e ku Zeraq li deconstructionê xistiye û bi kodên nû pênase kirîye û ji kêmxistina serdestîya mêrane dûr xistiye. Wekî ku Handan Çağlayan di pirtûka xwe ya bi navê *Analar, Yoldaşlar, Tanrıçalarda* dupat lê dîke ku bi taybetî jina Kurd û dayîkên Kurd bi çalakîyên kolektîf zanaveke nû bi dest

xistin. Çağlayan pê de diçe û dibêje “Nasnava Dayikîyê bûye xwedî naverokeke civakî û polîtîk..” (Çağlayan, 2014: 209).

Di berhemên Zeraq de jî heman tez tê parastin û di vê çarçoveyê de temsîliyeta dayikan pêk tê. Dayika Sêvê xwedîyê du kurên winda ye. Seyran dayika sê zarokan e û jina du windayan e. Zeyneba dayika Bado ye û Bado di hêmbêza wê de can dide û kiryarên kuştina wî ne diyar in. Xangul xanîm dayika du zarokan e û mêrê wê, Hogir, wekî ku kiryarên qetilkirina wî ne diyar in hatibe nîşandan jî, aşkera aşkera tê qetilkirin. Meryem, ya ku dayika Xelo ye û di xewnên xwe de ji şivanekî pîrsa Xeloyê xwe dike; Xeyce, ya ku dayika Menîcê ye û di xewnên wê de keça wê her bang li wê dike jî dayîkên windayane. Zarokên wan ên şervan her tim tînan xewnên wan û dayik nizanin ka zarokên wan sax in an mirî. Qada giştî a ku hemû dayîkan di bin banê xwe de digihîjine hev çalakîya ‘Dayikên Roja Şemîyê’ ye. Zanava dayikîyê a ku rengê naverokeke civakî û polîtîkîgirtîye û bi xwe re hin kodên mêrane ên serdest rûxandîye. Qedexebûna qada giştî a ji bo jinan bi wan çalakîyan hatiye şikandin û pê re jî maneya ‘namûsê’ guherîye; ji ber ku namûs ji kodên nêrane ên ser navê jinan hatiye diyarkirin dûr ketîye bûye zanaveke kolektîf. Ziman, parastina axê, xwedîderketina windayan, rabûna lihember zilm û zorê, hemû jî kodên namûsê ên nû ne. Dayik, li qadên giştî, tekoşîna namûsa xwe didin. Di Şevên Winda Wêneyên Meçhûl de gava cara yekem Yasemîn çalakvanên Dayikên Roja Şemîyê dibîne ecêbmayîna xwe bi wan hevokan tîne zimên. “... min tu car nedîtîbû û lê nebûbûm şahid û govan ku mirov, bi taybetî jin, li derve, li kuçe û kolanan li hev bicivin, bi qîrîna sloganan bimeşin û bi dem û wextên diyarkirî li erdê rûnin.” (Zeraq, 2005: 13). Zeraq, bi şayesên xwe û bi dîmenên ku dayik tê de bi cî kiriye, kodên bavkanîyê diderizîne û dide ber rexneyan. ‘Kodên dayikîyê’ ên ku her tim digel hestan hatiye pênasekirin; bi îrade, bi kesîdetî û bi hêz ve pênasê kiriye.

3.1.11. Şer û Koç

Epîstemolojîyên ku heta heyama modernîzmê hatine û piştî jî modernîzmê bixwe dîrokeke ku jin tê de wek tune ye, saz kirine. Saz kirine, ji ber ku di wê dîrokê de jin herî zêde yan wekî figuranek yan jî wekî efrîdek hatiye şayeskirin. Çi gava ji bo propagandayên militarîzmê an jî ji bo nijadperestîyê, wek tişte, hewcetî bi jinan

çêbûye, di wan deman de jî tiştêyeke ku canê wê jî canê zarokên wê jî di rêya mêran de wekî ku qurbana wan be, hatine pênasikirin. Dîroka ku li ser şeran û li ser mêrxasîya mêran hatiye avakirin, dîsa bi dest û hişmendîya diroknivîsên mêr jin bi her awayî li derve hiştiye. Di wê dîrokê de bêrdêla ku jinan daye, êşa ku jinan kişandiye, tecawiz û zorgayîna ku jinan dîtiye, bêwelat û bêziruyetmayîna jinan ne hêjayî qalkirinê hatiye dîtin. Jixwe tiştêya ku ji bo mêr hatiye afirandin jî ne hêjayê vê qîmetê ye(!). Geşedanên der barê femînîzmê de û geşedanên teorîk ên ku kodên modernîzmê, oryantâlîzmê, kolonyalîzmê, bişaftinê, bavkanîyê, zayenda civakîyê, dijberîyên ku ji alîyê mêran ve bi zanetî hatine afirandinê, daye ber rexneyê. Hûrsekinandina li ser wan mijaran aşkera kiriye ku wekî gotina Kate Millett, ev rewş ji ber polîtîkayên zayendî pêk hatine. Û dîsa hatiye aşkerakirin ku wekî hemû qadan di qada wêjeyê de jî jin bi van kodan hatine cîbicîkirin. ‘Şer û koç’ du têgih in ku wek sedem û encam bi hev ve girêdayî ne. Di nava xwe de daneyên sosyolojîk, polîtîk, ekonomîk, psîkolojîk û hwd. di hewîn in ku; yekji wan daneyan jî der barê berzebûn, mêtin, pêpeskirin û bikaranîna jinan de ye. Cerdevanî, koç, kuştinên kiryar nediyar, avêtina ser malan, şîdeta devkî û bedenî ku hemû jî ji ber şer diqewimin û jinên ku di nava van kiryar û pêkanînan de asê mane, awayê têkilpêdanîna jinan a bi van demajoyan re, jinên ku diteriqin û derbider dibin, pardeya hevpar a lehengên jin ên Zeraq in. Her yekê, bi awayekî ji awayan, para xwe ji travmayên civakî ku ji ber şert û mercên şer çêbûne û qewimîne, girtiye. Tecawiz, fuhûş, bixwenebawerî, xizanî, êşa zarokan, hestê neçariyê kul i dû windayan çêdibe, hemû jî; dipeyitînin ku tiştên ku tên (û hatine) jiyandin ne kesîdeyî ne û li paş perdeya wan temsilîyeteke polîtîk û civakî a qerase û mestûmezin heye.

Em dikarin bêjin ku jinên ku di navenda vegotina Zeraq de cî girtine hemû jî bermayîyên windabûnekê ne. Windakirîyên windabûnan in. Hin caran tiştê winda kirine zarokên wan in; hin caran mêrên wan, hin caran hevalên wan, hin caran jinantîya wan, hin caran hiş û aqilê wan, hin caran mal û milkên wan – warên wan, hin caran bixwebawerîya wan, hin caran zaroktî û keçxamatîya wan a ber biharê û hin caran kesîdetîya wan e. Em dikarin bi giştî vê tespîtê bikin ku berhemên ku em li ser hûr sekinîn hema bêje hemû jî li ser wan windakirin û windabûnan ava bûye. Çîrokek an jî romaneke ku li derveyî jiyana ku di bin bandora şer de maye tune ye. Qewimînên ku Zeraq honaksazîya metnên xwe li ser wan ava kiriye, hemû jî, yek bi

yek bi şer ve tekîldar in. Ji ber vê yekê ye ku di honaksazîya Zeraq de jineke ku bi pêvajoya şer ve yan jî bi encamên şeran ve ne pêwendîdar be tune ye. Jinên di her çar berhemana de cî girtine ku mijara xebata me ye, di nav rasteqînîya şer de hatine şayeskirin û digel tecrûbeyên wan, dîfîna wan, bi hest û ramanên wan rasteqînîya Kurda a çil salên dawî hatiye nîşandan.

Dayika Sêvê û Seyran du jin in ku dane dû doza windayên xwe. Sevdîn û Faris du bira û du winda ne ku li paş xwe sê zarok û du jinhiştine ku berdêla şer bi windakirina hezkirîyên xwe dane. Keçika ku di bin Ehmoyê kulek ê cerdevan de diçilmise û aqilê xwe, keçxamatîya xwe, gundê xwe, mala xwe, jinanîya xwe diavêje, bi awayekî din be jî wek Seyran û Dayika Sêvê kesê windakirî ye. Şermîna delal û xweşik di bin şîmaqa Xelo û mêranîya Seyîtxan a serdest de bixwebawerîya xwe winda dike. Keçika panzdeh salî a ji aliyê xwedîyê kafeyê ve û bi şirikîya polêsan tê firotin rûmeta xwe, jinanîya xwe, zarokîya xwe winda dike. Xizantî, ji warên bav û kalan derxistin, bavê ku kût û bêkêr maye, dayika ku ji firotina keçika xwe haydar e lê belê neçar e... û hwd. Her tişt keçika panzdeh salî dike sembola windabûna mirovbûnê jî. Keçika ku ji aliyê leşkerekî ve tê xirandin ne tenê keçxamatîya xwe, bixwebawerîya xwe, rûmeta xwe winda dike û agir berdide canê xwe û berdêla windakirinê xwe dide. Narîn, Mîrzayê xwe û hêvîyên xwe winda dike, bi salan şûnde vê carê Xangul xanim hevserê xwe û bavê zarokên xwe, ê ku pêşengê gelê xwe ye, winda dike. Dayikên Roja Şemîyê, Zeyneba, Meryema, Xeyce zarokên xwe, hêvîyên xwe winda dikin. Handan Çaylayan dupat lê dike û dibêje:

...Xwepêşandanên ku jinên Kurd di wan de cî digirtin û xuyanê dibûn, aliyê xuya a çalakîya wan û rûyê zanava 'Jina Kurd' nîşan dida. Li paş vê dîmena qada giştî jî, mexdûrîyetên kesîdeyî û komî hebûn ku ji ber şer, koç, xizanî, pêpeskirina mafên mirovan di demajoyên nexuya de li wan qewimîbû û digel van yekan jî, pevgirêdanên têkilîyan hebûn ku mexdûrîyet digel hev hatibûn parvekirin û ev yek bûbû sedem ku zanav û nasnaveke hevpar ava bibe. (Çağlayan, 2014: 28).

Çendî ku ji wan jinan her yek tiştêk winda kiribe jî, ji windayên xwe zêdetîr winda û berze ne; ji ber ku şer hê jî didome, şert û mêrcên şer li dar in û ew piştî windayên xwe tekoşîna liserpîyanmayînê didin. Tekoşîna dayikbûna xwe, jimbûna xwe û serxwebûna xwe didin. Ji ber teza Zeraq e ku; jin ku piştî şer, koçkirina ji gundan, valakirina gundan û digel hemû windakirinan, wekî ne têkçûyî; lê berevajîya vê,

pêşveçûyî hatine şayeskirin û temsîlkirin û Zeraq bi awayekî bi zanetî û hişyarî ‘mexdûrîyetên kesîdeyî û komî ku ji ber şer, koç, xizanî, pêpeskirina mafên mirovan di demajoyên nexuya de li wan qewimîbû’ wekî xîmên vegotina xwe bikar anîye.

3.1.12. Tişte û Kirde

Palder û argumanên vê xebatê ew in ku divê desthilatdarîya nêrane a ku xwe dispêre bavkanîyê, bi hemû kodên xwe ve were aşkerakirin û divê pê re jî kodên zimanî ên mêrane bîn rûxandin. Mekanîzmayên desthilatdarîyê ên bavkanîyê, sembolên zimanî her tim li ser dijberan ava kiriye û di wan dijberîyan de jin her tim wek tişte hatiye şayeskirin û bimanekirin. Wekî me berê jî gotibû xalên ku divê bi hûrayî li ser bê sekinandin û bê aşkerakirin ew in ku; divê tiştê ku ji şûna xwe were leqandî kirdebûna mêran a ji alîyê mêran ve hatiye afirandî ye. Pê re rûxandina tiştêbûna jinê divê bi xwe re rûxandina kirdebûna mêrî jî bîne û sembolên bavkanîyê ên bi sedan salan de hatine afirandin jî werin rûxandin û hilweşandin. Temsîliyeta mêran, di her qadan de li ser kodên kirdebûnîya mêran ava bûye û ev rewş jî wek xwezayî û normal hatiye bicîkirin. Kirdeyên ku hatine afirandin xwedî temsîliyetê ne lê belê tiştêyên ku hatine afirandin di bin sîya wan kirdeyan de hatine bicîkirin. Wekî ku me berê jî gotibû, em di vê xebatê de ji xwe re dixin armanc ku bi awirekî berevajîya ziman û kodên mêrane temsîliyeta jinan mimkun e. Ji ber vê yekê ye ku em li ser berhemên Zeraq bi awirekî femînîstî hûrsekînin û pê re jî me li xwe kir armanc ku bi awirekî berevajî bidin nîşandan ku temsîliyeta jinê ya di wêjeyê de, vegotin û kodên nêrane a heyî, çawan tê têkşikandin û feraseta ku ji hezaran salan de hatiye, bi çî awayî tê pûçkirin û rûxandin. Wekî ku me destpêkê de ji xwe pirsîbû û me gotibû ku gelo ‘Avakirina zimanekî nû mimkun e?’ Pirsê me bersiva xwe di vê xebatê de dît. Zimanekî ku ji derveyî kodên ku ji hezaran salan bi virde ava bûne bimîne û wan kodan pûç bike û pê re jî jineke ku kirde ye ava bike, mimkun e. Zimanekî ku, bi helwesteke Derridayî, dijberan birûxîne, tiştên ku ji alîyê mirovan ve hatiye navoyîkirin, biderizîne mimkun e. Zeraq, di berhemên xwe de aşkera kiriye ku wekî hemû qadan di warê wêjeyê de jî mimkun e ku kodên bi hezaran salan de hatine navoyîkirin û hizîrîna bi wan kodan bê rûxandin û tiştêbûna jinê a ku hatiye afirandin bê kafkunkirin. Butlêr balê dibe ser û dibêje ku: “Zayenda ‘mê’ di heman

deme de ‘kirdeyeke tune ye’. Di nav ekonomiya hêmakirinê de ku çembera bergirtî a hêmader û a hêmakirî ji alî heyîna nêr ve tê avakirin, têkilîya di navbera nêr û mê de nikare were temsîlkin. (Butler, 2014: 57). Tam di vê qadê de awirekî deconstructîf hewce ye ku Zeraq, hêmader û hêmakirî ên structuralîzmê li deconstructionê xistiye. Kirdeya nêr sazkirî ye, bi têkilîya ‘zayenda civakî’ a jiyana ku mêr tê de serdest e hatiye avakirin. A ‘mê’, ne hêmaya kirdeye ye, hêmakirina kêmasiyek e. Loma jî, her wekî Zeraq jî kiriye, divê teorîya ‘zimanê sembolîk’ û ‘structuralîzm’ jî were rexnekirin. Hêja û kêrhatî ye ku em bejin, femînîstan rêyek vekirî û Derrida, Lacan, Hêlên Cixous, Luce Irigaray û Julia Kristeva jî tevkariyên girîng tê de kirin. Zimanekî jinane û semîyotîk mimkun e ku Zeraq ew rastî ber bi çav kiriye.

Seyran bûk e, Seyran dayik e, Seyran jineke bî ye ku ev hêma di destpêkê de Seyranê wekî neçar nîşan didin. Gava ku di bin pihînen polêsan de diquncife, xwîner hew zane ku wekî tiştêyê dê her tim quncifi û neçar bimîne; lê belê Seyran radibe ser pêyan. Rabûna wê ya li ser pêyan ne tenê li hember zordariya polêsan e, di heman demê de li hember rabûna hêmayên bi sedan salan ên ji bo jinan hatiye afirandin e. Seyran gava dibe vebêja çîroka xwe pê re jî şanîdanên heyî dirûxîne û serborîya xwe a kirdebûnê, xwebûnê tîne zimên. Yasemîn bi govanîya xwe ji kodên hînbûyî û şanîdanên ku jinan wekî tişte nîşan dide xelas dibe û dibe govana kirdebûna Dayikên Roja Şemîyê. Wekî ku me demên berê jî dupat lê kiribû, Zeraq bi zanetî û hişyarî di navenda vegotina xwe de jin bi cî kirine û ew jinên ku her awayî ji alîyê civakê ve, ji alî dewletê ve, ji alî mêran ve wekî tişte tînen hesibandin radike ser pêyan û kirdebûna wan aşkera dike. Keçika panzdeh salî a ku tê firotin, keçika ku Ehmoyê kulek tecawizîwê dike, keçika ku kevirlêtêbarandin û keçika ku ji alîyê leşkerekî ve tê xirandin; hemû jî ji alîyê hêmaderên mêr wisa tînen hesibandin û tînen bikaranîn; lê belê hemû jî dibin temsîlkarên rûxandina şanîdana bi sedan salan. Bi jinaniya xwe û helwestgirêdanên xwe û pê re jî bi hevokên xwe ên semîyotîk ve wê mêraniya genîbûyî dirûxînin. Wekî mînak, bi hevoka ‘Jixwekirina hemû adet û kirasên derveyî mirovî ye...’ mîrovayî ya mêrane a awakirî tê rûxandin. Bi hevoka ‘...evîna xwe ji bendîgehên sinc û exlaqê xelas kiribû... Kan û kakilê jimbûna xwe bi dest xistibû.’ Kodên bavkanîyê û zayenda civakî tê rûxandin û evîn ji sinorên bavkanîyê tê cihêkirin. Heman rewş ji bo Narînê ji derbasdar e ku Narîn bi dilê xwe tevdigere û bi bawerîya ji xwe û jinaniya xwe, bi Mîrza re hev şadibin û piştî salan xwîner dibîne

ku Narîn keça xwe a bi navê Arîn jî bi wan kodan mezin kiriye. Wek dayik û keç nîn in, wek hevrê û hogir in ji bo hev. Guhertîna herî girîng û berbiçav guhertina dayikan e ku di axavtineke Xeyce, Meryema û Dayika Sêvê de bi vî awayî dide der ku her sê dayik jî mîna ku xwedî îdeolojîyê bin, diaxivin. “Di roja îroyîn de keçîn û lawîn bi hev re rabûne û bi tevî xurtîya xwe jî, bi tewî kemasîya xwe jî... Û ne dar maye ne şikestin...” (Zeraq, 2016: 71). Digel dayikan, jinên şervan jî dibin vebêjên vê bawerîyê û îdeolojîyê û dibêjin ku:

Loma jî bawerîya ji makehozê... tiştê sereke û helikî ye ji bo me... Hemû tiştên ku ji bo jinan bûye sedema zilmê... Bindestxistinê... Kêmxistinê... Rûmetşikandinê... Ji navê hilînin. Û jinê jî... Wekî miroveke hêja û xwedî qedr û rûmet... Bigihînin hafa mirovbûnê... (Zeraq, 2016: 86-87).

Jinên ku bi awayekî rasthatî û ji bo temamkirina çîrok û serborîyên mêran nehatine afirandin, di vegotîna Zeraq de bûne temsîlkarên kirdebûnê û bi kirdebûna xwe ve jî serdestîya mêrane a pişta xwe spartîye bavkanîyê, rûxandîne. Kod û zimanê nêrane ên ku hatine hilweşandin dewsa xwe gav bi gav daye zimanekî jinane û semîyotîk.

3.2. Vebêjî Di Berhemên DilawerZeraq De

Dîrok, felsefe, psîkolojî, sosyolojî, hunerên plastîk, mîtolojî û hemû epîstemolojîyên ji alîyê mêran ve hatine hilberandin, rêgezên jiyane û hilberîne jî diyar kirine. Di wê rêgezê de; jin, kole, mirtib, reşik, gundî, li hin deveran kesên ji oleke dî ne û hwd. Yanê ên dîkekîrî, hemû jî ji alîyê desthilatdarên xwe ve hatine temsîlkirin. Bi ser de bi zimanê wan û kodên wan ve hatine şayeskirin. Di wêje, sînema û şanoya desthilatdaran de herî zêde wek pîsûpelas, xizmetkar, qirêj, cahil, bêhnjêhatî û hwd. hatiye şayeskirin ku ev mane ne yê wan in, ew maneyên genîbûyî ên ku ji alîyê desthilatdaran ve bi zanetî û bi awayekî polîtîk hatine afirandin bi sedan salan derbasdar bûne û ji alîyê her kesî ve jî hatine navoyîkirin. Çendî ku dîrok û hemû epîstemolojîyên ku hatine hilberandin bi îdîaya gerdûnî û objektîfîbûnê tevbigerin jî, îro aşkera bûye ku ne tenê di qada dîrokê de, di hemû qadan de ziman û kodên desthilatdaran a dîkekîrî hatiye bikaranîn û ev dîkekîrî jî wek normal û asayî hatiye nîşandan. Geşedanên femînîst, rexneya femînîst, xebatên der barê rexneya femînîst a wêjeyî de, hilweşandina kodên zanistî ên nêrane, vedîtinên antropolojîk û

arkeolojîk ên nû, derketina jinan a bo qada giştî, destkeftîyên polîtîk û temsîlî ên bindestkirîyan û îfşakirina kodên modernîzmê û bavkanîyê ên hevpar, rêyeke nû li ber mirovahîyê vekirîye. Ev rê ew rê ye ku, bindestkirî li ser navê xwe diaxivin û temsîlîyeta xwe bi kod û zimanê xwe pêk tînin. Ji wan bindestkirîyan yek jê jî jin e ku, piştî tekoşînên bi dehan salan di hin qadan de mafê temsîlîyetê bidest xistiye û hewl daye ku kodên nêrane ên hatine hilberîndin, birûxîne. Qada wêjeyê jî yek ji wan qadan e ku jinan piştî tekoşînên bi dehan salan karibûne ku xwe di wî warî de heyî bikin. Çendî ku jinan di qada wêjeyê de temsîlîyeta xwe bi dest xistibe û xwe heyî kiribin jî, divê neyê jibîrkirin ku bi sedan salan vegotin ji alîyê mêran ve û bi vebêjîya mêran ve pêk hatîye. Vebêjên dîrokê, wêjeyê, helbestê, biwêjan, gotinên pêşîyan, çîrokên, mîtolojîyan û hwd., her tim mêr bûye û di wê vebêjîyê de jî jin bi kodên zimanê nêrane hatine temsîlkirin. Madem ku ev helwest, helwesteke polîtîk e, divê li hember vê reftarê temsîlîyeta jinê a wekî kirdebûnê jî bi awayekî polîtîk û birewer pêk bê. ‘Hişûbîra civakî polîtîk e.’ Ji ber vê yekê ye ku divê hişûbîra civakî jî bi kodên nû bê nirxandin û vebêjîya mêrane a dîrokî bê rûxandin. Vebêjên dîrokê ku jin bin dê pê re temsîlîyeta zimanekî jinane jî pêk bê û pê re jî kodên nêrane ên desthilatdar bînin rûxandin. Handan Çağlayan di xebata xwe a bi navê *Analar, Yoldaşlar, Tanrıçalar* de, metoda dîroka devkî /gotinkî bi kar anîye û ji bo bikaranîna vê rêbazê jî wiha gotîye: “Bi taybetî, ji bo lêkolînên kifşker û arkeolojîk ku li ser jin û kêmaran tên kirin ku ew di qada giştî de ne xuyanê ne, kelk û kêrhatîbûna dîroka devkî, bêguman û aşkera ye.” (Çağlayan, 2014: 30).

Wekî ku me berê jî anîbû ziman, jin di navenda vegotina Dilawer Zeraq de bi cî bûne û wek asayî jî vebêjên metnan bi gelemperî jin in. Jinên ku dayik yan jî hevserên windayan in, jinên ku ji mêran şidet dîtine an ji alîyê wan ve hatine kêmxistin, jinên ku hê di keçanîya xwe de bûne mexdûrên zorgayîne an gerdîşa genîbûyî, jinên ku hatine firotin û jinên şervan. Çi bi rolên dayiktî an hevserîyê çî jî bi rolên mexdûrîyê, her yek li ser navê xwe û jinên wek xwe diaxivin û wekî ku me di beşa Kirde û Tişte de jî dupat lê kiribû, her yek wekî temsîlkarên kirdebûnê ne. Em dikarin bêjin ku Seyran, gava li ser navê jinên ku windakirîyên windabûnan in diaxive, dibe temsîlkara wan û xwîner çîroka wan jinan ji wê hîn dibe û hest pê dike ku ew jin çî jîyane. Seyran, Dayika Sêvê, Xeyce, Meryama, Narîn, Zeyneba her yek vebêjên çîrokên xwe ne û bi ‘metoda dîroka devkî’ diaxivin. Ji ber vê yekê ye ku her

yek bi kodên zimanekî jinane heyî dibin. Heman rewş ji bo keçên û jinên mexdûr jî derbasdar e. Çendî ku sedemên mexdûrîyeta hemûyan civaka nêrane a desthilatdar be û bi tecawizê, tacîzê, lêxistin û kêmxistinê, şideta zimanî û fîzîkî û birûmetxistinê xwe heyî kiribe jî, di jinanîya wan an jî hestên wan ên jinanî de têkçûyînek pêk neanîye. Digel vebêjîya jinan, a ku têk diçe û aşkera dibe desthilatdarîya civakî a mêrane ye, bavkanî ye, zayenda civakî ye, kodên mêrane ên bi sedan salan e. Jina ku bi sedan salan di her qadan de ji temsîlîyetê û ji heyîbûnê bêpar hatiye hiştin û bi kod û maneyên nêrane ve hatiye temsîlkirin ancax bi bidestxistina mafê temsîlîyeta xwebûn û kesîdebûnê dikare kodên serdest ên nêrane hilweşîne. Di warê temsîlîyetê de “vebêjî” xaleke girîng e ku, çî aşkera çî kiraskirî jin di bin vebêjîya mêrane de hatiye fetisandin û pê re jî bi rolên ku mêran li wan bar kirine, hatine temsîlkirin. Bîrbirîya ku dîtîn û azmûneyên mêran layiqê qeydîkirinê dîtîye û jin bi her awayî derve û wekî pîs û pelas dîtîye, di berhemên Zeraq de hatiye berevajîkirin û jin di warê vebêjîya dîrokî de peywir hildane li ser mile xwe. Bi awayekî din em dikarin bêjîn ku bi peywirkirina vebêjîya dîrokî a jinan; jin qalib û sinorên ku ji bo bêparmayîna wan hatiye avakirin, diderizînin, dirixûnin û dibin xwedîyên û temsîlkarên çîroka xwe.

3.3. Zanava Kolektîf Di Berhemên Dilawer Zeraq De

Serpêhatîya mêrane a ku li ser kodên duparkirina mirovahîyê û parastina komekê ava bûye, di sedan salan de bi xwe re pergalên dîkekîrî û bişaftinê jî ava kirine û ev pergal jî bi sîstemên hizirînê ên mêrane zexm kirine. Wekî ku me gelek caran anî ziman, ava û sîstemên hizirînê ên hatine ketine behsê; zanist, epîstemolojî, dîrok, psîkolojî, ekonomî- polîtîk, huner û hwd., de her tim bi kodên parastina komekê tevgerîyane. Geşedanên ku di warê rûxandina sîstemên hizirînê ên mêrane de pêk hatine û pêşîya mirovahîyê ronî kirine, piştî tekoşînên bi dehan salan pêkan bûne. Pêşketinên di warê hizirîn û pratîkê de, serpêhatîya mêrane, a ku li ser kodên duparkirina mirovahîyê û parastina komekê ava bûye, daye ber pirsan û rexneyan. Çî bi xebatên takekesî û teorîk çî jî bi xebat û çalakîyên kolektîf, gav bi gav, hemû dîkekîrî û lidervemayî aşkera bûne û ketine qeyda dîrokê. Wekî ku me di beşa yekem de jî diyarkiribû, geşedanên di warê femînîzmê de jî yek ji wan pêşketinan e ku digel

teorî û tevgerên femînîst, xisarên dijwar gihandine zanistaçêkirî û pê re jî jina ku ji zanavê bêpar maye, kiriye xwedî zanavekê. Em dikarin bêjin ku di van pêşketinan de pareke taybet jî ji aliyê tevgerên kolektîf ve pêk hatiye. Çi wekî sazî, çi jî wekî rêxistinên giştî û taybet, zanaveke kolektîf hatiye afirandin ku bi destê van rêxistinan jî destkeftiyên girîng hatine bidestxistin.

Ji ber ku mijara xebata me wekî kirdeyekê hebûn û temsîliyeta jinan a di berhemên Dilawer Zeraq de ye, em ê di vê beşê de bi taybetî li ser çalakîyên Dayîkên Roja Şemîyê hûr bisekinin. Derketina ji qada taybet bo qada giştî a jina Kurd, ji taybetîya wan a ku bermayiyên windabûnekî ne tê û jiber ku windakiriyên windabûnan in bi awayekî kolektîf tevdigerin. Bi tespîta Handan Çağlayan livbazîyên kolektîf bûne sedem ku; hem gihîştinek bo çavkanîyan pêk hatîye hem jî vê livbaziya kolektîf kiriye ku asta hişmendîya hundirîn û bixwebawerîyê bêtir û zêdetir bibe. Çağlayan pê ve diçe û ji bo hebûnîya van livbazîyan dibêje ku: "... di beşdarên de, bêdaletiyek heye û ev bêdaletî ancax bi rêya çalakîya kolektîf dikare were duristkirin û sererastkirin. Ji aliyekî din ve, çalakîya kolektîf zanava kolektîf divê." (h.b. 166). Gava ku, leşker diavêjin ser mala Seyranê û cara yekem Sevdîn dibin, ji xeynî libendêmayîna veqera Sevdîn tu tişt ji destê Seyran û Dayika Sêvê nayê. Jina ku li gorî gerdîşê wek adetî di mal de hatiye bicîkirin tenê dikare li bendê bimîne û qada ku li wir hatiye bicîkirin, neterikîne. Lê belê piştî çendî carên din ku Sevdîn hildidin û dibin, gavbigav, hêrsek û hişmendîyeke sekinîna lihember zilmê di dil û hişê wan jinan de dirûsikînin. Piştî ku Sevdîn dibe wekî hîva bin ewran, wisa winda dibe û diçe, Seyran û Dayika Sêvê ji qada giştî derdikevin qada taybet. Bi rojan didin pey şopa Sevdîn. Tu qereqol û sazîyên fermî namînin ku serî lê nadin, lê belê tu agahî bi dest naxin. Di dawîyê de serî li aziya mafên mirovan dixin da ku der barê windayê xwe de agahîyekê bi dest bixin, mixabin her car destên wan di binçenga wan de vedigerin malê. Heman pêvajoyê di binçavkirin û birinên Faris de jî dijîn û di dawîya dawîyê de Faris jî dibe windayên wan jinan. Û vê carê bi rojan û mehan ji bo dîtina Faris tên û diçin. Her du jin, êdî ji hundirê malê zêdetir li derve tên şayeskirin ku *Sêyîneya Winda* bi şayeskirineke çalakîya Dayîkên Roja Şemîyê, bûyerê dide destpêkirin û xwîner cara yekem Seyranê û Dayika Sêvê di qadeke giştî de dinase. Piştî Yasemîn tev li wan dibe, piştî xwîner gavbigav şikestinên wan jinan, çîroka windayên wan û ew jinên ku bermayiyên windabûnekîne, dinase.

Zanava kolektif, a ku jinên ku bermayîyên windabûnekîne digihîjine hev, roj bi roj dibe sedema bîrewerbûna wan jinan ku tu yek jî êdî ne jinên berê ên di mal de ne. Ev guhertina jinan, rabûna li ser pêyan a jinan, takekesî û kirdebûna jinan, helwestgirêdana jinan, di hemû qonaxên *Sêyîneya Winda* de wek teza sêyîneyê tê parastin. Zeraq, vê helwestê di *Mirina Bê Sî* debi destê Narîn, Xangul xanim û Zêrîn û di *Nexşîn Li Giyan* de jî bi dayikên şervanan û bi dayika Bedo (Zeyneba) ê ku tê qetilkirin pêk tîne. Jinên ku di romana dawî a sêyîneyê a bi navê Nexşên Li Giyan de digihîjin hev û bi zanaveke kolektîf heyî dibin, dest didin hev û bi hestên hevpar piştgirî didin hev. Çaçlayan ji bo hevparîya wan dayikan û jinan wiha dibêje: “Ev jin, carinan wekî kesûkar û merivên girtîyan, carinan jî wekî dayikên aşîyê; bi çalakîyên xwe ve rengê polîtîk û civakîbûnê dan rolên xwe ên dayikîyê û digel vê naverokê derketin qada giştî.” (h.b. 167).

Lehengên Zeraq, ên ku ji bo windayên xwe ji qada taybet derketine gada giştî, roj bi roj, bi guhertîneke şoreşî hatine şayeskirin û ji rolên çandî ên li gorî gerdîşê, hatine azadkirin. Bi vê azadkirinê re bûne xwedî kesayet û wekî kirde heyî bûne. Freire, ji bo bişaftin, bînpêkirin û pêpeskirina ên ku hatine dîkekirin, wiha dibêje. “Sernîşîvkirina di warê çandê de, dike ku kesên ku êrîş li wan hatiye kirin heqîqîbûn û xweserîya xwe a çandî winda bikin; kesên ku êrîş li wan hatiye kirin, bi deme re, nirx û hêjayî û norm û armancên êrîşkar û dagirkeran dipejirînin. (Freire, 1998: 130). Em dikarin bêjin ku Zeraq, bi “zanava kolektîf”, a ku bi destê jinan tê avakirin, li hember sernîşîvkirina di warê çandê de, şoreşeke jinane pêk tîne û kodên dagirkeran kafûkûn dike. Digel kafûkûnkirina rolên dagirkerîyê; Zeraq, bi jinên ku di navenda vegotina xwe de bi cî kiriye, tezeke din jî diparêze ku ew tez helwestgirêdaneke çînî ye. Jinên ku me heta niha li ser wan gotinên xwe gotin û me hewl da ku rasteqînîya wan berbiçav bikin, her yek jî pêgirîyên çîna çewisandî ne. Tenê Yasemîn bi pêgirîya xwe a nîjadî ve ji hemûyan cihê ye; lê belê ev yek jî hûrgilîyek ji teza Zeraq e. Zeraq, bi heyî û temsîliyeta Yasemînê, kodên oryantâlîzmê dide ber rexneyan û awirtêdana ji bo dîkekîrîyan a ku bi kodên gunehêxwepêanîyê saz bûye, dirûxîne. Yasemîn yek ji wan û wekî wan jinan e, ne kême ne jî zêde.

ENCAM

Sazkirina jinan a di nêzîktêdayîna civakî û ramanî de, di nav sedan salan de, li ser duparkirina mirovahîyê û parastina komekê ava bûye ku di vê duparkirinê de alîyê desthilatdar her tim mêr bûne û digel wê, jin jî her tim alîyê bindestkirî bûne. Temsîliyet û manelêkirina jinan, a ku bi kodên nêrane ên serdest hatiye sazkin, di hemû qadan de bi sedan salan, wek agahî û zanistiyê normal û xwezayî hatiye bicîkirin. Çendî ku civak û hemû epîstemolojîyên ku ji alîyê mêran ve hatine afirandin, li ser vê duparkirinê û parastina pergala nêrane hatibin avakirin jî. Sîstemên hizirînê ên hatine behsê; têkilîyên ekonomîk, cîbicîbûnên dîrokî, zanist û agahîyê, qadên giştî û taybet, zewac, zarokanîn, temsîliyet, qada polîtîk, têkilîyên ked û hilberînê argumanên olî, zayendî, kirdetî an jî tiştetîya berhema hunerî; û pê re jî hê gelek tiştên dîtir diyar kirine û bi yasa û zagonên mêrane jî hebûna wan sîsteman mayînde kirine. Dîtane, bîrûbawerî, zanist, epîstemolojî, wêje, huner, tib û hemû geşedanên ku li ser sîstemên hizirînê, ên ku bi kodên desthilatdarîya mêrane ava bûne, wekî sazkirina hemû qadan ziman jî li gorî hişmendîya xwe saz kiriye. Bi wan dîtane, bîrûbawerî û epîstemolojîyan; ne tenê jin, hemû dîkekirîyên din jî bi manelêkirinên wekî kêr, tişte, pîs û pelas, qirêj, hov, nezan, neşareza û hwd. hatine pênasêkirin. A ecêb ew e ku ev zanist û zimanê dîkekirî ji alîyê bindestan û dîkekirîyan ve jî hatiye navoyîkirin. Ji wan tiştetan yek jî jin e ku her çî qas nîvê mirovahîyê ye û ji destpêka mirovahî bi vir de ye heye jî, bi sedan salan ji hemû mafên xwe ên zayendî û mirovahîyê bêpar maye. Jin, a ku bi hestan ve hatiye hevsankirin û rola wê ya herî girîng wek dayikî hatiye bisinorkirin, hay jê nebûye ku bi çî awayî hatiye mêtin û bindestxistin. Digel vê, mêr jî bi aqil ve hatiye hevsankirin û bi mekanîzmayên kontrolkirinê, desthilatdarîya xwe a li ser jinan peyitandîye. Yekmêrî, gotara olî, malbat, zewac, bîrûbawerîyên civakî, rolên zayenda civakî hin ji van mekanîzmayên kontrolkirinê ne ku nehiştine ku jin bi tu awayî bilivin û heyî bibin.

Dîroka mirovahîyê ku bi dabeşkirina; heyama wek hovîti yan jî wek nêçirvanî û berhevkarî yan jî heyama civakên talanker tê penasekirin; piştî heyama kiştûkalîya pêşketî ku bi bidestxistina qadên kiştûkalê yê ku piştî şewitandina daristanan hatine bidestxistin û her wiha bi baxçevanî, erdajotin, avîkirinê ve pêş ketîye; heyama ku wek şarezayî tê penasekirin ku civakên bajarî derketine holê û bi

şoreşa sanayîyê ve gihîştiye roja îroyîn, heke em van dabeşkirinan bi vî awayî qebûl bikin, em ê bibînin ku di hemû heyaman de jin her tim bi mekanîzmayên kontrolkirinê ên mêrane hatine zeftkirin. Çendî ku modernîzm bi pênaseya ‘mafên mirovan ên pêşketî’ xwe pênase bike jî piştî tevgerên femînîst diyar bûye ku di warê bişaftin û bindesxistina jinan û gelan de xwedî zêdehîyan e lê ji heyamên berîya xwe ne kêmmayî ye. Em dikarin bêjin ku bi geşadanên modernîzmê ve bindesxistina jinan, çînan, gelan bi pêkanîneke profesyoneltir pêk hatiye. Jin, a ku bi sedan salan ji hemû mafên xwe ên zayendî û mirovayî bêpar maye, di nav rolên zayenda civakî de wekî tiştayek hatiye pênasekirin û cîbicîkirin. Zanava jinê, wekî hemû qadan di sembolên devkî, di nav normên sincî û di wêjeyê, di ol, huner, sîyaset, felsefe û di psîkolojîyê de bi bi kodên kêmxistî û bînirx heyî bûye. Jina ku di heyamên dîroka zanist û ramanê de yan hêjayî pênasekirinê nehatiye dîtîn yan jî bi pênaseyên dîkeker û kêmxist hatiye pênasekirin, piştî hin xebatên femînîst şoreşên bêhempa pêk anîye.

Gava yekem car Anne Dakley di 1972yan de, di pirtûka xwe a bi navê *Sex, Gender and Society* de têgiha *gender* bi kar anî, têgih danî rastê ku zayend bîyolojîk e lê belê zayenda civakî hatiye diyarkirin. Zayenda civakî a ku digel coxrafya, nirxên çandî, awirê polîtîk û mekanîzmayên îqtîdarê watedar bûye, bi xebat û hizirînên femînîst, ji zayendê û zayendîtîyê hatiye cihêkirin. Pênaseyên desthilatdaran ên ku li ser zayenda civakî ava bûne li hember rexneyên tevgerên femînîst derb dixwe. Diyar dibe ku ‘zayenda civakî’ pênase û roleke polîtîk e; lê belê ‘zayend’ bîyolojîk e. Butler, di vî warî de dupat lê dike û dibêje: “Gava em avakirîbûna zayenda civakî bi temamî ji zayendê serbixwe qebûl bikin û wê bi vî awayî saz bikin, wê çaxê dê zayenda civakî bixwe bibe berhem û avakirineke gerok û veguhêzbar.” (Butler, 2014: 51). Piştî tevger û teorîsyenên femînîst hewl didin ku vê hişmendîyê biguherînin û jina ku ji hemû mafên xwe bêpar maye bigihîjin asta ku heqê wê ye. Gelemşeyên wekî kurtaj, eugenic, kontrola zarokanîne, fuhûş, porno, mafê reyavêtinê, şidet, tecawiz, tecawiza di zewacê de, nebûna berginda (heqdesta) keda di nava malê de, mafê welayeta zarokan, mafê perwerdedîtîne, malbat, zewac, rêbazên cihêbûnê/hevberdanê û hwd., bi dehan salan, bi her awayî hatiye nirxandin û hatiye aşkerakirin ku ev hemû têgih bi wateyên civaka mêrane a desthilatdar mane girtine û mexdûrên ku di wan pênaseyan de hatine fetisandin jî her tim jin bûne. Jina ku ji qada qîştî jî hatiye bêparkirin di mal de hatiye cîbicîkirin û bi peywîrên hundirê malê

hatiye peywirdarkirin. Malbat û dewlet du mekanîzmayên desthilatdarîya mêran e ku bi endamên pêgirêdayî û ji mêrê desthilat pêk tên. Mal jî bi vê hişmendîyê hatiye avakirin. Çi gotara (discourse) dîrokî, çi gotara felsefî, çi gotara olî, çi gotara wêjeyî û çi jî gotarên qadên zanistê ên din; hemûyan, tişteyeke afirandiye; ew tişte tenê bi kêrî zarokanîne tê û heyîna wê ji bo heyîna mêran e. Ev gelemşeyên ku me di xebata xwe de çendîn caran dupat lê kirin, her yek ji berhemên bavkanîyê ne ku bi destpêkirina bavkanîyê û windakirina mafê dayiktîyê û têkçûyîna dîrokî a zayenda jinê pêk hatiye. Bi hûrsekinîna li ser van gelemşeyan, derî li femînîzmê vebûye û çi bi tevgerên takekesî çi jî bi tevgerên kolektîf, di warê zanistê de agahî û pêşketinên nû bi dest ketiye.

Femînîzm, pêşî di sedsala XVIII. de li Fransayê, ji alî feylesof û hin nivîskarên jin ve li rastê hatiye danîn û hatiye parastin. Di salên dû vê salê de jî ji alî gelek der û doran ve piştgirî lê hatiye kirin. Ev bizav derpêş dike ku divê jin ji alî mafên civakî û sîyasî ve bi mêran re wekhev be û hewl dide ku vê yekê pêk bîne. Tê îdfakirin ku wek peyv, yekem car civaknas û bergirê sosyalîzmê Charles Fourier “Femînîzm”ê bi kar tîne û wek afirînerê peyve tê qebûl kirin. (Notz, 2011: 35)

Di sala 1793yan de, gava KONVET bangewazîya Mafên Mirovan -les droits de l’homme- dike, di heman demê de Olympe de Gouges û çend jinên din ku hevrêyên wê ne jî, têdigihîjin ku ev mafên ku hatine dîyarkirin tenê ji bo mêran in. Olympe de Gouges, Rose Lacombe û çend kesên dî li hember ‘les droits de l’homme’ daxuyanameyeke bi navê “Mafên Jinan” a ji 17 xalan pêkhatî amade dikin û vê daxuyanameyê radeştî Komûna Parîsê dikin. Di daxuyanameyê de hevokeke dîrokî hebûye ku cîbicîkirina jinan a ku heta wê rojê hatiye paşguhkirin, aşkera kiriye: “Heke mafê jinê hebe ku were daleqandin, divê mafê wê hebe ku li jora diwanê jî cî bide xwe.” Piştî vê qewimînê Olympe de Gouges, Rose Lacombe û çend hevrêyên wan bi gîyotinê tên daleqandin. Teorîsyenên femînîzmê, bi vê sekinandina xwe a li hember desthilatdarîya mêrane, dîroka femînîzmê didin destpêkirin.

Tevgerên femînîstî, ji hêla dîrokî ve wek sê heyaman tên dabêşkirin. Beşa yekem a ku wekî pêla yekem hatiye binavkirin, berîya Şerê Cîhanê a Yekem dest pê dike û bi giştî ji bo mafê jinan a derketina qadên giştî tekoşiyane. Digel vê di warê perwerdehîyê de wekhevîya fersandan, mafê hîlbijartin û hatina hîlbijartinê, parastina

mafên xwedanîyê, xwestekên wan ên sereke ne ku derketine pêş. Beşa duyem wek pêla duyem tê pênasekirin û piştî sala 1968an dest pê kiriye. Zêdetir li ser mafên zayendî serê xwe êşandine û pirsgirêkên jinan wek gerdûnî qebl kirine. Pêla duyem di nav xwe de, wekî du şaxên hîmî pêşve çûye ku yek ji wan Femînîzma Çandî ye yek jî Femînîzma Radîkal e. Femînîzma Çandî cudatîyan wek zengînî dibîne dupat li wekhevîyê dike. Femînîzma Radîkal, li ser cudatîya mêr û jinan, pê re jî li ser cudatîyên wek nijad, etnîsîte, çîn û çandê sekinîye. Digel van, pêla duyem li ser zagonên mêrane, ên ku cezayên zorgayîne bi hêmanê azirandinê ve siviktir dikin, keda ku di malê de tê dayîn û mafê kurtajê, hûr disekinin. Gotina Sîmone De Beauvoir, “Mirov wek jin nayê dinyayê, mirov piştî dibe jin.” û dirûşma “Tiştê kesîdeyî polîtîk e.” ji xwe re wek him dîyar kirine û herî zêde li ser ‘zayend’ û ‘zayenda civakî’ sekinîne û wek sedema bizanavkirina jinan, zayenda civakî û bavkanî ber bi çav kirine. Têgiha “polîtîkaya zayendî” a Kate Millett ji aliyê femînîstên pêla duyem ve hatiye bikaranîn û femînîstên vê hişmendîyê aşkera kirine ku di warê çewisandin û bêzanavkirina jinan de her tişt di çarçoveyêke polîtîk de pêk tê, ji bêrê ve yekê jî dibêjin ‘tiştê kesîdeyî polîtîk e’.

Beşa sêyem a ku wekî “*pêla sêyem*” hatiye pênasekirin, di dawîya salên 1980yî û di salên 1990î de dest pê kiriye û heta roja îroyîn berdewam kiriye. Rexneyên tûj li pêla duyem kirine û îdîa kirine ku pêla duyem çavên xwe li cihêtiya nijadî û çînî girtine. Ji ber vê yekê jî wan girîngî dane cihêkarîya nijadî, çînî û tercihên zayendî. Li gorî pêla sêyem zordestîya ku li ser jinê û dîkekîrîyên din pêk hatiye ne yekcureyî ye; loma jî ne li ser hevdirûvîyan lê belê li ser cîyawazîyan û zanavan hûr sekinîne; û hişmendîya oryantalist a Rojavayî dane ber rexneyên tûj.

Tevgerên femînîst, der barê pênaseya bindestxistina jinê de wekî sê bizavên stratejîk ên esasî tene dabeşkirin ku ew bizav; Femînîzma Lîberal, Sosyalîst û Radîkal e. Ji xeynî van bizavên esasî, hin cureyên femînîzmê ên di jî ev in: Femînîzma Marksîst, Femînîzma Çandî, Femînîzma Çandî a Nûjen, Femînîstên Fransî ên Nû, Femînîzma Daringparêz, Femînîzma Lezbîyenî, Femînîzma Heyîparêzî û Ekofemînîzm.

Piştî ku bi têkoşînên tevgerên femînîst di warê mafên jinan de bi deskeftîyên girîng bi dest dixin, geşedanên pîralî pêk tên. Ji wan qadan yek jî warê teorîyê ye ku bi

pêşketina rexneye femînîst, epîstemolojî û zanistên avakirî tîne rûxandin û dîrok û hemû qadên zanistê bi perspektîfeke nû tîne xwendin û nîrxandin. Rexneya femînîstî di nîrxandinên xwe de ‘zayenda civakî’ wek pîvana esasî bi kar tîne û zayenda civakî wekî kategoriyeke nîrxandinê bandora xwe li ser hemû qadan dihêle. Rexneya femînîst a wêjeyî jî di ronahîya van pêşketinan de pêş ve diçe û hin tekstên ku di asta kanonê de ne, wan ji şûna wan a li jor û qayîmkirî dadixîne û bi perspektîfên wekî zayenda civakî, zimanê nêrane û dîkekîrîna jinan bi şeweyekî nû dinîrxîne. Digel vê xwendin û perspektîfa nû li ser zimanekî jinane û jinên nivîskar ên di dîrokê de wînda bûne, disekinin. Rexneya femînîst, berpêyî îdeolojî û pêkanînen civakîye û nêzîktêdayînek e navenda wê zayend e. Her wekî Maggie Humm jî dîyar kiriye;

Rexneya wêjeyî a femînîst... ew rêbaz e ku; ji nû ve, li ser tekstên ku bi awirekî nêrane hatine nivîsîn, lêkolîn tîne kirin, texmînen wan ên li ser bavkanîyê heyî tîne çespendin û di van tekstan de tîne nişandan ka jin li gorî normên civakî, çandî û îdeolojîk çawan û bi çî rengî hatine temsîlkirin û cîbicîkîrin.” (Humm, 2002: 26).

Her wekî me gotibû Femînîzma Postkolonyal ku di nava teorîyên dekonstruktîf de cî girtîye, di vê wateyê de, ji bo pardeya “ezmûnerîya hevpar” a ku femînîstên Rojavayî ji mêj ve wê bi lêv dikin, ravekirinên rûxîner kirine. Femînîzma Postkolonyal a ku Deconstructionê wek palder qebûl dike, li hember dijberîyên duberî û oryantalîzma Rojavayî radibe û di warê wêjeyê de jî awirekî dekonstruktîf pêk tîne. Femînîstên wekî Hélène Cixous, Luce Irigaray, Julia Kristeva, Monique Wittig, di vî warî de xebatên teorîk kirine û teorîyên xwe spartine gotarên (discoursên) qadên wekî psîkanalîzm, zimanzanî û biyolojiyê û teorîyên Lacan û Derrida. Piştî wan xebatan, di warê wêjeyê de rexneya dekonstruktîf pêşve diçe û berhemên wêjeyî bi awirekî Derridayî jî tîne nîrxandin.

Berhemên Dilawer Zeraq ên ku me di vê xebatê de wekî çavkanî û palder hîlbijart û em li ser hûr sekinin, xwedî gotareke (discourseke) raperîner in ku berîya her tiştî liberabûneke li kodên zimanê mêrane û pê re jî liberabûneke li kodên zayenda civakî, a ku xwe dispêra bavkanîyê, di xwe de dihewînin. Bi binsernivîsên beşa sêyem me hewl da ku em karibin berhemên Zeraq hem bi ronahîya geşedanên femînîstî binîrxînin hem jî karibin kodên Zeraq ên zimanî, ên ku gerdîşê, zayenda civakî, bavkanî, desthilatdarîya mêrane û pê re jî hemû îqtîdaran li deconstructionê xistiye, aşkera bikin. Kêrhatî ye ku em car din dupat lê bikin di berhemên Zeraq de,

jin her tim di navenda vegotinê de bi cî bûne û bi ser de jî; ev jinên ku di navenda vegotinê de hatine bicîkirin, bi awayekî rasthatî ji bo mêrên leheng nehatine afirandin. Ji aliyê din ve jî, wan jinan her yek bi kirdebûna xwe ve hatine temsîlkirin ku me li xwe kiribû armanc ku em bi awirtêdaneke rexneyî a femînîst bo berhemên Dilawer Zeraq pêk bînin. Em dikarin bêjin ku Zeraq honaksazîya tekstên xwe li ser kirdebûn û kesîdetîya jinan ava kiriye û bi helwesteke Derridayî kodên di sedan salan de avabûne û jin wekî tişte bi cî kirine daye ber rexneyên tûj û pişrte jî rûxandîye. Digel van jî, Zeraq zimanekî jinane afirandiye ku em dikarin bêjin ku kodên sembolîk ên binyatger jî dirûxîne û hemû lehengên Zeraq ên jin dibin temsîlkarên rûxandîna şanîdana bi sedan salan û bi jinanîya xwe û bi helwestgirêdanên xwe ve û pê re jî bi hevokên xwe ên semîyotîk ve wê mêranîya genîbûyî dirûxînin. Têgihên wek *'endîşeya vegotinê'* û *'hevpeymanîya xwîner û nivîskar'* jî diyar kirin kuçavkanîya kodên endîşeya hevpeymanîya xwîner û nivîskar ên di berhemên Dilawer Zeraq de rûxandîna rol û kodên zayenda civakî ên hînkirî û hînbûyî ne. Ne tenê rûxandîna rol û kodên zayenda civakî, wek kirde temsîlyeta jinan û digel wê jî kodên mêranîyê hatine rûxandin û mîrekî alternatif jî hatîye afirandin. Dilawer Zeraq ev kodên nêrane û zimanê nêrane bi awayekî *deconstructif* ji hev vediçirîne. Kodên endîşeya vegotina wî a esasî rûxandîna zimanê nêrane û pê re jî avakirina temsîlyeta jinan e ku azadîya jinê û kirdebûna jinê wekî teza berhemên wî derdikeve pêş xwîner.

ÇAVKANÎ

- Acar Savran, G. (2013), *Beden Emek Tarihi*, (Üçüncü basım), İstanbul Kanat
- Antmen, A. (2012), *Sanat Cinsiyet: Sanat Tarihi ve Feminist Eleştiri* (İkinci Basım), İstanbul İletişim Yayınları
- Beauvoire, de S. (2010), *Kadın "İkinci Cins" Evlilik Çağı*, (Sekizinci basım), (Çev, Bertan Onaran), İstanbul Pavel Yayınevi
- Bebel, A. (1996), *Kadın ve Sosyalizm*, (İkinci basım), (Çev, S.N. Kaya), Ankara İnter Yayınları
- Bedel, A. (1996), *Kadın ve Sosyalizm*, (İkinci basım), (Çev, S.N. Kaya), Ankara İnter Yayınları
- Bele, T. (1998), *Erkek Yazınında Kadın*, (Birinci Basım), İstanbul Kaynak Yayınları
- Berktaş, F.(2012), *Politikanın Çağrısı*, (Üçüncü baskı), İstanbul İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları
- Berktaş, F. (2015), *Tarihin Cinsiyeti*, (Beşinci Basım), İstanbul Metis
- Besalel, Y. (2001-2002), *Yahudilik Ansiklopedisi*, (Birinci baskı), İstanbul Gözlem Gazetecilik Basın ve Yayın
- Butler, J. (2014), *Cinsiyet Belası Feminizm ve Kimliğin Altüst Edilmesi*, (Dördüncü Basım), (Çev, Başak Ertür), İstanbul Metis
- Çağlayan, H. (2014), *Analar, Yoldaşlar, Tanrıçalar*, (Beşinci Basım), İstanbul İletişim
- Derrida, J. (2003), *Teoriden Sonra Hayat*, (Birinci Baskı), (Çev. Ebru Kılıç), İstanbul Agora Yayıncılık
- Donovan, J. (2015), *Feminist Teorî*, (Onuncu baskı), (Çev, Aksu Bora- Meltem Ağduk Gevrek- Fevziye Sayılan), İstanbul İletişim
- Eagleton, T. (2014), *Edebiyat Kuramı*, (Dördüncü Basım), (Çev. Tuncay Birkan), İstanbul Ayrıntı Yayınları
- Engels, F. (2008), *Ailenin Özel Mülkiyetin ve Devletin Kökeni*, (Ondördüncü Baskı), (Çev. Kemal Somer), Ankara Sol Yayınları

- Esen, N. (2006), *Seviye Talip'te Kadın Yazarın Sesi "Modern Türk Edebiyatı Üzerine Okumalar"*, (İkinci Baskı) İstanbul İletişim Yayınları
- Freire, P. (1998), *Ezilenlerin Pedagojisi*, (Üçüncü Basım), (Çev. Dilek Hattatoğlu, Erol Özbek), Ayrıntı İstanbul
- Game, Ann. (1998), *Toplumsalın Sökümü: Yapıbozumcu Bir Sosyolojiye Doğru*, (Birinci Basım), (Çev. Mehmet Küçük), Ankara Dost Yayınları
- Gürbilek, N. (2014), *KörAyna, Kayıp Şarkı Edebiyat ve Endişe*, (Dördüncü Basım), İstanbul Metis
- Haaken, J. (2012), *Hayatta Kalma Öyküleri: Sınıf, Irk ve Ev içi Şiddet*, Holmstrom, N. (Editör), *Sosyalist Feminist Proje*, (Birinci basım), (Çev. Özge Kelekçi), İstanbul Kelkedon
- Hennessy, R (2012), *İhtiyaç Temelli Cinsel Politikalar İçin Marksist Feminizmi Yeniden Değerlendirmek*, Holmstrom, N. (Editör), *Sosyalist Feminist Proje*, (Birinci basım), (Çev. Özge Kelekçi), İstanbul Kelkedon
- Humm, M. (2002) *Feminist Edebiyat Eleştirisi*, (Birinci Basım), (Yayına hazırlayan: Gönül Bakay), İstanbul Say Yayınları
- Jineoloji Akademisi, *Jineolojiye Giriş*, (Birinci Baskı), Aram Yayınları Diyarbakır
- Kandiyoti, D. (2015), *Cariyeler, Bacılar, Yurttaşlar*, (Beşinci basım), (Çev, Aksu Bora, Fevziye Sayılan, Şirin Tekeli, Hüseyin Tapınç, Ferhunde Özbay), İstanbul Metis
- Kırtıl, G. A. (2002), *Feminist Edebiyat Eleştirisi Açısından Sevim Burak*, [www.journal.istanbul.edu.tr.viewFile.12.01.2017](http://www.journal.istanbul.edu.tr/viewFile.12.01.2017).
- Leonardo, di M. - Lanchester, R. (2012), *Cinsiyet, Cinsellik, Politik Ekonomi*, Holmstrom, N. (Editör), *Sosyalist Feminist Proje*, (Birinci basım), (Çev. Özge Kelekçi), İstanbul Kelkedon
- MacKinnon, A. (2015), *Feminist Bir Devlet Kuramına Doğru*, (İkinci basım), (Çev, Türkan Yöney- Sabir Yücesoy), İstanbul Metis
- Millet, K. (2011), *Cinsel Politika*, (Üçüncü basım), (Çev, Seçkin Selvi), İstanbul Pavel

- Moran, B. (1994), *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*, (Sekizinci Basım), İstanbul Cem Yayınevi
- Mutlu, E. (2004), *İletişim Sözlüğü*, (İkinci Basım), Ankara Ankara Bilim ve Sanat Yayınları
- Mutluer, N. (2013), *Cinsiyet Halleri*, (Birinci basım), İstanbul Varlık
- Notz, G. (2012), *Feminizm*, (Birinci basım), (Çev, Sinem Derya Çetinkaya), Ankara Pohenix Yayınevi
- Oğuzertem, S. (2014), *Taklit Aşklardan Taklit Romanlara: Genel Kadın Yazarlığı*, Irzık, S. Parla, J. (Editörler), *Kadınlar Dile Düşünce-Edebiyat ve Toplumsal Cinsiyet*, (Beşinci basım), İstanbul İletişim Yayınları
- Özsalan, Ö. (2014), *AnayurtOtel'inde Geceleyen Kadın*, Irzık, S. Parla, J. (Editörler), *Kadınlar Dile Düşünce-Edebiyat ve Toplumsal Cinsiyet*, (Beşinci basım), İstanbul İletişim Yayınları
- Özsöz, C. (2008), *Kültürel Feminist Teorî ve Feminist Teorilere Giriş*, (Birinci Basım) Sosyoloji Notları, Say: 6, 53
- Öztürk, M. (2016) *Cahiliyeden İslamiyet'e Kadın*, (Beşinci Basım), Ankara Ankara Okulu
- Phillips, A. (2012), *Demokrasinin Cinsiyeti*, (İkinci Basım), (Çev, alev Türker), İstanbul Metis
- Ramazanoğlu, C. (1998), *Feminizm ve Ezilmenin Çelişkileri*, (Birinci baskı), (Çev, Mefkûre Bayatlı), İstanbul Pencere Yayınları
- Sabbah, F. A. (1995), *İslam'ın Bilinçaltında Kadın*, (İkinci basım), (Çev, Ayşegül Sönmezay), İstanbul Ayrıntı
- Smith, S. (2012), *Kadınlar ve Sosyalizm*, (Birinci basım), (Çev, Etkin Bilen Eratalay), İstanbul Yordam
- Stone, A. (2015), *Feminist Felsefeye Giriş*, (Birinci basım), (Çev, Yonca Cingöz, Bilge Tanrıseven), İstanbul Otonom
- Stuart, S. (2006), *Postmodern Düşüncenin Eleştirel Sözlüğü*, (Birinci Basım), (Çev. Mukadder Erkan-Ali Utku), Ankara Ebabil Yayıncılık

Taylı Taş, Ü. (1996), *1980-1995 Arasında Kadınların Yazdıkları Roman ve Öykülerde Kadınlar Arası Güç İlişkisi*, İstanbul Üniversitesi Kadın Sorunları Uygulama ve Araştırma Merkezi, <http://kadinarastirmalari.istanbul.edu.tr/?p=6469>, 25-01-2017

Topcan, Ö. (2010), *Yahudilik ve Hıristiyanlık Din Geleneklerinde Toplumsal Cinsiyet (Geleneksel Dinler Otoritesine Feminist Bakış)*, Yüksek Lisans Tezi, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kadın Çalışmaları Ana Bilim Dalı, Ankara, 5

Waller, M - Marcos, S. (2006), *Farklılık ve Diyalog Feminizmler Küreselleşmeye Meydan Okuyor*, (Birinci basım), (Çev, Ahmet Fethi), İstanbul Çivi Yazıları Yayınları

Walters, M. (2009), *Feminizm*, (Birinci basım), (Çev, Hakan Gür), Ankara Dost Kitabevi Yayın

Woolf, V. (2016), *Kendine Ait Bir Oda*, (17. Baskı), (Çev. Suğra Öncü, İstanbul İletişim Yayınları

Zeraq, D. (2005), *Şevên Winda Wêneyên Meçhûl*, (Çapa Yekem), Diyarbakır Lîs

Zeraq, D. (2011), *Mirina Bêsi*, (Çapa Yekem), Diyarbakır Lîs

Zeraq, D. (2014), *Nexşên Lî Giyan*, (Çapa Yekem), Diyarbakır Lîs

Zeraq, D. (2016), *Bişirîna Şermînî*, (Çapa Duyem), Diyarbakır Lîs

<http://tr.m.wikipedia.org/wiki/Gens>, (Dema ragihînê: 26/12/2016)

http://www.kuranmeali.org/30/rum_suresi/21.ayet/kurani_kerim_mealleri.aspx , (Dema ragihînê: 23/10/2016)

<https://www.seslisozluk.net/gender-nedir-ne-demek/> (Dema ragihînê: 22/12/2016)

İngilizce Sesli Sözlük, tr.dictionarist.com, Dema ragihînê: 23/10/2016

http://www.kuranmeali.org/30/rum_suresi/21.ayet/kurani_kerim_mealleri.aspx , (Dema ragihînê: 23/10/2016)

<http://tr.m.wikipedia.org/wiki/Gens>, (Dema ragihînê: 26/12/2016)”

JÎNENÎGARÎ

Agahiyên Kesane



Paşnav, Nav : Polat Leyla
Aîdiyet : T.C.
Ci û mêjûyê bûyînê : 22/05/1974, Doğubeyazıt
Telefon : 0 536 600 41 74
Faks :
E-mail : zelalzeref@yahoo.com

Perwerdehî

Derece

Beşa Perwerdehiyê

Mêjûya derçûnê

Doktora

.....

.....

Lîsansa Bilind

.....

.....

Lisans

Çulurva Üniversitesi, Fen-Edebiyat Fakültesi,
Türk Dili ve Edebiyatı Bölümü

18/09/1998

Tecrûbeya Karkirinê

Sal

Cî

Görev

19

Van Mamostetiya Ziman û Edebiyata Tirkî

Zimanê Biyanî

Farisî

Yayınlar

.....